

folklora kurdan

Zargotin zêrgotin e,
zêrgotin zorgotin e!

Sal: 1
Hejmar: 3
Temmûz
Tebax
Îlon
2015



ŞAREDARIYA BAJARÊ
MEZIN A AMEDÊ



KURDÎ-DER
NAVEND



Seydayê Tîrêj

● Kovara Folklorê ya Sê Mehane

● Sal: 1 Hejmar: 3

● **Xwedî:** Li ser navê Şaredariya

Bajarê Mezin a Amedê,
Gultan KIŞANAK


● **Edîtor:** Eşref KEYDANÎ
Jêhat ROJHILAT

● **Redaksiyon:**
Ridwan DÎZMAN
Zerweş ESNAW

● **Berpirsa Nivîsan:**
Zeyneb YAŞ

● **Desteya Weşanê:**
Mahpûs SERHEDÎ
Şemsa ÎLBAŞ
Weysî ARCAGOK
Asmîn ÜYANIK
Mem MUKRIYANÎ
Ronya BEWRAN

● **Berga Pêşîn:** Gazî ÇAĞDAŞ

● **Wêne:**  DİHA

Ferhat ASLAN
Refik TEKİN
Dûrzan CÎRANO
Metin UĞUR
Ahmet DOĞRU
İskan ALTIN
Abdurrahman GÖK

● **Xêz:**

Yusuf ALKAN
Kawa (Engin KAYA)

● **Navnîşan:** Huzurevleri Mah.
Doktor Sıtkı Göral Cad. 13. Sok.
No: 4-1 Kayapınar-Diyarbakır
Tel: 0530 301 11 53

● **Çap:** Gün Matbaacılık
Beşyol Mevkii Akasya Sok. No:
23/A Küçükçekmece İSTANBUL
Tel: 0212 580 63 81



PÎNE

Diyar e ku dê her hejmarê hinek pîneyên me hebin. Ji bo hejmara 2. birêz Feratê DENGİZÎ pîneyek li kovarê zêde kir. Pîneya wî li jêr e:

Di rûpela 62'yan de kilama "Ehmedê Mala Musa" heye. Ev bûyer li Bilokaya Dêrikê çêbûye û rast e; lê navê vê stranê ne "Ehmedê Mala Musa" "Hesenê Mala Musa" ye. Nivîskar Adar JÎYAN bi navê "Seyrê" romana wê jî nivîsiye. Hozan Şivan di serî de gelek dengbêj wek "Ehmedê Mala Musa" distirên lê ne rast e. Min di Kovara W'yê de jî ev rexne anîbû. Û dibe ku bi şaşî wisa li hin deveran rûniştibe.

Tikaya min ew e ku hûn di hejmara sêyemîn de wek jêrnîşeyeke qal bikin ew ê xizmetê jî rastiya folklor û çanda me re bike.


Li ser vê daxwaza birêz DENGİZÎ me jî berê xwe da vê niqasê. Tê xuyakirin ku ev kilam bi herdu awayan jî hatiye gotin. Kê bi çi awayî gotiye me raxîst ber çavan, edî niqas a lêkolîneran û biryar jî ya we ye.


Hesen Cizrawî: Hesenê Mala Muse
M.Arif Cizrawî: Hesenê Mala Musa
Murat Bektaş: Hesenê Mala Musa
Dr. Serdar Budak: Hesenê Mala Muso
Dengbej Miraz: Hesenê Mala Musa
Hozan Hîsên: Hesenê Mala Musa
Dengbêj Xale Ahmet: Hesenê Mala Muso

Seîd Axa Cizîrî: Ahmedê Mala Musa
Şivan Perwer: Ahmedê Mala Musa
Hesen Eli Xencerî: Ehmedê Mala Musa
Rojda: Ahmedê Mala Musa
Chopy Fetah: Ahmedê Mala Musa

Bi hêviya ku hûn me bê pîne nehêlin.

Têkilî:

 folklorakurdan@gmail.com

 kovara folklorakurdan

 kovarafolklorakurdan



- 3 → Ji Edîtorî
4 → Çanda Xwarina Kurdistan- **Ramazan TURGUT**
11 → Lurik-**Nazîf ÇAKIR**
12 → Folklorînas û Wêjevan Sadiq Behadîn Amîdî-**Kerîm ŞEHREZA**
14 → Ferhenga Rezvaniyê 2-**Dawûd Gulsun BAGÛRÎ**
18 → Pîrsên Berevkirin û Arşivkirina
Nimûnên Muzîka Kurdî-**Dr. Nûrê CEWARÎ**
22 → Di Fabilên Kurdî De Rovî-**Ridwan DÎZMAN**
30 → Pixço-**Yasemîn ERBAN**
37 → Çi Di Hûr De Çi Di Tûr De-**Feratê DENGIZÎ**
39 → Hîri Birayî û Padîşah-**Sedef KANDEMÎR**
40 → Derba Gotinê-**Bahoz BARAN**
42 → Şêrê Ciwan û Roviye Pîr-**Nasir TORÎ**
44 → Pîran de Keyneki Waştîş û Veyve Kerdiş-**Mamoste SILÊMAN**
47 → Kêço-**Mahpûs SERHEDÎ**
56 → Çand- **Shahîne Bekirê SOREKLÎ**
60 → Pirpizê Pizê Pizê...-**Zeynep YAŞ**
61 → Meselokek-**Zozan BUDAK**
62 → 250 Nifirên Biderb-**Hîlmî AKYOL**
65 → Çîrokên Navlêkan (2)-**Mem MUKRÎYANÎ**
70 → Bavo Jî Sîr Kuta-**Pinar YAMAN**
71 → Gonçe-**Hatayî DEMÎR**
72 → Duayî û Zewtî-**Leyla GULTEKÎN**
74 → Çîrokên Gelerî-**Mustafa GAZÎ**
77 → Luye û Ewrîş-**Zerweş ESNAW**
78 → Pêrevistişê Estanika Hîrê Birayan û
Destana Odessa-**Serhat KILIÇ**
81 → Estaneka Veyvi-**Derman UNGUR**
82 → Meqes-**Mewlûd HESKÎFÎ**
84 → Di Eşîra Duderan De Navên Pezê Meşin-**Îdrîs KARTAL**
89 → Keyneka Qedersîya-**Ferîda AKTURAN**
93 → Meşk û Gû-**Weysî ARCAGOK**
97 → Nemrûk- **Ridwan TAY**
99 → Ferhengê Citêran-**Denîz MAYA**
103 → Xaçpirsa Mamikên Ajalan-**Ronya BEWRAN**
104 → Bersivdank-**Ronya BEWRAN**

Bendewarino:

Silaveke zozanî, li we û civata hûn lê hazir. Di vê germegerma havînê de ji silaveke zozanî xweştir herhal ti tişt tune ye. Ku mirov niha li Kanîya Kewan rûništa û tasek ava sar vexwara an li Zozanên Feraşînê sîyabo û mendik berhev bikira an li Çîyayê Kizwanan pišta xwe bidaya kevirêkî Kelha Selehadînê Kurd û li deşta Heseke binêrîya an jî li Efrînê li bin dareke zeytûnan bûya. Ev dîmen hemû jî xweş in li di hemûyan de tiştek kême. Dawîya wan hevokan wiha ye: û di destê mirovî de Kovara Folklorê Kurdan hejmar 3. hebûya dê dinya li mirovî bibûya bihuşt.

Biqasî ku em pê dihesin dibêjin kovara we/me bûye teberik û kes peyda nake. Dema hûn wisa dibêjin çîqas kêfa me tê. Çimkî em hingê têdigihên ku em karekî biqîmet dikin. Ma hemû tiştên biqîmet ne wisa ne. Ka li derdora xwe binêrin hûn ê bikaribin zêr û zîv û durr û yaqûtan bibînin. Nexêr. Ew jî wek kovara me kême tîn dîtin. Bi xêr sala bê ango piştî hejmar 4. hûn ji me nexwazin jî -wekî ku Miradê Kinê dibêje- em ê kotekî, bi darê zorê kovara xwe bidin we. Hingê dê sewta we sar bibe.

Henek û genek bila bimînin bi rêya xwe, em werin ser gotinên tirtire. Bi int û niç û zor û zehmetiyê be jî me karî em vê hejmarê jî bişînin ber deriyê we. Xwedê em fedîkar nekirin û em îcar jî destvala nayên ser palas û doşega we. Tûrê me tijî ye, hêdî hêdî destê xwe dirêjî rûpelan bikin. Bes di carekê de bi ser xwe ve nekin dibe ku hûn gêjomêjo bibin. Giran giran bixwînin, çewtî û kêmasiyên me li cihekî binivîsîn û heke cîyekî bi we xweş hebe jî hûn dikarin zirt û pesnê me jî bidin. Jixwe em wek Kurd çikûsên gotinên xweş in û destbelayên nifir û rexne û dijûnan in. Bila pesn û rexne ji me re, dijûn û nifir jî ji dostên dijminên me re bin.

Germîya havînê dawiyê zû li tiştan tîne. Wek her tiştî dawî li nivîsa me jî anî.

Em hêvî dikin ku devê we li ken, wechê we li ser xweşiyê, berê we li karûbarên folklorê be. Herwiha bila rojîya we qebûl, cejna we jî pîroz be.

Heta civateke din bimînin di xweşî û başiyê de.



Çanda Xwarina Kurdan

Xwedîkirin bi xwe re çanda xwedîkirinê ango çanda xwarinê jî tîne. Ev çanda xwarinê ne tenê xwarin bi xwe ye. Dema ku xwarin bû beşek ji çandê, tenê ne xurek tê bîra mirov. Çanda xwarinê ji bidestxistina qûtê xwarinê dest pê dike heta mirov xwarinê dixwe û rewşa piştî xwarinê jî di nava xwe de dihewîne.

Destpêk

Mirov hebûneke biyolojîk e. Ji ber vê xwedîkirina mirov jî bûyereke biyolojîk e. Dema ku em dibejin xwedîkirin, wateya wê ew e ku bedena mirov bi qûtê xwedîkirin. Di encama qût/xurek/xwarinê de tiştê pêwîst ji bo laşê mirov wek vîtamîn û enerjî derdikeve. Ev vîtamîn, dohn û enerjî di nava xure-

kan de ye. Dema mirov xwarinê dixwe, xwarin di nav bedena mirov de dikeve rêwîngîyekê. Ev rêwîngî ji dev dest pê dike heta ku diçe ûr/mîde'yê didome. Di ûr de ev xwarin parçe dibin û dibin vîtamîn, dohn û enerjî. Dûvre di laşê mirov de belav dibin. Bi vî awayî zindîbûna bedena mirov berdewam dike.

Ramazan
TURGUT

Xwedîkirin bi xwe re çanda xwedîkirinê ango çanda xwarinê jî tîne. Ev çanda xwarinê ne tenê xwarin bi xwe ye. Dema ku xwarin bû beşek ji çandê, tenê ne xurek tê bîra mirov. Çanda xwarinê ji bidestxistina qûtê xwarinê dest pê dîke heta mirov xwarinê dixwe û rewşa piştî xwarinê jî di nava xwe de dihewîne. Bi gotineke di çandina zad an xwedîkirina heywanan, amadekirin an hilandin û bidestxistina xurek û alavên xwarinê, pijandina xwarinê, raxistina sifrê, rêzkirina cureyên xwarin û vexwarinê, rêbaza rûniştina li ser sifrê, serenomiya destpêka xwarinê, rakirina sifrê bi tevahî çanda xwarinê yan jî çanda xwedîkirine derdixin holê.

Kurdan jî wek her neteweyî yan wek her şaristaiyê çanda xwe ya xwarinê ava kiriye. Kurd li ser axa Mezopotam-yayê bi gelên Ereba, Ermen, Asurî, Dom û Tirk re dijîn. Ev encam, bivê-nevê çandê hevpar ava dîke. Gellek xwarin hene ku tu kes nizane bê vê xwarinê bingeha xwe ji kîjan çandê gir-tiye. Lê herî zêde bandora Ereban li ser Kurdan çê-bûye. Ji ber ku dîne Kurdan û Ereban yek e ji hev gellek sûd wer-girtine. Lê ev rastî jî heye ku li ser axa Kurdistanê çandên qedîm yên Kurd û Asurî û Ermeniyana e. Ev çandên qedîm ji ber ku cîranên hev bûn bandorên mezin li hev kirine. Îro gellek kevneşopiyen ku tên şopandin bûne malê van neteweyên cîran.

Kurd li ser axake dewlemend û biber dijîn. Li zozanên Kurdistanê her cureyên fêkî, sebze û giya tên çandin. Herwiha gellek cureyên heywanan tên xwedîkirin. Kurdistan jî hêla çeman ve gellekî dewlemend e. Li deverên çiyayî zedetir karê sewalvanî tê kirin. Li deverên deştan da cotkariya fêkî, sebze, giya û qûtî tê kirin.

Bi taybetî xwarin li ser bingeha nên hatiye avakirin. Ji ber vê wek kevneşopiyekê, Kurd gellek qiymet didin nên. Ev jî çandina gênim dixwaze. Jixwe Kurd herî zêde gênim diçênin. Herçiqaş van salên dawî cureyên çandiniyê zêde bûbin jî dîsa çandiniya gênim serkeşiyê dîke. Kurd tenê ji êrd nanê sêlê, nanê tenûrê, nanê şikeva, nanê heftewikî, nanê şilîkî û hin cureyên di yê nên çêdikin. Ev nan tev jî hev cuda ne. Lê belê beriya ku mirov bikeve jiyana niştecîhî, xwe bi hatinên heywanan xwedî dikirin. Ji ber

ku cotkarî bicihbûnê dixwaze beriya ku mirov niştecîh bibin ji bo jiyane goşt, şîr û mast û dew ango bi hatinên heywanan mirovan jiyana xwe didomand. Wek goştê biraştî, goştê kelandî, goştê qelandî bi dehan cureyên pijandina goşt hene. Lê ev nayê vê wateyê ku tenê hatinên heywanan dixwarin. Di dema koçberiyê her devera ku diçûn de bi giyayên xwe yê cuda cuda dewlemend bûn. Wek parpar, kereng, tolik, tuzik û bi sedan cureyên giyayên ku xwarin ji wan çêdibin.

Xwarinên Kurdan mijareke wisa ye ku qet li serê wê nehatiye rawestandî. Herçiqaş di hêlên di de kêm xebat hebin jî mirov piş-trast e ku xebatin hatine kirin. Lê li ser çanda xwarinên Kurdan tu xebatên berbiçav nehatine kirin. Ya rast van demên dawî piştî ku televizyonên Kurdan zêde bûn bi awayekî bernamêyên xwarinan, xwarinên Kurdan hatin nas-kirin. Herçiqaş kovar, pirtûk û rojnameyên Kurdan li ser xwarinên Kurdan ranewestibin jî çanda xwarinên Kurdan heta ku mirov bixwaze dewlemend e.

Îro li gor mercên jiyana modern gellek xwarinên kevn yê Kurdan hatine guhartin an hatine jîbîrkirin. An îro ew xwarinên kevn bi navên nûjen bi pijandineke nûjen tên naskirin. Ji van xwarinan hin jê merge, mehîr, kutilk, şamborek, hêkedims, qawît û bi sedan cureyên di her yek ji wan nisana çanda Kurdan in.

1. Xwedîkirin (Xwarin û Vexwarin)

1.1. Pênaseya Xwedîkirinê

Ji bo ku bedenê mirovan bi awayekî tendurist jiyana xwe bidomîne, pêwîstî bi xwarin û vexwarinên ku ji heywan, nebat û sirûstê çêdibin heye. Ji bo tenduristiya bedenê hemû xwarin û vexwarin bi navê xwedîkirin tê binavkirin. Xwedîkirin ji bo ku laş zindî bimîne tevgerike mecbûrî ye. Wek tê zanîn di nava xwarin û vexwarinan de karbon-hîdrat, proteîn, rûn(dohn), vitamîn, av û mîneral hene. Ev tendûristiyê ango zindîtiyê didin bedena mirovan. Bi vî awayî xwarin û vexwarin dibin çalakiyeke biyolojîk. Jixwe biyolojî ew zanist e ku ji xwe re zindiyan dîke mijar.

Di vir de dema ku em bêjin xwarin divê her cureyên ku mirov dixwe û vedixwe bê bîra mirov. Ji ber vê ye ku di dewsa bêjeyên xwarin û vexwarinê de em ê tenê bêjeya xwarinê bi kar bînin. Jixwe xwarin di nava xwe de vexwarinê jî dihewîne.





1.2. Tekîliya Xwarin û Çandê

Her tiştê ku bi xwarin û vexwarinê re tekîldar e parçeyekî çandê ye. Di nava çanda neteweyan de medbex (pêjgeh) roleke girîng dilîze. Xwarin bi qasî bandora xwe ya biyolojîk xwediyê bandoreke çandî jî. Di navbera hemû medbexên dinyayê de cudatîyên mezin hene. Ev cudatî ji ber çanda mirovan çêdibe. Sedema cudatiya çanda medbexê ji baweriyên dîn û çanda neteweyî, ji heywanên ku li derdorê tîn xwedîkirin û nebatên ku li derdorê hene çêdibe. Wek dî asta dewlemendî û asta jiyana civakî jî çandêke xwarinê bi xwe re tîne.



Kurd bi awayekî kevneşopî debara xwe li ser sewalvanî û cotkariyê dimeşînin. Heta dawiya sedsala nozdehan jî Kurd hê bi awayekî koçertî yan jî nivkoçertî dijiyan. Wek tê zanîn di jiyana koçertiyê de xwedîkirina mirovan li ser goşt û li ser jêhatinên şîr e. Ji bo ku mirov, heywanan xwedî bikin bi jiyaneke koçerî dijîn. Ev jî bi xwe re çandêke ava dike. Di jiyana Kurdên koçer de xwarinên sereke jêhatinên goşt in. Bi goşt re şîr, mast, dew, penêr û nivîşk jî xwarin û vexwarinên sereke bûn. ^[1] Lê dema mirov ketin jiyana niştecihî êdî wan dest bi cotkariyê kir angu wan dest bi çandiniyê kir. Çandiniyê jî bi xwe re çandêke nû ava kir. Di serî de ji bo nêçandiniya gênim roleke sereke lîst. Îro jî bi dehan cureyên nêçandiniya hene. Wek nanê tenûrê, nanê sêlê, nanê şikeva, nanê şilikî... Êdî mirovan bi awayekî niştecihî heywan xwedîkirin û karê çandiniyê kir. Ji ber vê ye ku mirov her dem li debara xwarin û av bi hêsanî tê dîtin bi cih bûne. Heta bajarên mezin yê îro jî li dora çeman hatine avakirin. Dema mirovan dest bi hilberandinê kiriye, vê yekê jiyana civakî jî bi xwe re guhartiye. Bi vî awayî bajarvaniyê dest pê kiriye. Ango bi saya hilberînê mirov ji asta gundîtiyê derbasî asta bajarvaniyê bûne. Di bajarvanî de çanda xwarinê ji ya gundan cudatir bûye.

[1] Mirella Galletti, Kürt Yemek Kültürü, Weşanên Avesta, İstanbul, 2009, r. 26.

Xwarin; li ser jiyana kesayetî û jiyana civakî xwedî bandoreke mezin e. Mirov ji hêla fîzyolojîk ve çiqasî girêdayî xwarinê be ewqasî jî girêdayî civakê ye. Bi gotineke dî jiyana ku li ser xwarinê hatiye avakirin bi xwe re çanda xwarinê jî ava dike.

2. Di Çanda Kurdan De Çanda Xwarinê

Wek her neteweyê li ser rûye cîhanê, Kurd jî xwediyê taybetmendiyên xwe ne. Kurdan jî li gorî jiyana xwe çandeke xwarinê ava kiriye. Herçiqaş Kurd li ser axake berfireh belavbûyî bin jî ji hêla xwarinê ve çandeke hevpar ava kirine.

Di çanda bidestxistina xwarinê de mêr, rola şivên, jin; rola bêrivanîyê dilîzê. Bi taybetî peywira zilamê malê bidestxistina zad û qûtî ye. Ev wek peywira sereke ye ji bo zilêm, an mêrên malê. Peywira jinê ya sereke jî çêkirin û amadekirina xwarinê û rakirina sifreyê ye. Li gorî vê rêbazê mêrên malê haywanan xwedî dikin, zêvîyan diçînin. Ji bo bidestxistina qût û zadê malê li derve dixebite. Li gor şertên jiyane heywanan xwedî dike, şivantiyê dike, kayê an xûrekên heywanan amade dike, li gor pêwîstiyê, heywanan difiroşe yan ji bo xwarinê wan digurîne. Ger bi cotkariyê debara xwe bike vê carê erdê xwe dikole, bizir direşîne, paleyîyê dike yan di dema modern de bi maşîneyê zadê xwe dide hev. Ê zêde difiroşê û yê ji bo debara malê li malê bi cih dike. Li hember xebatên zilamên malê, jinên malê jî her cure xwarin û vexwarina kesên malbatê amade dikin. Bi xwarinê re, malê jî ji bo jiyane bi her awayî amade dikin. Xurekên xwarinan di-hêlin, li gor danê xwarinê, xwarinê amade dike, piştî xwarinê sifreya xwarinê radike, firaqên xwe dişo û ji bo danên dî yên xwarinê amadeyîyên nû dike.

Rêgezeke rûniştina li ser sifreyê heye. Li gorî vê rêgezê zilamê malê yê herî pîr li serê sifreyê rûdinin. Ger mêvan hebin, jin ya piştî xwarina mêvanan xwarina xwe dixwin an li odeyeke dî dixwin. Eger mêvan nebin kesên malbatê bi hev re li ser sifreyê rûdinên. Destpêka xwarinê bi kesê ku serê sifreyê girtiye dest pê dike. Bi taybetî ev kes yan bav e yan jî kalikê malê ye. ^[2] Jixwe di amadekirina xwarinê de tenê jin dixebitin. Li gor çanda Kurdan di xwarinê de aliyê herî xweş an ku aliyê herî tahmdar datînin ber mêvanan an mezinên malê. Ji vir jî diyar dibe ku di navbera xwarin û hêzê de tekîliyêk heye. Ev rêbaz bi awayekî sirûştî didome. Hemû endamên malbatê ji vê destûrê re rêz digirin. Di dema ziyafetan de ev rêbaz dîsa xuya dibe. Li gor statuya kesan rûniştina li ser sifreyê tê amadeki-

rin. Kesên herî bistatû li cihê sifreyê yê herî baş rûdine û aliyê herî xweş ê xwarinê jî li ber datînin. Dema ji bo mêvanekî sewalek tê serjêkirin serê sewalê di nav sêniyekê de tînin li ber mêvan datînin. Ev yek qedirgirtina mêvan û statuya mêvan derdixe pêş. Dema mêvan tune be serê sewal tînin li ber mezine malê datînin. Di ziyafetan de mazûvan çiqas zêde xwarinê amade bike ewqas jî serbilind dibe. Jixwe di nav Kurdan de têgeha eşîriyê bi wateya comerdîyê ve girêdayî ye.

Xwarin tenê ne tiştekî fîzyolojîk e. Xwarin tekîliyêkê di navbara kesên li ser sifreyê de ne çêdike. Bi gotineke dî dema xwarinê dema civakîbûnê ye jî. Bi taybetî şiv ji bo civakîbûnê cihekî girîng digire di çanda xwarinê de. Ji bo ku endamên malbatê bi tevahî li ser şivê kom dibin. Endamên malbatê tenê li ser sifreyê bi awayekî li bal hev in. Di vir de bûyer û rewşa jiyane tê parvekirin. Demên xwarinê di navbera kesên malbatê de desthevgirtinekê çêdikê. Jiyanekê kollektîf û ramanê hevpar derdikevin meydana. Wek dî ziyafet, mewlûd û sifreya fitarê di nav civakê de hevgerînekê manewî çêdike. Wek tê zanîn dayîna mewlûdan li ba Kurdan gellekî bi qiymet e. Kurd ji bo her serkeftinên jiyane yan dema xemgîniyên jiyane mewlûdê didin. Wek dawet, sinnet, çêbûna zarokan, mirin...

2.1. Pergal û Alavên Sifreyê

Raxistina sifreyê li erdê li ser cilikan an sêniya xwarinê tê amadekirin. Bi taybetî bi awayekî gilover tê raxistin. Li gor hejmara kesên malbatê yan kesên mêvan sifre bi axayekî dirêj tê raxistin. Di çanda Kurdan de hemû xwarin li ser sifreyê tên raxistin. Xwarina sereke, nan şorbe, selete, av, dew, şerani di heman demê de li ser sifreyê amade ne. Alavên sifreyê; tepsîk, kevçî, qedeh, sênî hene. Dema mirov xwarina xwe diqedînin ji ser sifreyê radibin. Jin an jinên malê sifreyê radikin. Di vir de dibe neyê jibîrkirin ku cureyên xwarinê û alavên xwarinê li gor dewlemendiya malbatan tê guhertin.

Beriya destpêkirina xwarinê; destûştin û li ser sifreyê gotina bismillah wek adetên sifreyê ne. Gotina bismillah bi wateya bi navê Xwedê ye. Wek dî dema mirovan têr xwar duyekê dikin. Piştî xwarinê siwakkirina diranan ji rola dîne tê. Ev jî çanda Îslamî ye ku ketiye nav çanda Kurdan. Ev jî bandora dîne ya li ser çanda neteweyan diyar dike. ^[3]

Wek dî destar, tenûr, cirn, tifik, kalok, meşk hin alavên dî yê ji bo amadekirina xwarinê ne. ^[4]

[2] Hayatî Besirli, Yemek, Kültür ve Kimlik, r. 168, Milli Folklor, 2010, www.millifolklor.com

[3] Mirella Galletti, Kürt Yemek Kültürü, r. 26, Weşanên Avesta, İstanbul, 2009

[4] Dilazad ART, Tûrik, r. 48, Weşanên Zanîngeh, Stenbol, 2011

2.2. Di Çanda Kurdan De Vexwarin

Di vexwarinan de jî civaka Kurdan hin kevneşopî ava kirine. Jixwe vexwarina herî sirûştî av e. Ji bilî avê di nav civaka Kurdan te tiştê herî zêde tê vexwarin bêguman dew e. Dew her dem li ser sifreyê amade ye. Bi taybetî mehên havînê dew ji ser sifreyê kê mabe. Çay û qehwe di van sed salên dawî de ketine nav çanda Kurdan. Berê ji ber ku çay biqiyet bû, tenê didan mêvanan. Qehwe jî jixwe ya axayan bû. Tenê kesên dewlemend û axayan qehwe çêdikirin û vedixwarin. Lê îro çay û qehwe ji bo ku li her deverê bi hesanî tê peydekirin çî dewlemend çî xizan vedixwin. Di pêşkeşkirina vexwarinan de pêşkeşiya ewil ji bo mezinan e. Dûvre bi awayekî dorê li civatê digerin. Jixwe ji ber sedemên dî nî vexwarina araqê di nav Kurdan de nebûye adeteke rojane.

3. Bandora Dî nî Li Ser Çanda Xwarinê

Bêgûman dî nî bi hêza xwe ya mezin bandor li ser çanda mirovan dî ke. Kurd ji ber ku misilman in bivê-nevê bandora dî nî Îslamê dibe hebe. Çavkaniyen Îslamê Quran û sinnet li ser helal û heramiyên xwarin û vexwarinê radwestin. Jixwe dî nî Îslamê bi xwe re çandê xwarinê ava kiriye. Tiştên ku dî nî Îslamê heram/qedexe kirine di nav Kurdan de jî nayên bikaranîn. Bi taybetî her cureyên araqê û goştê berazan heramên berçav in. Wek dî di dî nî Îslamê de xwarina leş, xwîn, heywanên ku ne li ser navê Xwedê hatine serjêkirin, heywanên xeniqî, heywanên kuştî qedexe ne.^[5] Ji ber van sedeman Kurd goştên navborî naxwîn û van xwarinan di çanda xwarinê Kurdan de cih negirtine. Ev jî bandora dî nî ya li ser çanda Kurdan derdixwe. Wek dî xwarina zêde îsraf tê qebûl kirin. Îsraf jî di dî nî Îslamê de tiştê nebaş e. Piştî xwarinan ji bo tenduristî û paqijkirina diranan bikaranîna darikê siwakê jî dîsa ji dî nî Îslamê tê.

3.1. Nîşaneyên Çanda Xwarinê ya Kurdan

Di bingeha xwe de her xwarin malê çandê ye. Ango her çand bi xwarineke xwe ya taybetî tê naskirin. Dema mirov



behsa pîzzayê dî ke tenê û pêşî Îtalya tê bîra mirovî. Bi vî awayî dema ku mehîr û serûpê tê gotin Kurd û çanda Kurdan tê bîra mirov. Nexwe hin xwarin bi hin çandan ve hatine girêdan. Li her deverên dinyayê mirov bi xwarinên xwe yê naxwîn mîhrîcanan amade dikin. Hêja ye ku Kurd jî mîhrîcana mehîr û serûpêyê li dar bixin.

3.2. Xurekên Li Kurdistanê

Li ser erda Kurdistanê cotkar herî zêde genim, ceh, nîsk, nahk/nok, birinc û garis diçînin. Wek sebze jî fasulî, bacan(firingî), bacanê reş(balîcan), kelem, gezer, spanak, pîvaz, tivir, xiyar û bamya gellekî tî çandin. Wek fêkî zebeş, petêx, sêv, alûce, hirmî, xox, hêjîr, hinar û tirî navdar in û bi awayekî zêde tî çandin. Kurd ji bo ku rûn bi dest bixin zeytûn û kunciyar bi kar tînin.

Li Kurdistanê herî zêde goştên mih, bizin, çêlek, elok û mirîşkan tî çandin. Xwarina masiyan di nav Kurdan de gellekî kê mabe.

Di nav Kurdan de vexwarina zêde av, çay, dew, şîr û qehwe ye. Bi taybetî ji mêvanan re çay tê îkram kirin.

Giyayên ku li Kurdistanê şî nî tî çandin; kereng, gurîz, surim, parpar, xerdel, gezgez, tolik, şopil, kardî, qîfal, şî nîrek, tûzik, strîzerk...^[6]

4. Çanda Xwarinê û Edebiyata Kurdan

Edebiyata Kurdan berî her tiştî edebiyateke Îslamî ye. Edebiyata Kurdan ji edebiyata Erebbî, Farisî û Tirkî sud wergirtiye. Bi belavbûna medreseyan re xwendin û nivîsandin di nav Kurdan de belav bû. Ev bû sedema mirovên zana û hunermend derkevin meydana. Bi dehan seydayên medreseyan bi zimanê Kurdan berhem nivîsandine. Bêgûman her berhem hêjayî pesindayîne ne.

Xwarin çawa hêmaneke çandê ye bi wî awayî hêmaneke edebiyatê ye jî. Nexwe edebiyata Kurdan jî li ser çanda xwarinê rawestiyaye. Di vir de wek nimûne em ê behsa du zana û helbestvanên Kurdan bikin.

[5] Hayatî Beşirî, Yemek, Kültür ve Kimlik, r. 166-167, Milli Folklor, 2010

[6] Dilazad ART, Tûrik, r. 49, Wesanên Zanîngeh, Stenbol, 2011

Ehmedê Xanî di berhema xwe ya navdar de li ser çanda xwarinê sekîniye. Xanî hem li ser nav û cureyên xwarinan hem jî li ser pergala sifreyê rawestiyaye.

Elqîsse, bi şewketa xwe ew Mîr Rabû, bi xwe bûye çaşinîgîr

Kêşa wî bi meclîsa xwe (deste)xanek Goya kire ferşî asîmanek

Qursê Meh û Mîhrê asîmanî
Înan te digot bi cayê nanî

Ev lengeriyêd î zîv û zêrîn
Suhbet felekêd î jor û jêrîn

Her sehnê mezin mîsalê bircek
Serpoşê li ser rengê durcek

Her tepsî û kaseyêd î fexfûr
Yek exterê pirziya yê pîrnûr

Cedî û Hemelê di asîmanî
Bîryan û kebabê mîhemanî

Her kase û tebsiyêd yek enbar
Serşar î şebihê nefse emmar

Enwayê teamê çerp û şîrîn
Elwanê xida û nuqlê rengîn

Van meşrebe û eyaxê çînî
Dewran dikirin bi nazenî

Seyyare sifet bi geşt û seyran
Herçî ku didî, dimayî heyran

Narînc û turunc û nar û leymû
Newbaweyê şaxîsarê minû

Fanîz û nebat û qend û şeker
Mawerd û zebad û misk û enber

Hindan dikirin meîde, xaze
Hindan dikirin dîmaxî taze

Mecmer geriyan bi ûd û enber
Bûn cûmle meşamê can muetter ^[7]

[7] Ehmedê Xanî, Mem û Zîn, Amd. Huseyn Şemrexî, r. 115-116, Weşanên Nûbihar, Stanbol, 2010

Mele Xelîlê Sêrtî jî berhema xwe bi şîretan xemilandiye. Di helbesta 'Mebhesu Adab-îl Eklî' de li ser adet û çanda xwarin û vexwarinê şîretan dike.

Xwedê ev te'amê di xweş dane te,
Digel av û fêkî, libasê li te!

Tu, bêşukrî manendê heywan mexwe!
We bê mulheza wî tu tiştê mexwe!

Bixwe tu ji bo quwweta ta'etê,
Ne bo lezzet û keyfî û pîrr şehwetê.

Ji bo xwe hevalan-i peyda bike
Ji bo xwarinê, paşê dest pê bike!

Di ber zadî, paşê jî destan bişo!
Wekî ku bi kefçik bixwî, qet meşo!

Li ser zadî rûne bi terzek edeb,
Piyê rastê rake û razîne çep.

Ne razê, ne palde dema xwarinê!
Ne bêhişbe ba fexr û pîrr xwarinê!

Hinik xwê di ber zad û paşê bixwe,
Heramî û tiştê bi şubhe mexwe.

Ku goştgirtina te j'heramî bitin,
Du'ayê te êdî qebûl nabitin.

Heçî hate ber te tu pê razîbe,
Gellek talibê tiştê xwestir mebe.^[8]

[8] Mele Xelîlê Sêrtî, Nehc-ul Enam, Amd. Zeynelabîdîn Kaya, Weşanxana Kurdistan, Stockholm, 1988, r. 31.



Ji bilî van helbestvanan bêguman bi dehan helbestvan û nivîskaran li ser çanda xwarinê berhem nivîsîne. Hem berhemên klasîk hem jî berhemên modern kêm zêde li ser çanda xwarinê rawestiyane. Wek dî çanda xwarinê di nav gotinên bav û kalan de jî cih girtiye. Jixwe gellek gotinên bav û kalan bi bûyer û serpêhatiyên xwarinê re tekildar in.

- ▶ Destê xwarinê dirêj e.
- ▶ Têr xwarin tune rabûn edet e.
- ▶ Ûrê xwe neelimîne hemû dana(xwarinan), bejna xwe neelimîne kiras û zeftana.
- ▶ Bi nanekî mirov nabe nandar.
- ▶ Xwarin ya herkesî ye, mêranî ne ya herkesî ye.
- ▶ Diranê feqîran di nav hewdelê(helew) de dişkê.
- ▶ Nan bide nanpêja, nanekî zêde bide.
- ▶ Nan heval e.
- ▶ Nan û pîvaz û nexweşî, çavreşî ye.
- ▶ Nan û xwê, xwê bi manî (bi wate).
- ▶ Nanê mêran li ser mêran deyn e.
- ▶ Nanê wî li ber ave çû, go ber xêra bave min be.
- ▶ Nanê sêlê durû ye.



Çavkanî

- A.R.T, Dilazad: "Tûrik", Weşanên Zanîngeh, Stenbol, 2011.
- Galletti, Mirella: "Kürt Yemek Kültürü", Weşanên Avesta, İstanbul, 2009.
- İlhan, Zive, Gümüş, Nezir...: "Ferheng", TDK Yayınları, Ankara, 2014.
- Mahmoud, Abdil Wehab Haj: "Zanjiya Tenduristiya-Gel", Weşanên Zanîngeh, Mêrdîn, 2013.
- Nûpelda: "Di Çanda Kurdan De Xwarinên Kevnoşopî", Mêrdîn, 2014.
- Nûpelda: "Kaniya Gotinên Bav û Kalan", Weşanên Zanîngeh, Enqere, 2014.
- Sêrtî, Mele Xelîlê: "Nehc-ul Enam", Amd. Zeynelabîdîn Kaya, Weşanxana Kurdistan, Stockholm, 1988.
- Xanî, Ehmedê: "Mem û Zîn", Amd. Huseyn Şemrêxî, Weşanên Nûbihar, Stenbol, 2010.
- Beşirli, Hayati: "Yemek, Kültür ve Kimlik", Milli Folklor, 2010, www.millifolklor.com
- Çildir, Selin: "Ülkelere Göre Yemek Yeme Kültürü", www.geziseti.com/ulkelerin-yemek-adedi/

LORİK 1

Day mîrem vano day begêm vano
Day xawaro derdê ma girano
Day eywana begê min xeraya
Baw eywanê begê min xeraya
Day mi şîta rîta tiradaya
Baw min êynî gurat vilîknaya

Day mîram vano day begêm vano
Day xawaro derdê ma girano
Day ez o bege xu ma gawunî
Baw ma gawunî gin gulîkunî
Day şomê min û beg mi di nunî
Baw ma çi bêr çi bid derd cirunî.

Arêkerdox: Nazîf ÇAKIR

Vatox: Cemel AZIJ

Serre Aye: 60

Ca: Çewlîg

Serre: 2015

LORİK 2

Lorî lorî dile min gengola veng a
Ez ko kilêk piro dî
Bi hûrdî destî bi dî dismala
Ez ko lore kê xo birşavî kidê xalî
Verg o ti vergê koyanê
Verg o ti nêwere hê milkê verde mîyanî
Xezalê ti xezala min a çal a
Ti xezala to delala xo winî kerda

....

Va û ti yenê vayê newalan
Ti dane piro dare sayan û purtqalan
Feleko xayîn va nêbero sermîyanî kêyan
Feleko xayîn wa nêbero kûrk o êban
Axayê civaan sermîyanê kêyan.

Arêkerdox: Nazîf ÇAKIR

Vatox: Rêdîfe KIRMAÇ (70), Mikîye KIRMAÇ (45)

Herêm: Birê Mihemed Axa / Qerejdax

Serre: 2015





Foklornas
û Wêjevan
Sadiq
Behadîn
Amîdî

Kerîm ŞEHREZA

Sadiq Behadînê Amîdî wêjevan û folklornamekî binavûdeng e li devera Behdînan û di nava rewşenbîrên Kurd de li tevayî Kurdistanê û zanyarekî hêja ye ku bi sala ne ji dil û can xizmeta ziman û folklorê Kurdan kiriye û hewl daye ku biparêze û xuya bike û ji windabûnê rizgar bike. Û xwedanê gelek berhemên hêja ye di wan waran de, û gelek gotar û lêkolînên binirx û hêja nivîsandine di kovar û rojnameyên Kurdî de belav kirine mîna (Hîwa, Ronahî, Rojî Kurdistan, Birayetî, Defterî Kurdewarî, Nûserî Kurd, Hawkarî, Beyan, Rewşenbîrê Niwê, Korê Zanyarî yê Kurdî) Herweha gelek pirtûk jî nivîsandine û gelek ji wan çap û belav bûne li Başûrê Kurdistan û Bexdadê bi zimanê Kurdî û Erebî, yek ji wan berhemên jî pirtûka Folklorê Kurdî ya ku tîpgruhezîna wê bûye û ji aliyê weşanxaneyê Lîsê ve hatiye çapkirin û belavkirin. Berhema Folklorê Kurdî yek ji wan berhemên hêja ya Sadiq Behadîn e û gelek çîrok û stran û kelepûr û efsane û destanên Kurdî tê de bi cih kirine û nixandine û nivîsandine.

Jiyana Sadiq Behadînê Amîdî:

Sadiq Behadîn Amîdî di sala 1918'an de li bajarê Amediyê li Başûrê Kurdistanê ji dayik bûye, bavê wî alimekî olî, yekî naskirî bû li devera xwe û li ser destê wî dest bi perwerdeya olî û xwendina Qur'ana pîroz, dûvre xwendina xwe ya seretayî di sala 1932'an de li bajarê xwe diqedîne, û dihere bajarê Mûsilê bo berdewamkirina xwendina xwe û li wir di sala 1967'an de bawernameya xwe ya amadeyî bi serkeftin diqedîne û paşê dihere Bexdadê bo xwendina perwerdeya mamostetiya bilind û piştî çar salan me'zûn dibe û bawernameya xwe ya belorîyosê di erdnîgariyê de werdigire.

Piştî qedandina xwendina xwe, di sala 1941'an de û li payîza wê salê dibe mamosteyê civaknasiyê li amadeya Kerkok ya Kurdan, piştî wê tê veguheztin bo amadeya Helebçe li parezgeha Silêmaniyê û li wir heft salan perwerdeyê dide.

Li dû wê dişînin bajarê Silêmaniyê sê salan û salekê li bajarê Zaxo, û paşê vediguhezîna bajarê Hît li parezgeha Enbar li navenda Iraqê. Li dawiyê jî li Bexdad bi cih dibê û 17 salan li dibistanên wê yê amadeyî perwerda erdnîgariyê dike.

Lê piştî damezirandina rêveberiya Lêkolînên Kurdî li Bexdad dibe alîkarê rêveberê giştî, piştî wê biryara veguhezîna wî bo zanîngeha Bexdad Fekulta Wêjeyî Beşê Wêje û Zimanê Kurdî û mamostetî li wir kir di navbera salên 1963'an ta 1965'an.

Mamoste Sadiq Behadîn yek ji wan kesên şehreza û zana di warê edebiyata Kurdî û ziman û folklorê wê, ev hezkirina wî bo van babetan ji dema ku xwendevan bû li Mûsilê pê re peyda bû û di wê demê de gelek gotar û babetên hêja di vî warî de dinivîsandin û rewla wî ber çav bû di vî warî de û xebateke bêhempa dikir di xizmeta çand û Folklorê Kurdî de. Û yek ji wan kesên çalak bû di her karî de ku pêk dihat di vî warî û endamekî zîrek bû di nava saziyên Kurdî li Bexdad di salên çilî de û gelek mijarên berketî û hêja di warê Folklorê û çanda Kurdî û zimanê wê di beşê Kurdî li Radyoya Bexdad heya salên 1956'an û babetên binirx li Kovara Hêwa de belav kirin.

Mamosta Sadiq Behadîn yek ji damezrênerê Sendîqa Mamosteyên Iraqê bû. Di sala 1958'an bû endamê wê yê çalak û xwedanê helwesteke xurt di parastina maf û daxwazên Kurdan û mafê parastina ziman û xwendin û perwerda bi zimanê Kurdî û dîrok nasname û edebiyata Kurdî, bi taybetî di Kongireya sendîqê de di salên 1959 û 1960'an de.


Herweha rewla wî berz û xuya bû di kongireya yekem de ya damezirandina Yekîtiya Nivîskarên Kurd de ku li Bexdad li 23-24 Hizêrana sala 1970'an de li dar ketibû, û hate hilbijartin bo serokatîya desteya rêveberiya kongirê û zanebûneke mezin kongirê bi ser xist û biryarên girîng standin.

Berhemên Wî:

Mamoste gelek pirtûkên hêja bi zimanê Kurdî nivîsandine herweha bi zimanê Erebi jî çend berhemên wî hene û hin destxet jî li pişt xwe hiştine li hêviya sazî û dezgehên Kurdî ne ku xwedî lê derkevin û werin çapkirin.

1- Îdîmêt Kurdî, Çapxana Şab(Gel), Bexdad, sala 1972'an çap bûye.

2- Rêzimana Kurdî, Bexdad, sala 1973'an çap bûye.



3- Dîwana Cezîrî(Berhevkirin û Şirovekirin), Bexdad, sala 1977'an çap bûye.

4- Dîwana Pirtoyê Hekarî, Bexdad, sala 1978'an de çap bûye.

5- Nûbihara Ehmedê Xanî(Lêkolîn û Şirovekirin), Bexdad, 1979 çap bûye.

6- Hozanvanê Kurd(Berhevkirin û Şirovekirin), Bexdad, 1980 çap bûye.

7- Xan û Man(Çîrok û Bûyer), Bexdad, 1980 çap bûye.

8- Mewlid nama Bateyî (Berhevkirin û Şirovekirin), Bexdad, 1982 çap bûye.

Wexta ku mere (mirov) li van berhemên dinêre ku bi zimanê Kurdî û Erebi nivîsîne mere nas dike ku mamoste Sadiq Behadîn berhevkar û şirovekar û zanyarek di warê kelepûr û ziman û wêjeya Kurdî de û herweha gelek pirtûk wergerandine bo şagirtên xwe û di nava salên temenê xwe yê 64 salan de bêwestan ked û cefayek mezin dît heya çû ser dilovanîya Xwedê di 16 Hizêrana 1982an li Bexdad û li nava axa lê jî day bûbû spartin axê .

Çavkanî:

- Kovara Elsewt Elaxe [Dengê din] bi Erebi
- Pirtûka Folklorê Kurdî.

Wergêra ji Erebi: Hozan EMÎN

FERHENGA REZVANIYÊ (*)

(2)

Amedekar: Dawûd Gulsun BAGÛRÎ
Herêm: Erxenî / Amed

(*) Ev xebata weşandî, beşek ji ferhengê ye. Ji ber ku dê beş beş bê weşandin, hin peyvên ku wateya wan bi peyvên din hatine şîrovekirin, ji ferhengê hatine derxistin. (Desteya Weşanê)

Kitir: Axa spî.

Kivkarok: Nexweşiyeke rêz e, li ser qurm û serteyan wekî kivkarikê peyda dibe.

Kon: Reşmal; ji mûyan, ji qumaşê sext tê çêkirin û wekî xanî tê bikaranîn.

Kox: Xaniyê biçûk û bêpace ye, li nav rezan çêdikin ku ji bo çend mehan tê de bisitirin.

Kufik: Nexweşiyeke tirî ye, bi taybetî tiriye gurr kufikî dibe û dihelise.

Kulbe: Amûrekî asinî û yekdev e, bi wê eşêv dibe û çavî tîn vekirin.

Kulîlk: Daneyên gûşiyên nû bûne wekî mircanan û dikevin kepegê.

Kullîşîn: Ew kuliya ku li nav rezan dijî; serê wê zer e, laşê wê keskê tarî ye.

Kullîzer: Ew kuliya ku biharê xilas dike paşê li nav rezan dijî.

Kurn: Guvaşgeha ji darê zexm hatiye çêkirin.





Wêne:

- 1) Mahsere.
- 2) Çirik/Çironeka mahsereyê.
- 3) Dewsa sîtila ber kurn.
- 4) Hirtot.
- 5) Tirîdan

Kuncî: Zadekî dendikhûr e, bi ser şîraniyên rêz tê reşandin, tehîn û gelek cureyên xwarinan pê tê çêkirin.

Kûp: Alavekî şîraniyên rêz tê de tîn parastin.

Legan: Alaveke lajwerdî û fireh e; ji bo lengê û kesmeyan bikêr e.

Leng: Şîreya kelandî û parzînkirî dixin leganê, arvan berdidinê û tev didin.

Lepik: Ji guliyên teze degirmî û pan ê hevrêstî pêk tê, di malêzê de dikin û zivistanê dixwin.

Lippolik: Cureyekî tiriye reng e.

Lînij: Bistika tirî ye ku dane pêve nema ne.

Lîtir: Bi qasî heşt lîtirên nû ye.

Mahsere: Guvaşgeha mezin e; ji tahtan, darê gûzan an jî bi betonê çêdikin.

Mahşêle: Dêlî.

Malêz: Pelûla rêz e; bi germî tê xwarin û bastêq, kesme sincûq û şîraniyên din jê çêdibin.

Mastêrik: Kovika ku mot û şîreyê tê re berdidin feraxên devteng.

Mele: Amrazeke darîn e; malêza bastêx û kesmeyê pê dûz dikin.

Mendelî: Cureyekî tiriye reng e.

Meqes: Amrazeke asinî ye, ji bo kezaxê bikêr e.

Merkirin: Bi merê kolana rêz e.

Mer: Alaveke devtûj e, pê erd tê serûbinhevkirin.

Meşk: Ji bo têxistin û kêşana mot, şîre û tiştên rohn ew alava ji çermê pêz çêkirî ye.

Mevsik: Alaveke degirmî, lajwerdî û qulqulîng e, şîreya sar bi wê dipalînin.

Mewij: Tiriye hişkkirî.

Mewijî/Mewjî: Tiriye reş û gewreg e, dendikên wî derman in.

Mewijok: Tiriye ku bi hemdê xwe li ser mêwê bibe mewij, tuxik.

Mezrome/Mezrone: Babetek tiriye spî ye, gûşîdirêj û sêrek û bibîn e.

Mêşika mêwan: Spiyên mêwan; nexweşiyek e.

Mêw/Mêwa tirî: Dara tirî ye.

Mêwa derewîn: Ew mêwa ku zêdetir geş dibe û tirî nagire.

Mêwa nêr: Ew mêwa ye ku eger gûşiyên bigire û di kepegê de hişk bike, pir şên û horoboro dibe.

Mêwa serkurkê: Dêlî.

Mêwlaw: Ji bo mêwek nû bê danîn şiva ku ji mêwek din hatibe jêkirin.

Mirmirik: Curekekî tirî ye, hildikişê ser daran û payîzan dereng digehîje.

Misawiq/Misewiq: Tiriye zûtir derdikeve ev e.

Miskî: Mezrome.

Miştaxe: Ji bo çêkirina mewijan dûzkirina erdê û raxistina tirî ye.

Mot: Şîreya hêdî hêdî bi kelandinê dadikeve, gava tîr dibe dibe mot, aqît, dims

Motora cot: Amûreke bingehîn e ji bo ajotina rêz û zêwîyan.

Movik: Niqira guliyên.

Nanûtirî/Nan û tirî: Meha rezberê ye, bi taybet du hefteyên dawîn a rezberê ye ku di wê demê de nan û tirî zêdetir tê xwarin.

Nasirkî: Cureyekî tiriye reng e.



Navbaran: Ajotina navbêna beranên rêz e.

Nikulqijik: Cureyekî tiriyê reng e.

Noşa: Şerbeta mewijê zer e.

Palandin: Safikirin/parzûnkirina tiştên vexwarinê.

Palav: Parzûnê tenik e, şîreya kelandî, dew û şîr bi wê diseftînin.

Pale: Karkerê rojewî ye ku karûbarên rêz dike.

Parzûn: Amrazek ji mû sext çêkerî ye, qeşa şîrê tê de dipalînin.

Paşayî: Curekî tiriyê reng e.

Paşero/Paşerok: Ew tiriyê ku li dû kelandin û berdanê ku xelk tîn bi şaxên mêwan ve mane ji xwe re jê diçinin.

Payîzî/Payzok: Curekî tiriyê dereng digihîje.

Pel/Pelçim: Belgê mêwê ye, ji bo tirî û sarmeyan baş e.

Pelgurî: Nexweşiyek pelên mêwan e, pel dipelqe.

Pelhûrik: Cureyekî tirî ye, pelgên wî hûrikî ne.

Pelixandin: Di guvaşgehê de yan di şêl de bi pêlêkirinê helisandin û virçoqîkirina tirî ye.

Pelmêw: Bergê mêwê.

Pelûl: Malêz.

Perçîn: Ji bo sitariyê dorpêçkirina rêz bi dar û berên dirikîn.

Perçiqandin: Pelixandin.

Pervende: Dîwarê bilind e ku li dora rez û baxçeyan çê dikin.

Pêçan: Di werza biharê de girêdana serçimkên guliyên bi darokê di erdê niçkirî ye.

Pêçeka reş: Giyayekî badekîn e, xwe li guliyên dipêçe û lewaz dike; divêtin bîn jêkirin.

Pêçeka sor: Rêzele.

Pêçdirêj: Cureyekî tirî yê hebdirêj û tamxweş e.

Pilpizekî: Cureyekî tirî.

Pisteq: Mewijê gewreg e.

Piştî: Hirtotên ku bi qasê meriv li pišta xwe ke û bikşîne.

Pizot: Kozên êgir.

Pî: Gulî û şaxên mêwan.

Pîjîk: Darên dirêjîya wî du sê bihust e û di dema ajotinê de li ber piyên mêwan tên niçkirin ku gîsin pê nekevin.

Pîncîk: Şaxên teze û zêde ne, bi destan tên kaşkirin.

Porîkî: Nexweşiyek rezan e, pelgên mêwan diquncivin ser hev.

Pozgolîk: Cureyekî tiriye reng e.

Qadosêjî: Zerik.

Qanaz: Sivnik.

Qangîlok: Gûşîçe, gûşiyê herî piçûk.

Qanqoşe: Parçeyek ji guliyê dara sincê jê dikin, kakilên gûzan bi dirikên wê ve dikin, bi malêzê ve dimalin û zivistanê dixwin.

Qax: Gindor yan jî kundirên qaşkirî hişk dikin û di mot de dikelînin.

Qelem: Ew şaxê piçûka mêwê ye ku ji bo patromeyê çep-rast jê dikin.

Qemçîk: Sapa gûşiyê tirî.

Qeraf: Şîreya tev qeşê û qirêjîya wê.

Qerfok: Curekî tiriye reng e.

Qerqûs: Ji babetê tiriye qaşiqalind e, ji bo mewijan baş e.

Qeş: Ew qirêjî ye ku gava şîre bikele bi ser dikeve.

Qeşgîr: Kefgir

Qeşgirtin: Dema şîre dikele bi kefgirê girtina qirêjê û kefa bi serketî ye.

Qeşlêqetîn: Eger qeş dema wê de neyê girtin şîre di qirêjê de dilewite.

Qetilnefs: Babetekî tiriye reş e.

Qilî: Tiliya tirî.

Qirme: Ew kesme ye ku di dewsa arvan de hûrika bulxur bikartê û zêdetir dikele.

Qirofî: Cureyek tiriye reşê tirûşdar e.

Qisir: Serşaxê tezetrîn e.

Qoc/Qonc: Koka qalind û girs e ku di bin erdê de ye.

Qorix: Daneyên tirî ji kepegê derketibe bi qasê nokan gir bike.

Qufe: Sepeta piçûk.

Qunbere: Qurix.

Qurix: Ew stêrka ye ku bi hesabê Kurdî 52 roj ji havînê bibihure sibeyan hiltê, gelek ronîdar e; stêrka sibê. Dema gihaştina tirî û dawîlêhatina miçiqîna avê ye.

Qurm: Gewdeya li ser koka mêwê ye û serte pêve ne.

Qurmik: Qurmên piçûk in, li ser erdê bi qurmê mezin ve ne, dema ku hişk bin tên jêkirin.





Dr. Nûrê
CEWARÎ ▶

Pirsên Berevkin û Arşîvkirina Nimûnên Muzîka Kurdî

• Li ser karên min ên folklorîstî

Folklorê Kurdî û di wê da jî muzîka Kurdî bi çiqil û janrên xwe va, bi tîp û şaxên xwe va, bi zaravên xwe va gelekî dewlemend e. Wextê me da, em çawa ber zimanê Kurdî dikevin, dixwazin ku ziman bê parastinê, ji peyvên gelên cînar bê paqijkirinê usa jî gotî li ser muzîka Kurdî bifikirin, qedrê wê bizanibin, bipolarêzin. Ew jî teherekî zimanê me ye bi xemla hunera wêjeyî, hunera stranbêjyê û sazbandiyê.

Folklorê Kurdî û di wê da jî muzîka Kurdî bi çiqil û janrên xwe va, bi tîp û şaxên xwe va, bi zaravên xwe va gelekî dewlemend e. Wextê me da, em çawa ber zimanê Kurdî dikevin, dixwazin ku ziman bê parastinê, ji peyvên gelên cînar bê paqijkirinê usa jî gotî li ser muzîka Kurdî bifikirin, qedrê wê bizanibin, bipolarêzin. Ew jî teherekî zimanê me ye bi xemla hunera wêjeyî, hunera stranbêjyê û sazbandiyê.

Îro gava mêdya pirrengî û pirteherî ketiye her malî û rêça xwe li ser rabûn-rûniştandin, edet û nimûnên folklorî dihêle pîrsa mezin dîtin, berevkin û arşîvkirina nimûnên folklorî usa jî yên muzîka qedîmî ye.

Rojên me da, hin çiqilên muzîka Kurdî zindî ne weke stran û awazên gundiyan, yên bajarvanan yanê jî yên bajariyê, yên ol û mîtolojîya êzdiya û îslamî. Tevî van stran û awaza usa jî teherên stran û awazên nû çêdibin ku dikarin bere-bere muzîka kevnare qedîmî bidine bîrkinê. Pêşekzan wan stran û awazên nû nav dikin çawa "folklorê duyemîn".

Ew çi ku îro li stûdyoya da, kolana da, konserta da tevî hacetên muzîka êlêktronî tene stranê dîsa jî li ser hîmê folklorê ne lê pê ra jî rengê folklorê di wana da bere-bere ditemire, awaz û întonasiyên gelên dorûber û yên Ewropî dikevine nav. Hine cara jî "welatperwerên" Kurd bi merîfeta xwe ya netam va têkst û awazên strana dihûnin û hela ser da jî zarokan hîn dikin givê ew stranên wan yên modern in.

Stranbêj û sazbandên folklorê duyemîn, yanê jî yên modern bi hacetên mûzîka yên êlêktronîk bi piranî stranên folklorî yên sivik veçêdikin ji bo reqas û eşqa guhdarvana, awaza tevî têkstên nû çêkirî û bi rîtmên reqasê yên başqe-başqe va didine pey hev. Em zanin ku eva tehera mûzîkayê jiyana nû ra girêdayî ye û kes nikare pêşiya wê bigre.

Em usa jî zanin ku folklorê qedîmî hê jî zindî ye, dikare bê dîtinê û berevkinê û ew ê paşwextiyê bibe hîmê veçêkirinê muzîka Kurdî yên profesyonel û bi wan nimûna nîfşên nû dikarin bêne terbetkinê (hînkirin).

Di vê gotarê da ez ê li ser karên xwe yên tomerkîrinê nimûnên folklorî, kopîkirin, çapkirin û arşîvkirinê rawestim û kutasiyê (encama) wan Dengxanên Armêniyê bîr bînim li ku nimûnên muzîka Kurdî tene xweykinê.

Min karên tomerkîrîna muzîka Kurdî ji sala 1964'ê dest pê kiriye bi êkspêdîsiyên biçûk va tevî bavê xwe Hecîyê Cindî li Armêniyê nehiya Artaşatê gundê Noraşênê, nehiya Aştarakê gundê Şamîranê. Min usa jî nimûnên folklorî ji radyoya Kurdî malda kopî dikirin. Têypa min mezin û giran bû bi kasêtên gîlover, qeytanên kîjanê kêr dest diketin. Gelek cara min ra ecizayî çêdibû.

Karê min hê aktîv bû gava ez li Armêniyê Înstîtûta Hunermendiyê ya Akadêmîya Zanyariyê da bûme aspirant (xwendkara Phd) û peyra jî karkera zanariyê. Mirov ku cîkî kar dike zane ku çavdarê karê

xwe ye û borcдар e serokatîyê her cara agahdar bike ka nîv salî, yanê jî salekî da çi kiriyê. Xên ji têgihîştina min ji bo ferzbûna berevkerin, tomerkîna folklorê ez usa jî, qey bêjî diketime lecê tevî hevalên xwe yên ermenî û karê min bi encamên baş va pêşda diçû.

Her wiha weke deh sala min bi kasêtên gilover (têypên Înstîtûta me jî bi kasêtên kone gilover bûn) kar dikir û peyra dest pê kir bi têypa biçûk kar bikim. Ji destpêkê ez tenê difikirim gelekî tomer bikim, nimûnên giranbuha bibînim ji bo hazirkîna berevokên folklorî û ji bo lêkolînan. Êkspêdîsiyên min li gund û bajarên komerên Armênîyê, Qazaxistanê û paytexta Gurcistanê Tibîlîsiyê bûn li ku piraniya Kurdên Sovyêta berê diman.

Stran û awaz baş dihatin tomerkîrînê û baş hatine xweykirinê. Bes hinek kêmasiyên wan hene ku paşwextiyê di-karin bêne serrastkirinê:

- Hinek cara min nikarîbû informatora mecbûr bikira ku sebir bikin, yanê jî wextê da dest pê bikin û heta min têyp pê va dikir û têyp bayê xwe hildida frazên nimûnên pêşin nedihatî nivîsarê. Wexta notenivîsara min ew fraz ji xanî angî ji mala nimûnêye duda ber dinivîsî.
- Kêm cara, ber ku qeytanên têypa dest nediketî, min têyp nivî da dida seknandinê. Awaz ku hey dihate wek-landinê, têra lêkolînên min dikirin lê têkst nivîşkan dima.

Pirsên çûyîna êkspêdîsîa û nivîsara têkstên strana da nivîskar Tosînê Reşît arîkarî daye min. Bi vî teharî hezara stran û awaz hatine tomerkîrînê. Bi hesab û qîmetên xwe va dengnivîsarên min ê mîxanîkiyê, hemberî karên hevalên min ên ermenî, hê gelek û hê qîmet bûn.

Piştî tomerkîrîna stran û awaza ra fikrê min hê zef li ser kopîkirîna wan bû, ber ku min zanibû ku dengnivîsar di-karin wînda bin û jiyana qeytanên têypa jî kin e.

Li Înstîtûta Hunermendiyê da li ku min kar dikir karên kopîkirin û peyra jî arşîvkîna dengnivîsarên mîxanîkiyê bi teherên zanyariyê dereng, di sala 1986'a da dest pê bû. Berî wê guhdarî hê zef li ser tomerkîrîn û notenivîsaran bû. Pêşiyê gotî dengnivîsarên muzîka ermeniya bihatana kopîkirinê. Kasêtên muzîka ermeniya gelek bûn, wana ji salên 30'yî ew kar dest pê kiribû. Hetanî kar hevekî pêşda çû, sala 1988'a erdhêja giran li Armênîyê çêbû, peyra dewleta Sovyêtê hilweşiya. Halê aboriya di-jwar ra tevayî êlêktrîk jî kêm bû, usa dibû ku rojê da 2 saet êlêktrîk didan. Karên kopîkirinê û arşîvkîrînê hedî

hedî dimeşîyan û dora muzîka kurdî nedigihîşt. Heta 5-6 sal berê jî ez pê hesiyam ku ew dengnivîsarên min ne-hatine kopîkirinê.

Bext ra wextê da min piraniya kasêtên êkspêdîsiyên xwe ji kasêtên gilover li ser kasêtên kompakte biçûk bes ji bo dengxana me ya malê kopî kiribûn.

Peyra, salên 1991-92'a min biryar danî karên kopîkirîna kasêtên min a malê jî yên kone gilover li ser kasêtên biçûke kompakt bi xwe mal da dest pê bikim. Min du têypa qeytana orta wana va saz kir û dest pê kir. Dîsa jî problêma êlêktrîkê ez eciz dikirim. Hetanî derketina me ji Armênîyê min weke 15 kasêtên gilover jî kopî kirin. Tevî derketina me ji Armênîyê me dengxana xwe temam derxist gîhande Aûstralîyê.

Mal da, li Aûstralîyê, mecal hate saz kirinê ji bo kopîkirîna kasêtên biçûk îjar jî li ser CD-ya. Gelek kasêt li ser sêlikên CD-ya hatine kopîkirinê lê ne bi wî teherî çî ku min dixwest. Her kasêtek dibû CD-yek, weke nimûnekî (yanî tu nikarî kîjan stranê bixwazî pê va bikî bibiheyî. Gotî her cara sêlik di serî da bibihêyî). Karekî ne profesîonal çêbû, lê dîsa jî ewan sêlikên CD-ya bi katalogên xwe va êdî milkekî hêja ne di meydana parastina stran û awazên gelerî da.

Ji bo karên folklorîst tam bin xên ji tomerkîrîn û kopîkirîna nimûnan usa jî jibartina wan ji bo çapkirinê gelekî mûhîm e.

Ber ku karê min ê hîmlî lêkolîn bû bi naskirîna taybetiyên muzîka qedîmî min ra hêsa bû tevî tomerkîrînê û kopîkirinê nimûnên hêja bivînim, bibijêrim, başqe bikim. Min note û têkstên wan hazir dikir û bere-bere di berevokên xwe da çap dikirin.

Karekî mezin jî ew arşîvkîrîna nimûnên berhevkirîne, yanî hazirkîna Dengxanê ye. Katalogê da gotî her nimûn bi nasnameya xwe va be. Nasnamê da gotî cawa gele pîrsa hebe. Min di karên katalog hazirkîrînê da jî jî rûyê lezketinê hinek kêmasî berdane, cawên pîrsên min di kataloga da netam in. Katalogên dengnivîsarên min ên mîxanîkiyê bi destnivîsar tene xweykirinê.

Katalog bi texmîna min gotî ji gelek pîrsan be, weke:

- Navê stran yan yê awazê.
- Nav û paşnavê informator.
- Sala bûyînê.
- Rûniştvanê/a kîjan deverê ye?
- Pêşiyên wî/wê ji ku ne?



- Sala tomerkîrînê.
- Ew nimûn çi tîpî yan janrî ye?
- Awaz li ser kîjan hacetê muzîkayê tê qedandinê?
- Nav û paşnavê folklorîst.
- Nimûn çawa tê bîhîstinê (baş, xirav)?

Pirs dikarin hê zêde bin. Wêne û video dikarin çêbin. Her çiqa jî karên min ên têxnîkiyê weke kopîkirina nimûnên êkspêdîsiya, arşîvkirina wan ji kêma bûna mecala, kêma cêrbandina min ne tam in, gumana min heye ku eva nivîsara min di meydana tomerkîrîn, kopîkirin, çapkirin, hazîrkirina Dengxana da dikare arîkarî folklorîstên nû di karên wan ê pîroz da bike.

Her wiha, xên ji dengxanên şexsî yên muzîka Kurdên Armêniyê usa jî hinek dezgehên dewletê hene li ku nimûnên muzîka Kurdî têne xweykirinê. Ji wan in:

1. Çawa jorê hate gotinê orîjînalên dengnivîsarên min ên mîxanîkiyê yên êkspêdîsiyayên min li dengxana Înstîtûta Hunermendiyê ya Akademiya Zanyariyê da têne xweykirinê. Li wê dengxanê da usa jî dengnivîsarên kurdî yên muzîkanên ermeniya – Krîstapor Kûşnaryan û Aram Koçaryan têne xweykirinê. Kûşnaryan di êkspêdîsiya yên

salên 1927-29'a da tevî nimûnên muzîka ermeniya weke 60 nimûnên muzîka kurdî tomerkîrîne. Koçaryan salên 1939-43'a da 110 nimûneyên muzîka Kurdî tomerkîrîne. (li ser van dengnivîsarên mîxanîkiyê binihêr gotara me "Pêwendiyên Kurda û Ermeniya yên sazbandiyê" 7, dengnivîsarên Kurdî yên mîxanîkiyê, kovara "Tîroj", hejmar 10, 2004). Kopya êkspêdîsiya me ya Qazaxistanê usa jî li Înstîtûta Kurdî ya Parîsê da têne xweykirinê.

2. Weke 10 kasêtên muzîka Kurdî yên Prof. Heciyê Cindî ku hatine kopîkirinê li ser CD-ya li Muzeya Armêniyê ya Wêjeyî û Çandeyî da têne xweykirinê.

3. Sertaca Dengxanên muzîka Kurdî li Armêniyê ew dengxana Radîo ya Armêniyê para Kurdî ye bi nimûnên giranbuha ku bi xemûriya Xelîlê Çaçan û Casimê Celîl hatine berhevkirinê.

Her wiha, folklor û di wê da jî muzîka Kurdî ya qedîmî hewceyê pêşekzan û nepêşekzana ne ji bo parastina wan. Muzîka qedîmî heta îro jî zindî ye û heta hê dereng nin e hêjayî dîtin, tomerkîrîn, çapkirin û arşîvkirinê ye. Gumana min usa jî heye ku zûtirkê hesabên Dengxanên Kurdî weke Pirtûkxanên Kurdî hev zêde bin.



Di Fabilên Kurdî De

rovî

Fabil, cureyeke wêjeyî ya dîdaktîk e ango armanca vê cureyê fêrkirin û şîretdayîn e. Fabil alegorîk e ango tiştên ku dixwaze bide, pêşî dişibîne tiştêkî din û paşê dide.

Bi gelemperî ev cure nivîs bi navê xwe yê resen fabil belav bûye. Peyva fabil (fabula) bi zimanê Latînî ye û tê wateya çîrokê

Rîdwan
DÎZMAN

Kurte

Di vê gotarê de bi giştî dê qala di fabilên Kurdî de roví û taybetiyên roví bê kirin. Pêşî li ser pênaseya fabil û dîrokçeya fabilê bê rawestandî û paşê di fabilên roví de li ser hêmanên fabilê û di van hêmanan de cî û rota roví bê nîqşkirin; taybetî û rengdêrên roví bi awayekî sistematîk bîna dabeskirin û senifandin.

Destpêk

Ewîlîn mînakên fabilan ango "fabl"an B.Z. di navbera sedsalên I-III'yan de hatine nivîsîn. Yekemîn berhema nivîskî ya Beydaba'yî ye. Navê berhemê Kelîle û Dîmne ye. Ev berhem B.Z. di derdora salên 300'î de, di desthilatdariya Padîşah Debşelem'î de hatiye nivîsîn. Kelîle û Dîmne navên du wawikan in ku ev wawik lehengên van fabilan in. ^[1] Berhema Beydaba'yî ji aliyê gellek neteweyan ve hatiye wergerandin û li rûyê erdê belav bûye. ^[2]

Behnûd kurê Sehewan ango Alî kurê Şahê Fars dema qonaxa nivîsîna pirtûkê di pêşgotina pirtûkê de vedibêje ji devê Beydaba'yî fabilekê bi cî dîke ku Beydaba'yî ev fabil beriya ku derkeve hafa padîşêh, şagirtên xwe kom kirine û ji bo wan vegotiyê. Navê vê fabilê Çivîka Çikçikanê ye. ^[3] Ji vir dixuye ku fabil beriya nivîsîna Beydaba'yî ji wekî cureyê zarê gelêrî hebû. Di nava gel de bi devkî dihat vegotin. Heman fabil di folklorê Kurdî de jî bi varyantên nêzî ya Beydaba'yî tê vegotin. ^[4] Di vê çîrokê de qala fîlekî serdest û çûkeke bindest tê kirin, şîreta wê jî ew e ku zordarî ji kesî re namîne û kesên bêhêz heke bibin yek, dikarin zora hêzdarên bibin.

Nivîskarê fabilan ê herî bi navûdeng bêguman La Fontaine (La Fonten) e ku ew di navbera salên 1621 û 1665'an de jiyaye. Wî gellek mijar ji Beydaba'yî girtine û bi kar anîne. ^[5] Li cîhanê fabilên herî berbelav ên La Fontaine'î ne.

1. Li ser Navê Fabilê

Fabil, cureyê wêjeyî ya dîdaktîk e ango armanca vê cureyê fêrkirin û şîretdayîn e. Fabil alegorîk e ango tiştên ku dixwaze bide, pêşî dişibîne tiştêkî din û paşê dide. Bi gelemperî ev cure nivîs bi navê xwe yê resen fabil belav bûye. Peyva fabil (fabula) bi zimanê Latîni ye û tê wateya çîrokê.

Di binavkirina navê fabilê ya bi Kurdî de lihevkirinek tune

ye. M. Emîn Bozarstan'î ji bo fabilan navê "Meselokên Lawiran" bi kar aniyê. Heciyê Cindî bêyî ku cuda bike navê "Hikyat"ê hem ji bo fabilan hem jî ji bo çîrokên din bi kar aniyê. Xalid Sadî navê "çîrokên gelêrî" bi kar aniyê. Bêwar Diyadîni û hin kesên din jî rasterast navê "fabil"ê bi kar tînin. Kurdên Soran jî navê "cefen"ê bi kar tînin, herwiha hin nivîskarên Kurdên Kurmanc jî vî navê bi kar tînin. Bi gerdûnî jî navê "fabil"ê tê bikaranîn. Ji ber ku navê Fabil'ê; resen, gerdûnî, belavbûyî û kurt e, di vê gotarê de bi giştî navê fabilê hat bikaranîn.

Fabil, ji çîrokên wekî bûyer di ser afirîdeyan (giha, ajal) re derbas dibin tê xuyakirin lê teqez şîret li mirovan dikin û menzûm in re tê gotin. ^[6] Herçiqas pênase wisa bibêje jî îro fabilên pexşan jî fabil tên hesabandin. Fabilên Beydaba'yî pexşan in, fabilên Lan Fontaine, Harname'ya Şeyhî û Gulîstana Şêx Sadî menzûm in. Di folklorê Kurdî de jî bi devkî û piranî bi awayê pexşanî tên vegotin. Çend nivîskarên me yê ji ekola Hawarê wekî Osman Sebrî ^[7] û Cegerxwîn'î ^[8] jî bi awayê menzûm mînakên fabilan di kovara Hawar û Ronahî'yê de dane.

2. Di Hêmanên Fabilan De Rovî

Di nav fabilan de 5 hêmanên sereke hene ku divê teqez tê de hebin. Ev hêman: Cî, dem, leheng, bûyer û şîret in. Gellek caran ev hêman bi dorê ji hêmana Cî heta hêmana Şîret'ê tê dayîn ji ber vê, honandina fabilan pir hêsan e. Hêmana Cî'yê ew hêman e ku bûyer lê diqewime. Hêmana Dem'ê ew hêman e ku dema fabilê dide der. Hêmana Leheng'î ew hêman e ku ji kesên di nav fabilê de cî digirin re tê gotin. Hêmana Bûyer'ê ew hêman e ku hêmanên din bi saya vê hêmanê bi hev ve tên girêdan û têkiliya wan çêdibe. Hêmana Şîret'ê ew hêman e ku di dawiya fabilê de derdikeve û bi hêsanî tê famkirin.

2.1. Cî

Di fabilên roví de cî herî zêde daristan e ku daristan ji

[1] Beydaba, Kelîle û Dîmne, [Wergêr: Alî Karadeniz], Weşanên Nûbihar'ê, çapa duyem, Stenbol, 2011.

[2] Beydaba-Ibnûl-Mukaffa, Kelîle ve Dîmne, [Wergêr: Sait Aykut], Weşanên Şule'yê, çapa duyem, 2003, rûpel 6-13.

[3] Beydaba, Kelîle û Dîmne, [Wergêr: Alî Karadeniz], Weşanên Nûbihar'ê, çapa duyem, Stenbol, 2011, rûpel 17.

[4] M. E. Botî, "Çûk û Fîl", Hawar, Hejmar 24, Şam, 1934.

[5] Ahmet Kabaklı, Türk Edebiyatı I. Nazım Türleri: Fabil, Weşanên Türk Edebiyatı Vakfı, çapa donzemîn, Stenbol, 2004, rûpel 692.

[6] Ahmet Kabaklı, Türk Edebiyatı I. Nazım Türleri: Fabil, Weşanên Türk Edebiyatı Vakfı, çapa donzemîn, Stenbol, 2004, rûpel 692.

[7] Osman Sebrî, "Gurê Pîr", Ronahî, Hejmar 12, Şam, 1943.

[8] Cegerxwîn, "Serxwebûna Mûriyan", Hawar, Hejmar 39, Şam, 1942.



aliyê gel ve bi çend awayan ve tê binavkirin. Di nava gel de ji daristanê re; rêl, dehl, devî û çol jî tê gotin. Herçiqaş ev tişt di rastiya xwe de ne daristan bin jî dîsa tèn bikaranîn. Piştî daristanê jî dora êş û kavlên gundan ciyên fabilên rovî ne. Ev her du der hinek dûrî gundan in. Rovî di fabilan de piranî li dora kavlên gundan rastî mirîşkekê, dîkekî yan jî qijîkekê tê. Ji ber ku di gellek fabilên rovî de û bi rastî di xwezaya rovîbûnê de jî xwarina mirîşk, dîk û werdekan heye ciyê fabilên rovî gellek caran jî dibe pîn, kox û kolik ku ev ajal tê de dihêwirin. Dîsa di xwezaya xwe de ciyê ku rovî tê de dihêwire; qul, kun û şikeft jî ciyên fabilên rovî ne. Di fabilên rovî de kêman caran jî bajar, qeşr û qonax jî dibin cî, dema ev der dibin cî mirov jî dikevin nav fabilan.

2.2. Dem

Dema ku fabilên rovî lê diqewimin wekî fabilên din dema borî ye. Ev yek jî ji vir tê famkirin ku di van fabilan de em rastî tiştên teknolojîk nayên. Mirov bi xwezayê ve girêdayî ne. Dema em bala xwe didin kel û pelên ku di nav van fabilan de cî digirin, hemû tiştên kevn in lewma dema fabilên rovî dema borî û kevn e.

2.3. Leheng

Di fabilên rovî de teqez rovî heye û bi piranî xwedî roleke mezin e. Gellek caran bûyer di ser wî re derbas dibe yan jî ew bandor li bûyer û qewimandinan dike. Fabilên ku rovî xwedî rolên biçûk in di Kurdî de pir hindik in.

2.4. Bûyer

Di fabilên rovî de bûyer gellek caran ji aliyê rovî ve tê honandin û rovî teşe dide van fabilan. Bûyer gellek caran bi hostatî tê honandin ku fen û fûtên rovî lê bê. Bûyer di fabilên rovî de balkêş e û kesên dixwînin di

meraqê de dimînin. Di fabilên rovî de xwîner an jî guhdar heta dawiya fabilan guhên xwe bel dikin, kêfxwes dibin û dikenin.

2.5. Şîret

Şîret di fabilên rovî de jî di dawiya fabilê de diyar dibe. Wekî fabilên din, di fabilên rovî de jî şîret zû û bi hêsani tèn famkirin. Di fabilên rovî de piranî fabil li ser hevaltî, destbirakî, şirikî tê honandin lewma şîretên ku ji wan fabilan derdikevin piranî li ser hevaltî û baweriyê ne. Çend şîretên ku di dawiya fabilên rovî de tèn kirin li jêr in:

- Neheqî li kesî nekin.
- Bêbextiyê li hevalên xwe nekin.
- Baweriyaya xwe bi hemû kesan neynin.
- Bi gotinên xwe nexapin.
- Zêde pesn û forsa xwe nedin.
- Fen li fenekan jî dibe.
- Rî dibe bihost dijmin nabe dost.
- Dijminê bav û kalan ji meriv re nabe bira.

3. Di Fabilan De Rola Rovî

3.1. Lehengê sereke

Di piraniya fabilên Kurdî yên ku rovî tê de heye de rovî lehengê me yê sereke ye. Xwedî taybetî, rol û peywirdariyê ye. Gellek caran fabil li gor kirinên rovî bergeha xwe diguherîne yan jî cobara xwe vediqetine û bi wî awayî diherike. Lewma di piraniya fabilên ku dema tèn binavkirin, rovî mora xwe lê dixê û navê xwe bi navê fabilê ve dide nivîsîn. Hin ji wan navan ev in; Rovî û Dîk, Rovî û Kew, Pîrê û Rovî, Şêr û Rovî, Gur û Rovî, Hirç û Rovî, Rovî û Qijîk, Rovî û Quling, Rovî û Tirî...

Carinan jî rovî bi rengdêr û taybetiyên xwe navê xwe dide fabilan; Hirça Birçî û Deka Rovî, Roviye Qol, Roviye Qol û

Hirç, Edeleta Rovî, Rojîya Rovî... Carinan jî dîsa rovî lehengê sereke ye lê navê wî li navê fabilê nayê kirin. Di fabila Heciyê Sextekar'ê de rovî cibê li xwe dike, xwe li hecîbûnê datîne û ajalên wekî mirîşk, kew û werdekê dixapîne dide pey xwe, bi hin fen û fûtan mirîşk û kewê dixwe, dixwaze werdekê jî bixwe lê werdek xwe xilas dike û rovî di dawiyê de têk diçe. ^[9] Di fabila "Toz Beg"ê de jî rovî dixwaze aşvanê ku alîkariya wî kiriye bizewicîne lewma diçe bi dek û dolaban wî aşvanî bi qîza paşê re dizewicîne û jê re qesrekê peyda dike û wî dewlemend dike.^[10] Ji van fabilan têt famkirin ku herçiqas rovî lehengê sereke be jî carinan navê xwe nikare li navê fabilê bike.

3.2. Lehengê asayî

Kêm caran rovî di nav fabilan de wekî lawireke asayî ye, di fabilên wisa de tu taybetî û girîngiya wî tune ye. Jixwe fabilên bi vî awayî di folklorê Kurdî de pir hindik in.

Di fabila berhevkarî Merd û Nemerda Heciyê Cindî de jî rovî lehengekî asayî ye, di vê fabilê de navên çend ajalên wekî hirç û gur jî derbas dibin. Wekî rovî tu rengdêrên van ajalan jî tune ye.^[11] Di vê çîrokê de bûyer di ser du mirovan re derbas dibe, yek ji wan diçe hîni razên van lawiran dibe û zêr û tiştên wan didize paşê mirovê din jî dixwaze heman tiştî bîne serê van lawiran lê bi ser na-keve. Heman çîrok bi varyanteke din di Kovara Folklorê Kurdan de jî hat weşandin.^[12]

Di fabila bi navê Dîk û Axa'yê de jî leheng dîk e dixwaze deynê bavê xwe ji axê bistîne bi rê dikeve di rê de rastî rovî, gur û cemî têt. Gur, rovî û cem dixwazin alîkariya vî dîkî bikin lewma bi hev re diçin qesra axê û axê têk dibin.^[13]

Di fabila bi navê Mîr Zoroyê de jî leheng pisîkeke kone ye bi tevî biçûk û bêhêzbûna xwe zora lawirên jî xwe mezintir û bihêztir wekî rovî, gur û hirçê dibe.^[14]

Di van fabilan de tu taybetî, cudayî û rengdêrên rovî yê beloq wekî fenekî, fêlbazî, şalûzî û derewkariya rovî tune ye.

4. Rengdêrên Rovî

Di bin banê vê beşê de ji bo ku di fabilên Kurdî de kesayeta rovî derkeve ango aşkere bibe, di nav fabilan de

rengdêrên rovî li gor zêdebûn û girîngiya wan, bi nirxandina mînak û varyantên fabilan bi dorê bên veçirandin û dayîn.

4.1. Roviye fenek û fêlbaz

Rengdêra rovî ya herî beloq fenekî ango fêlbaziya rovî ye. Di fabilên Kurdî de fenekiya rovî bi rengdêrên mîna dek-baz, xapînok, hîlekar, kone, derewkar, baqilû hwd. têt ravekirin. Piraniya fabilên ku rovî têt de ye rovî bi van rengdêran derdikeve pêşberî me.

Fabila bi navê Rojîya Rovî yek ji van fabilan e. Di vê fabilê de têt vegotin ku rovî rojekê pir birçî dibe, ji bo ku xwe têt bike li daristanê digere û têt li ber darekê disekine. Perçeyek goşt bi darê ve ye. Ji ber rewşê, rovî dikeve şikê û li der û dora xwe raçav dike lê tiştê nabîne. Xwe li hember darê ditelîne û wisa disekine. Wê gavê gurekî birçî têt goştê bi darê ve ye dibîne û sedema sekinandina rovî jî rovî dipirse. Rovî jê re dibêje: "Ez rojî me lewma nax-wim." Gur ji ber vê, êrîşî goştî dike lê ji ber ku li ber dara goşt pê ve ye dafik heye, dengê teqînê têt û gur dikeve dafikê û dieciqe. Rovî ji ciyê xwe radibe û goştî dixwe. Dema gur rojîya wî jê dipirse. Rovî bersiva wî dide û dibêje: "Ma te dengê topê nebihîst?"^[15] Di vê fabilê de rovî fam dike ku rewşeke xetere heye lewma xwe naxe xetereyê, gurî jî bi rojîbûnê dixapîne berê wî dide goştî bi vê xapandinê bêyî ku xwe têxe xetereyê goştî bi dest dixwe.

Di fabila bi navê Kûpê Qeliyê de jî têt vegotin ku rovî, gur û hirç dibin destbirakên hev û ji bo zivistanê bi hev re qeliyê çêdikin û qeliyê dixin kûpekî û kûpî jî li şikeftê vedîşêrin. Sond dixwin ku heta zivistanê devê kûpî venekin lê rovî her carê bi awayekî bi hin hincetan xwe ji wan dûr dixwe û her carê hindik hindik dawîya qeliyê tîne. Dema lawirên din dibînin ku binê kûpî vala ye, rovî bi dek û dolaban hirçê bi gurî dide kuştin û xwe dîsa xilas dike.^[16]

4.2. Roviye şalûz

Piştî fenekiya rovî rengdêra rovî ya herî beloq şalûziya rovî ye. Bi tevî şalûziya rovî piranî rengdêra wî ya newêrekî û tirsonekî jî derdikevin. Ji ber ku di nav lawiran de yek ji lawirên herî biçûk û bêhêz e, di gellek fabilan de bi lawirên xurt û hêzdar re dibe destbirak, heval an jî şirîk. Ji ber ku bi hêz û qeweta xwe bi wan lawirên hêz-

[9] Bro Omerî, Carekê Ji Caran. Heciyê Sextekar, Weşanên Avesta'yê, Stenbol, 2013, rûpel 29.

[10] Zinarê Xamê, Hebû Tûne Bû-Antolojiya Çîrokên Zarokan. Toz Beg, Weşanên Rûpel'ê, Stenbol, 2014, rûpel 216.

[11] Heciyê Cindî, Hikyatên Cime'ta Kurda. Merd û Nemerda, Weşanên Ronahî'yê, Amed, 2011, rûpel 74.

[12] Mesûd Gezgîn, "Comerd û Nemerda", Folklorê Kurdan, Hejmar 2, Amed, 2015, rûpel 34.

[13] Nasirê Torî, "Dîk û Axa", Folklorê Kurdan, Hejmar 1, Amed, 2015, rûpel 46.

[14] M. Emîn Bozarstan, Mîr Zoro-Meselokên Lawiran I. Mîr Zoro, Weşanên Deng'ê, çapa duyem, Stenbol, 1999, rûpel 70.

[15] Zinarê Xamê, Hebû Tûne Bû-Antolojiya Çîrokên Zarokan. Rojîya Rovî, Weşanên Rûpel'ê, Stenbol, 2014, rûpel 381.

[16] M. Emîn Bozarstan, Gurê Bilûrvan-Meselokên Lawiran II. Kûpê Qeliyê, Weşanên Deng'ê, çapa duyem, Stenbol, 2000, rûpel 7.

dar û gir nikare ji bo ku li bin sîvana wan be, bi şalûzî xwe nêzî wan lawiran dike. Bi vî awayî xwe ji mirinê diparêze lê dîsa jî rengdêra wî ya fenekî derdikeve û gellek caran dîsa ji bo berjewendiya xwe dek û dolaban li ser destbirak, heval û şîrikan digêrîne. Rovî her tim pesnê wêrekî, hêzdarî û mezinbûna lawirên mezin dide.

Di fabila Gur û Roviyê Teral û Fêlbaz'ê de rovî rojekê zivistanê ji ber birçînan û sermayê xwe davêje bextê gurî. Bi şalûzî û lavayî xwe dixwe mala gurî. Xwarina gurî bi dizîka dixwe, dema xebera gurî jê çêdibe sond dixwe û dîsa bi dek û dolaban gurî têk dibe. ^[17] Rovî gellek caran ji bo ku xwe nêzîk bike û bi dek û dolaban li ser wan bigêrîne û wan bixwe bi rengdêra xwe ya şalûzî nêzî ajalên biçûk wekî dîk, qijik, mirîşk û kewê jî dibe û pesnê deng û xwe-sikiya wan dide.

Di fabila Rovî û Dîkê Piçûk'ê de Rovî rojekê rastî dîkekî biçûk tê ji bo ku wî bixwe, xwe nêzî wî dike pesnê dengê bavê wî dide û dixwaze dengê wî jî bibihîze. Dîk çavên xwe digire û dest bi bangdanê dike. Rovî hema dîkî dike devê xwe û direve. Xwediyê malê jî dide pey û gef lê dixwe. Dîk ji bo ku rovî xeber bide û devê xwe veke, wî dixapîne û bi saya devvekirina rovî, dîk xwe ji destê rovî xilas dike. ^[18]

Di fabila Rovî û Zerik'ê de rovî li ser darekê zerikekê dibîne û dixwaze wê bixwe. Ji bo ku bikare wê bixwe divê zerik dakeve xwarê lewma rovî pesnê dengê zerikê dide û dixwaze dengê wê bibihîze. Zerik stranekê dibêje. Rovî wekî ku dengê zerikê pir ecibandîye tev digere û daxwaza dîtina wê jî dike û vedixwîne xwarê. Zerik armanca rovî fam dike û dêlawa xwe çiqilekî darê davêje û rovî dixapîne. Rovî dixape û êrîşî çiqilî dike û bi vî awayî dîsa têk diçe. ^[19]

4.3. Roviyê bêbext

Yek ji rengdêrên rovî ya herî beloq û aşkere jî bêbextiya rovî ye. Di piraniya fabilên Kurdî de rovî bêbext e. Gellek caran di dawiyên fabilan de bêbextiya rovî diyar dibe. Bêbextiya rovî di fabilan de bi rengdêra xayîn û zalim jî tê ravekirin.

Di fabila Şikefta Lawiran de zivistanekê rovî, şêr, hirc, gur

û kevok ji ber berf û seqemê xwe diavêjin şikeftekê. Berf devê şikeftê digire û ajal tê de dimînin. Ji bo ku ji aliyê ajalên din ve neyê xwarin rovî bi şalûzî xwe digihîne şêrî û ajalên din bi hin maneyan bi şêrî dide kuştin û xwarin. Pêşî bi vî awayî bêbextî li ajalên din dike lê dawiyê jî bêbextî li şêrî dike. Rovî şêrî jî dike û dixwe. ^[20]

Di fabila Destbiratiya Gur û Rovî de rojekê gur û rovî dibin destbirakên hev. Rastî hespekî tîn û dixwazin hespî bixwin. Pêşî rovî diçe bo êrîşê, lê dema fam dike ku hespî xwe ji bo zîtîkê amade kiriye. Ji gurî re vê yekê nabêje û gurî dixapîne û bi ser hespî de dişîne. Hesp zîtîkê lê dixwe û diavêje erdê. ^[21]

Ji van fabilan tê famkirin ku rovî ji hevalên xwe re bêbext e û bawerî pê nayê.

4.4. Roviyê ehmeq

Rovî digel baqilî, fenekî û fêlbaziya xwe di hin fabilên Kurdî de bi rengdêra ehmeqiyê jî derdikeve pêşberî me. Di van fabilan de piranî rovî yan pir pesn û forsa xwe dide paşê jî tîk diçe yan jî bi rastî jî ehmeq e. Di van fabilan de piranî dek û dolab ji aliyê kesên din ve li serê rovî tîn gerandin yan jî rovî bixwe serê xwe dixwe belayan. Di fabilên ku rovî ehmeq e de gellek caran tiştên nebaş ên ku tîn serê rovî ji ber bînefsî û ji ber çavbirçîtiya wî tîn serê wî.

Di fabila Pîrê û Rûvî de rovî her roj bînefsiyê dike û diçe şîrê pîrê dixwe Pîrê rojekê rovî digire û dûvê wî jê dike. Rovî diçe cem hevalên xwe. Hevalên wî tinazên xwe pê dikin. Rovî ji şerman diçe cem pîrê. Pîrê jî şîrê xwe, jê dixwaze. Rovî diçe cem bizinê, ji bizinê şîr dixwaze. Bizin ji bo ku şîr bide wî, jê çilo dixwaze. Rovî diçe cem darê. Dar ji bo ku çilo bide avê dixwaze. Rovî diçe cem avê. Av ji bo ku biçê ber darê dixwaze keçik werin li ber wê bireqîsin. Rovî diçe cem keçikan. Keçik ji bo ku bireqîsin solan dixwazin. Rovî diçe cem soldurî. Soldur ji bo ku solan bide hêkan dixwaze. Rovî diçe cem mirîşkan. Mirîşk ji bo ku hêkan bidin qut dixwazin. Rovî diçe cem benderê. Xwediyê benderê dibêje: "Alîkariya min bike ku ez gêris bidim te. Rovî alîkariya wî dike. Mêrik gêris dide. Mirîşk hêkan didin. Soldur solan dide. Keçik direqîsin.

[17] M. Xalid Sadîni, Çîrokên Gelêrî. Gur û Roviyê Teral û Fêlbaz, Weşanên Nûbiharê, çapa duyem, Stenbol, 2013, rûpel 39.

[18] Zinarê Xamê, Hebû Tûne Bû-Antolojiya Çîrokên Zarokan. Rovî û Dîkê Piçûk, Weşanên Rûpel'ê, Stenbol, 2014, rûpel 209.

[19] Zinarê Xamê, Hebû Tûne Bû-Antolojiya Çîrokên Zarokan. Rovî û Zerik, Weşanên Rûpel'ê, Stenbol, 2014, rûpel 67.

[20] M. Emîn Bozarstan, Gurê Bilûrvan-Meselokên Lawiran II. Şikefta Lawiran, Weşanên Deng'ê, çapa duyem, Stenbol, 2000, rûpel 49.

[21] Zinarê Xamê, Hebû Tûne Bû-Antolojiya Çîrokên Zarokan. Rovî û Dîkê Piçûk, Weşanên Rûpel'ê, Stenbol, 2014, rûpel 152.

Av diherike. Dar çilo dide. Bizin şîr dide. Pîrê jî dûvê roví dixemilîne û didê. Rovî paşê forsa xwe bi dûvê xwe yê xemilandî diavêje. Ji bo ku heyfa xwe ji hevalên xwe bistîne, wan dixapîne û dûvên wan jî qut dike. ^[22]

Di fabila Roviyê Çiyê û Roviyê Çolê de roviyê çiyê û yê deştê dibin destbirakên hev. Roviye çiyê forsa xwe dide ku fenên wî pir in, roviyê deştê jî yekî nefsbîçûk e ji roviyê çiyê re dibêje: "Tenê feneke min heyê." Paşê nêzî rezekî dibin roviyê çiyê bênefsî dike dikeve nav rêz lê ji ber ku xwediye rêzî di nav rêz de xefik vedaye, dikeve xefikê. Dike nake nikare xwe xefikê xilas bike. Roviye çolê tê û bi feneke xwe roviyê çiyê xilas dike. ^[23]

Di fabilekê de roví ji birçinan xwe diavêje bextê şêrî. Bi saya şêrî zikê xwe têr dike piştî ku hinek tê ser hemdê xwe bi ya wî ye hîni nêçîrê bûyeango hîni şêrbûnê dibe, ji şêrî vediqete û bi rêya xwe de diçe. Rastî roviyekî jar tê, jê re dibêje: "Bibe xulamê min wextê ez nêçîrê bikim tu jî zikê xwe têr bikî." Di rê de rastî yekî gundî û kerê wî tên. Rovî dixwaze êrîşî bibe ser wan. Bi zarê şêrî dike û wekî şêrî êrîşî kerê dike lê gundî hema radike çoyê xwe û li roví dixwe, têr dikute. Piştî dibêje qey roví mir lewma diavêje kêleka rê û bi rêya xwe de diçe. Roviye jar tê ber serê wî û jê re dibêje: "Rovî nikarin bibin şêr." ^[24]

Di fabila Hirça Aqildar û Rovî de hirç hespekî dakuje û dixwe, roví tê pesnê wê dide, dibêje: "te çawa ev hesp kuşt?" Hirç wî dixapîne dibêje: Here dûvê xwe bi dûvê hespî girê bide û leqekî jî li ranê wî bide tu yê wî bikujî." Roviye ehmeq diçe bi ya hirça aqildar dike. Dûvê xwe bi dûvê hêspî ve girê dide dike leqekî li ranê wî bide lê hesp pê dihesê û direve. Ji ber ku dûvê wan bi hev ve girêdayî ne. Rovî jî pê re diçe. Hesp her ku direve roví li der û dorê dixwe û wî perîşan dike. ^[25]

4.5. Roviye alîkar

Ev rengdêra roví di fabilên Kurdî de pir kêr dardikeve. Rovî bêsedem alîkariya kesî nake. Piranî alîkariya kesekî gihîştîye wî lewma roví qenciya wî kesî lê vedigerîne. Di fabilên roví alîkariya kesekî dike de roví gellek çaran dîsa dek û dolaban li ser hin kesan digerîne û heqê rengdêrên xwe yên din dîsa dide.

Di fabila Çeqçeq Padîşah'ê de aşvan rojekê dikeve êş û roví li ser diziyê digire. Rovî lavayî dike û bi soza alîkariya aşvên bike ji mirinê xilas dibe. Ji bo ku qencî li aşvên bike diçe qesra padîşêh û koda zêran bi maneya pîvana zêrên Çeqçeq Padîşahê(aşvan) xwe dixwaze. Padîşah tê nagihîje lê dibêje: "Tiştê nabe, de roviyek e." Ferman dide wezîrê xwe. Wezîr diçe kodê tîne û didê. Dema roví kodê dibe dide aşvên ji toqa kodê çend zêr dikevin. Rovî bi zêrekî çend polan dide kîrrîn û di bin toqa kodê de bi cî dike. Dema kodê digihîne padîşêh. Wezîr digire kodê li xezîne li erdê dide, mêze dike deh zêr(pol) jê derketine. Ew dibêjin qey padîşahê roví ji wan dewlemendtir e. Ew xelatekê didin roví da ku padîşahê roví fam bike ku ew ji padîşahê roví dewlemendtir in. Ew kodeke biçûk didin roví. Rovî kodê digire û diçe cem aşvên. Aşvan aşê xwe difiroşe dide pey roví. Rovî ew çend zêrên mayî bi dûvê xwe ve girêdide û dixemilîne. Kincên aşvên ji wî dike û diavêje çêm. Diçe cem Padîşêh dibêje di rê de ew hatine şêlandin û padîşah tazî li çolê maye. Padîşah amadekariyê dike û kincan jê re dişînin û wî tînin. Padîşah qîza xwe jî dide wî. Piştî demekê Padîşah wan tevî leşkerên xwe bi rê dike. Rovî dide pêşîya wan. Xwe digihîne qesra padîshahekî din. Dibêje: "Padîşahê min hatiye şerê we." Rovî wan dixapîne di nav lodê de vedîşêre û paşê jî dişewitîne xwe ji wan pak dike. Çeqçeq Padîşah, qîza Padîşêh û leşkerên Padîşêh digihîjin qesrê û jê pê ve Çeqçeq Padîşah û qîza Padîşêh bi miradê xwe dijn. ^[26]

Di hin fabilan de jî roví bêyî berjewendîya wî hebe bi alîkariya hin kesan dike. Ev cure fabilên Kurdî pir hindik in. Di fabila Mar û Mirov'ê de mirov rojekê rastî marekî li bin kêvir tê. Gunehê wî pê tê diçe marî xilas dike. Mar piştî xilasbûnê dixwaze bi wî vede. Mêrik diheyire û tê nagihîje. Paşê biryar didin ku herin cem aqilmendekî jê bipirsin ka kî mafdar e. Hinek diçin di rê de rastî roví tên. Daxwaza hakîmtiyê jê dikin. Rovî qebûl dike. Paşê mêrik ji serî heta binî serboriya xwe ji roví re vedibêje. Rovî tê digihîje lê dibêje: "Ji bo ku ez baş fam bikim divê em biçin cihê serboriya we lê qewimî." Diçin wir vê carê roví ji marî re dibêje: "Ji bo ku ez baş fam bikim divê tu bikevî bin kêvir jî." Mar dikeve bin kêvir. Rovî ji mêrik re dibêje: "Tu jî divê kêvir danî dewse." Mêrik jî kêvir datîne ser

[22] Heciye Cindî, Hikyatên Cime'ta Kurda. Pîrê û Rûvî, Wesanên Ronahî'yê, Amed, 2011, rûpel 80.

[23] Nasirê Torî, "Roviye Çiyê û Roviye Çolê", Folklorê Kurdan, Hejmar 2, Amed, 2015, rûpel 89.

[24] Mustafa Borak, Ferhengê Biwêjan, Stenbol, 2005, rûpel 38.

[25] M. Xalid Sadîni, Çîrokên Gelêrî. Hirça Aqildar û Rovî, Wesanên Nûbiharê, çapa duyem, Stenbol, 2013, rûpel 63.

[26] Heciye Cindî, Hikyatên Cime'ta Kurda. Çeqçeq Padîşah, Wesanên Ronahî'yê, Amed, 2011, rûpel 88.

marî. Rovî pišta xwe dide û diçe. Mar dibêje: "Tu çi dikî ez li vir eciqîm." Rovî berê xwe dide mêrikî û dibêje: "Cardin wî kevirî ji cihê wî raneke."^[27]

5. Li Gor Encamê, Rovî

Li gor encamên fabilên Kurdî hejmarên serkeftin û têkçûna rovî nêzî hev û din in. Di gellek fabilan de jî mirov dibîne ku rovî carinan têk diçe, carinan jî bi ser dikeve, lê dîsa jî li gor encamê rovî yan bi giştî serkeftî dibe yan jî têkçûyî dibe. Bi giştî li fabilên ku rovî tê de ye bê mêzekerin dê ev encam jê derkeve ku bi piranî di fabilên ku rovî bi lawirên ji rovî mezintir û hêzdartir re ye de, di encamê de rovî serkeftî ye. Di fabilên ku rovî bi ajalên biçûk re ye de ku ew ajal pir caran mirîşk, dîk, qijik, qaz û werdek in, rovî têk diçe. Bi saya van encaman mirov digihîje vê encamê ku afirînerên van fabilan alîgirê bindest û bêhêzan in. Carinan ev bindest rovî dibe cem lawirên gir û hêzdar wekî şêr, hirc, gur û hwd. Carinan jî ajalên wekî mirîşk, dîk, qijik û hwd. dibin bindest û rovî jî dibe zalim, xayîn û ji aliyê wijdanê ve tê têkbirin.

5.1. Serkeftina rovî

Li hember neheqî, heqaret û zordestiyê, rovî piranî bi ser dikeve. Di fabilên wisa de piranî neyarên rovî; şêr, hirc û gur in. Ew lawirên mezin piranî di fabilên wisa de qure û zordar in û gellek caran rovî ji aliyê wan ve biçûk û bêqîmet tê dîtîn, lê dawiyê rovî bi fen û fûtan bi dek û dolaban heyfa xwe ji wan distîne, wan têk dibe û bi vî awayî bi ser dikeve.

Di fabila Serpêhatiya Şêr, Gur û Rovî de rojekê serdarê daristanê şêr nexweş dikeve. Ji xeynî rovî hemû lawir tên serdana wî û şifaya xêrê jê re dixwazin. Gur nasekine diçe fesadiyê dike. Ji şêrî re dibêje: "Ji xeynî rovî hemû lawir hatin serdana te, jixwe ew serdariya te qebûl nake û ji te hez nake." Ev fesadiya gurî diçe ber guhê rovî. Rovî berê xwe dide şikefta şêrî. Şêr sedema nehatina wî jê dipirse. Rovî dibêje: "Ez çûm ji bo nexwaşiya te li dermanê geriyam û min peyda kir jî." Şêr dibêje: "Dermana min çi ye?" Rovî dibêje "Divê tu postê gurê nûkustî li xwe bipêçî û du rojan wisa bisekinî tu yê piştî du rojan baş bibî." Şêr hema diçe gurî dikeve û postê wî jî li xwe dipêçe. Bi vî awayî rovî heyfa xwe ji gurî distîne.^[28]

Di fabila Nêçîra Masiyan de rovî rojêke zivistanê li daristanê rastî şêrî tê. Şêr dixwaze wî bixwe rovî dikeve nav çêr û ji destê şêrî xilas dibe. Diçe cem tora masîvanan, bala xwe didê ku masî ketine toran. Diçe sêlikekê tije masî dike û diçe cem şêrî. Dema şêr rovî dibîne diheyire, lê dema rovî masiyên ku anîne dide wî şêr kêfxweş dibe. Şêr piştî masiyan dixwe û zikê xwe têr dike, ji rovî dipirse: "Te ev masî ji ku anîne?" Rovî dibêje: "Ez hînî masigiriyê bûme ez her tim masiyan digirim û zikê xwe pê têr dikim. Heke tu dixwazî hîn bibî ez ê hînî te jî bikim." Şêr qebûl dike û bi hev re diçin ber çêr. Rovî dibêje: "Dûvê xwe noqî avê bike ku masî werin pê bigirin." Şêr gotina wî dike û heta sibê wisa dimîne. Herçiqas dibêje: "Canê min diêşe" jî rovî jê re dibêje: "Ez bi vî halê xwe yê jar dikarim ma tu nikarî?" Lewma şêr nikare ji ciyê xwe rabe jî. Paşê dûvê şêrî di avê de diqerise. Rovî fam dike ku şêr êdî nikare xwe ji ciyê xwe bilivîne, diçe kevirêkî mezin tîne û li serê wî dixwe, dikeve. Bi vî awayî heyfa xwe jê distîne.^[29]

Di fabila Biratiya Rovî û Mar'ê de rovî û mar dibin destbirakên hev û bi hev re digerin. Rojekê dixwazin derbasî hemberî çêr bibin lê mar dibêje: "Ez nikarim avjeniyê bikim". Rovî dibêje: "Tîştê nabe ez dizanim, tu jî xwe bi min ve bialîne ez ê te jî derbas bikim". Mar xwe li stûyê rovî dialîne û dikevin avê. Hindik dimîne bigihîjin aliyê din mar dixwaze rovî gez bike. Rovî çi lavayî dike jî mar ji ya xwe venagere. Rovî mêze dike ku tu çare tune ye jê re dibêje: "Madem tu min gez bikî û bikujî qet nebe ez xatirê xwe ji te bixwazim, were ez gewriya te ya xweşik maç bikim". Mar dixape û gewriya xwe tîne ber devê rovî. Rovî hema gez dike û marî dikeve û bi vî awayî heyfa xwe jê distîne.^[30]

5.2. Têkçûna rovî

Di fabilên Kurdî de gellek caran rovî dema dixwaze hin ajalên biçûk bixwe yan neheqî, heqaret û zordestiyê li wan bike, rovî têk diçe. Di van fabilan de rovî bi rengdêrên kirêt derdikeve pêşberî me û neheq e lewma ji ajal û kesên din ve tê têkbirin.

Di fabila Tûtik û Rovî de tûtikek û çêlikên wê li çolê dimînin. Rovî rojekê tê wan dibîne û dixwaze bixwe. Tûtik

[27] Çirokbêj, "Mar û Mirov", Hawar, Hejmar 6, Şam, 1932.

[28] Zinarê Xamo, Hebû Tune Bû-Antolojiya Çirokên Zarokan. Serpêhatiya Şêr Gur û Rovî, Weşanên Rûpel'ê, Stenbol, 2014, rûpel 169.

[29] M. Emîn Bozarşan, Gurê Bitûrvan-Meselokên Lawiran II. Nêçîra Masiyan, Weşanên Deng'ê, çapa duyem, Stenbol, 2000, rûpel 35.

[30] M. Emîn Bozarşan, Mîr Zoro-Meselokên Lawiran I. Biratiya Rovî û Mar, Weşanên Deng'ê, çapa duyem, Stenbol, 1999, rûpel 54.

lavayî dike û dibêje: "Çêlikên min hîn hur in, bila hinek mezin bin dûre were me bixwe." Rovî qebûl dike û diçe. Dema çêlikên tûtîkê mezin dibin û dema hatina rovî jî nêzik dibe. Tûtîk diçe gazî tajiyan dike û wan vedîşêre. Dema rovî tê û dixwaze wan bixwe, tûtîk bi awayekî dizî tajiyan haydar dike ku rovî hatiye. Tajî derdikevin û êrîşî rovî dikin. Tûtîk bi vî awayî xwe û çêlikên xwe xilas dike.^[31]

Di fabila Dîk û Rovî de rovî li ser darekê, dîkê bang dide dibîne û dixwaze wî bixapîne û bixwe. Rovî jê re dibêje: "Sofî qey wextê nimêjê ye, kerem bike were xwarê bibe mela û em nimêja xwe bikin." Dîk fam dike armanca rovî çî ye lewma berê xwe dide aliyê gund û dibêje: "Bisekine ji aliyê gund du heb tajî tîn, bila ew jî werin em bi hev re nimêj bikin. Nimêja cimaetê xêr e." Rovî navê tajiyan dibîhîze hema piştî xwe dide û direve. Dîk bang lê dike dibêje: "Rovî tu diçî ku derê ka me bi hev re nimêj bikira?" Rovî dibêje: "Min ji bîr kiriye destnimêja min şikestibû, ez ê herim destnimêja xwe bigirim."^[32]

Di fabila Rovî û Kew de rojekê rovî li daristanê rastî kewê tê. Dixwaze wê bixwe lewma xwe nêzî wê dike û bi gotinên xweş û pesndar pesnê wê û dengê wê dide. Daxwaza guhdarkirina dengê wê dike. Kew jî bixwe nikare û dest bi xwendinê dike. Dema dixwîne çavên xwe jî digire. Rovî hema wê digire dike devê xwe. Kew fam dike ku hatiye xapandin û bê xwarin. Daxwazekê ji rovî dike û dibêje: "Berê ku min bixwe bêje şikûr Elhamdûlîllah. Rovî dilê wê nahêle û bi ya wê dike. Dema devê xwe vedike kew baz dide û difilite û jê re dibêje: "Ez di xwelî li serê wî bikim ku hê şev nehatibe, nava rojê çavên xwe bigire bikeve xew." Rovî jî bersiv dide dibêje: "Ez jî xwelî li serê wî bikim ku hê zikê wî birçî be bêje şikur Elhamdûlîllah."^[33]

Encam

Di encamê de di fabilên Kurdî de rovî xwedî cî û peywîrên girîng e. Di fabilên rovî de kêman caran rovî lawirekî asayî ye. Rovî di fabilên Kurdî de xwediyê gellek rengdêran e. Dekbazî, şalûzî, derewkarî, newêrekî, bêbextî û kêman caran jî qencî rengdêrên rovî ne. Rovî dema di fabilan de dibe bindest û neheqî lê tê kirin, heyfa xwe bi fen, fêlbazî û baqiliya xwe ji kesî re nahêle. Rovî dema dibe serdest, çiqas xwediyê fen û fûtan be jî nikare bigihîje armanca

xwe û di fabilên wisa de têk diçe. Heke em bi awirekî fireh li fabilên Kurdî hûr bibin dê aşkere û diyar bibe ku rovî di fabilên Kurdî de hîmekî sereke ye. Fabilên ku rovî tê de ye, tahmdar in. Xwîner û guhdar bi saya fen û fûtên rovî bi tahma fabilên Kurdî têr nabin û gellek kêfxwes dibin.



ÇAVKANÎ

- Beydaba: Kelîle û Dîmne, [Werger: Ali Karadeniz], Weşanên Nûbihar'ê, çapa duyem, Stenbol, 2011.
- Beydaba-Ibnül-Mukaffa: Kelîle ve Dimne, [Werger: Sait Aykut], Weşanên Şule'yê, çapa duyem, 2003.
- Borak, Mustafa: Ferhenga Biwêjan, Stenbol, 2005.
- Bozarstan, M. Emîn: Gurê Bilûrwan-Meselokên Lawiran II, Weşanên Deng'ê, çapa duyem, Stenbol, 2000.
- Bozarstan, M. Emîn: Mîr Zoro-Meselokên Lawiran I, Weşanên Deng'ê, çapa duyem, Stenbol, 1999.
- Botî, M. E.: "Çûk û Fil", Hawar, Hejmar 24, Şam, 1934.
- Cegerxwîn: "Serxwebûna Mûriyan", Hawar, Hejmar 39, Şam, 1942.
- Cindî, Heciyê: Hikyatên Cime'ta Kurda, Weşanên Ronahî'yê, Amed, 2011.
- Çirokbêj: "Mar û Mirov", Hawar, Hejmar 6, Şam, 1932.
- Diyadiñî, Bêwar: Çîrcîrokên Gelêrî, Weşanên JJ'yê, Amed, 2011.
- Gezgîn, Mesûd: "Comerd û Nemerid", Folklorî Kurdan, Hejmar 2, Amed, 2015.
- Kabaklı, Ahmet: Türk Edebiyatı I, Weşanên Türk Edebiyatı Vakfı, çapa donzemîn, Stenbol, 2004.
- Omerî, Bro: Carekê Ji Caran, Weşanên Avesta'yê, Stenbol, 2013.
- Sadîñî, M. Xalid: Çîrokên Gelêrî, Weşanên Nûbiharê, çapa duyem, Stenbol, 2013.
- Sebrî, Osman: "Gurê Pîr", Ronahî, Hejmar 12, Şam, 1943.
- Torî, Nasîrê: "Dîk û Axa", Folklorî Kurdan, Hejmar 1, Amed, 2015.
- Torî, Nasîrê: "Roviyê Çiyê û Roviyê Çolê", Folklorî Kurdan, Hejmar 2, Amed, 2015.
- Yaxmûr, Evîn: "Tûtîk û Rovî", Folklorî Kurdan, Hejmar 2, Amed, 2015.
- Xamû, Zinarê: Hebû Tune Bû-Antolojiya Çîrokên Zarokan, Weşanên Rûpel'ê, Stenbol, 2014.

[31] Evîn Yaxmûr, "Tûtîk û Rovî", Folklorî Kurdan, Hejmar 2, Amed, 2015, rûpel 86.

[32] Zinarê Xamû, Hebû Tune Bû-Antolojiya Çîrokên Zarokan. Dîk û Rovî, Weşanên Rûpel'ê, Stenbol, 2014, rûpel 268.

[33] Bêwar Diyadiñî, Çîrcîrokên Gelêrî. Beşa Duyemîn Fabil. Rovî û Kew, Weşanên JJ'yê, Amed, 2011, rûpel 78.



PIXÇO

Hebû carek ji caran, xêr û xweşî bibare, li ser hazir û guhdaran tevî derî û cîranan, ji xeynî dêwên keleman.

Li welatekî dûr, mêrikekî bi navê Cemîl hebû. Cemîl û xwişka xwe bi hev re dijiyan. Her sibehan, Cemîl diçû nêçîrê, nêçîra xwe dianî, xwişka wî jî diçû pincar dicivand dianî û bi pincar û goştên nêçîrê, gellek xwarinên xweşik dipêht û bi hev re dixwarin.

Wan bi hev re jiyaneke hevpar û bi aram derbas dikirin. Rojek ji rojan û wekî her rojan, Cemîl rê dikeve ku biçê nêçîrê, lê dinêre, li ser rêya wî, dêwekî mezin razaye. Xwe bi xwe dibêje: "Divê ez vî dêwî bikujim, ger ku ez vî neku-jim, piştî çend rojan ew ê bibe belayê serê min." Digire satora xwe, dikeve ser, lê dixê, lê dixê, wî di nav xwînê de diwerîne, qeneat, tîne ku miriyê, di cih de dihêle û diçe.

Piştî çûyîna Cemîl, xwişka wî jî ji bo pincar civandinê, di ser wê rêyê re derbas dibe, dibîne, ku dêwekî birîndar û nîvmirî, li ser rêya wê ye. Gunehê wê pê tê, diçe hinek, pincarên ku birînan qenc dikin dicivîne, dikute û datîne li ser birînen wî. Di demeke kurt de, dêw piçekî tê li ser hişê xwe, keçik, wî hêdî hêdî dibe cihekî ewle, radizîne û vedigere diçe.

Dotira rojê, piştîçûyîna Cemîl, ew dîsa diçe li bal dêwî, birînen wî melhem dike, xwarin û vexwarin didê û nêzîkê

hatina Cemîl tê mala xwe. Ji tirsan, ji Cemîl re qet qala dêwî nake.

Keçik rojên xwe tim bi dêwî re derbas dike. Divê navberê de, herdu dibin evîndarên hev... Bi vî awayî roj û meh di ser re derbas dibin, keçik hew pê dihese ku bizaro ye. Zikê wê roj bi roj mezin dibe, Cemîl jê haydar dibe, ku xwişka wî bizaro maye, pir diqehire û ji xwişka xwe re dibêje:

-Zû, ji min re bêje, bavê vî zarokî kî ye? Ez ê aniha biçim wî bikujim.

Xwişka wî dibêje:

-Keko, ji vir, heft, heşt meh berê, rojekê min li deştê pincar dicivand, dêwekî mezin rastî min hat û erîşî min kir. Min çawan kir pê nekarî, xwe ji nav lepên wî xelas bikim. Çi bû wê demê bû.

Cemîl dibêje:

-Te bo çî ji min re negot?

Xwişka wî dibêje:

-Ez pir tirsibûm, ji ber wê min ji te re negot.

Cemîl jî gotinên xwişka xwe bawer dike û dibêje:

-Rast e, heft meh berê, min dêwek kuştibû. Dibe ku ew be. Ger ku ew be, tişteki ku em bikin nemaye, jixwe ew miriyê.

Neh meh û neh rojên keçikê diqede, kurek jê re çêdibe. Îcar kurekî çawan! Kurekî tevda bipirç. Ji ber şikil û şemalê wî navê wî datînin "Pixço".

Her sibeh, piştî çûyîna Cemîl, dêw tê li bal wan, roja xwe bi hev re, xweş û geş derbas dikin, heya êvarê... Nêzîkî hatina Cemîl, dêw diçe xwe li cihekî vedişêre û dotira rojê dîsa tê li bal wan.

Her weha, sal û zeman di ser re derbas dibin. Pixço dibe neh deh salî, lê dayika wî ji jiyana xwe qet nerazî ye. Rojekê ji dêwî re dibêje:

-Êdî bes e. Heya kengî, em ê weha bijîn. Cemîl bizanibe ku tu dijî teqez, ew ê te bikuje, hêj ku wî tu nekuştîyî, divê tu wî bikujî, ji vir şûn de ez dixwazim bi te re jiyaneke azad û bextewar bijîm.

Dêw dibêje:

-Ka bêje ez çawan wî bikujim û em jê xelas bibin.

Jinik naxweze li ber Pixço bibêje ji Pixço re dibêje:

-Pixço, here devê çem ji me re piyekî avê bîne.

Pixço dizane, ku wê ew dek û dolaban li serê xalê wî yê Cemîl bigerin. Ew diçe xwe li pišta dîwarê vedişêre û guhdariya wan dike. Dayika wî ji dêwî re dibêje:

-Îro dana êvarê, tu xwe bixe şiklê dûpişkekê û xwe li ser serderê veşêre, Gava Cemîl ji nêçîrê tê dikeve hundir, xwe biavêje li ser pišta stûyê wî û jehra xwe berde bedena wî, bila bimre, em jê xelas bibin.

Pixço, gotinên wan tev dibihîze. Diçe piyek avê diîne û diçe li ber dêrî dimîne li benda xalê xwe. Gava ku xalê wî ji nêçîrê tê ji xalê xwe re, dibêje:

-Xalo, xalo ez qurbana te bibim, min dayne li ser pišta stûyê xwe, dûre bikeve hûndir.

Ji ber ku kurê dêwî bû, xalê wî qet jê hez nedikir. Jê re dibêje:

-Here biqêşe, ji xwe ez ji te hez nakim. Îcar, te daynim li ser pišta stûyê xwe? Bixehime here û ji min dûr bikeve.

Wekî jeyîyê bi xalê ve dizeliqê, xal çawan dike, nikare xwe jê xelas bike, bê gav dimîne û wî datîne li ser pišta stûyê xwe û dikeve hundir. Gava digihêjin li ber serderê, dûpişk serê xwe derdixe ku Cemîl bigeze, dibîne, ku Pixço kulma xwe radike û jê re dibêje:

-Here, dûpişka heram. Welle min nehîst tu xalê min bigezi!

Dûpişk zû bi zû serê xwe dikişîne. Dotira rojê piştî çûyîna Cemîl ew dîsa tên li bal hev û Pixço dişînin avê. Pixço diçe xwe pišta derî vedişêre û guhê xwe dide wan. Dayika

wî ji bavê wî re dibêje:

-Te çima ew gez nekir.

Bav dibêje:

-Pixço nehîst. Ew çûbû, li ser pišta stûyê wî rûniştibû û kulma xwe rakir, ku li min bixe, ez reviyam.

Jinik dibêje:

-Îşev, xwe bixe şiklê pezpezûkekê û bikeve binê şîpanekê ve, gava ew hat, pêlavê xwe ji lingê xwe derxist, lingê wî bigeze.

Pixço dîsa gotinên wan tev dibihîze. Diçe piyekî avê diîne datîne mal û diçe li ber derî, dimîne li hêviya xalê xwe. Gava xalê wî tê ji xalê xwe re dibêje:

-Xalo, ez hêvî ji te dikim, îşev jî tu were li ser pišta stûyê min siwar bibe.

Bêhna xalê wî teng dibe û dibêje:

-Biqêşe here ji min dûr bikeve ev çi ye? Rojekê tu dibêjî: "Min dayne li ser pišta stûyê xwe. Rojekê dibêjî, tu were li ser pišta stûyê min". Te aqlê xwe xwariye lo.

Xalê wî çawan dike nikare, xwe jê xelas bike, li ser pišta stûyê wî siwar dibe. Gava digihêjin li ber şîpanekê, pezpezûk serê xwe derdixe, ku lingê Cemîl bigeze. Pixço pehîna xwe radike û dibêje:

-Here, pezpezûkê pîs, ez ê aniha bi pehniya xwe serê te bipelizînim.



Pezpezûk hêdî serê xwe hildikişê bi bin şîpanekê ve. Dotira rojê dîsa dayika Pixço û bavê wî tîn li bal hev û dîsa Pixço dişînin avê. Pixço diçe xwe li piştê dêrî vedîşêre û guhdariya wan dike.

Dayik ji bavî re dibêje:

-Te, îşev çima ew negezt?

Dêw dibêje:

-Qet pirs neke, ev car Pixço ew danîbû li ser guntilîka xwe û pehniya xwe rakir, ku min bipelizîne, ez zor jê xelas bûm.

Jinik dibêje:

-Teqez divê tu îro wî bikujî. Gava ku ew diçe nêçîrê, ew her tim diçe li ser ferşa, li ber kaniyê nimêj dike. Sibê hêj ku ew neçûye li ser kanî, tu xwe bixe şiklê marekî û bikeve binê ferşê, gava ku ew dest bi nimêjê dike, tu pê vede bigeze.

Pixço, gotinên wan dibihîze. Dotira rojê hêj ku şeveq neavêtiye radibe diçe li ber dêrî û dimîne hêviya xalê xwe. Cemîl ji mal derdikeve ku biçê, dinêre ku Pixço li benda wî ye. Dibêje:

-Kuro te xêr e, vê şeveqê tu rabûyî?

Pixço dibêje:

-Xalo ez qurbanî te bibim, min jî bi xwe re bibê nêçîrê. Li vir pir bêhna min teng dibe.

Cemîl dizane ku ew çawan jî bike wê Pixço pê re biçê, bê deng dimîne. Pixço şa dibe fincîkek davêje û di

keve li pê xalê xwe. Gava digihêjin ser çiyê Pixço dibêje:


-Xalo, ez pir tî bûme, kaniya ku tu diçî li wir nimêj dikî li ku derê ye? Ez ê herim, hinek avê vexwim û bimînim hêviya te.

Xal cihê kaniyê jê re salix dide. Pixço diçe li ser ferşê rûdine û dimîne benda xalê xwe. Dî dema nimêja nîvro de, Cemîl tê li ser kaniyê desmêja xwe digire, dike ku biçê ser ferşê nimêj bike. Pixço dike qîrîn û bi dengê tirs dibêje:

-Xalo, min dît marekî mezin çû ket binê vê ferşê!

Cemîl satora xwe digire, ferşê radike dibîne, ku marekî reş li wir e. Mar dide ber satorê, pirtî û parî dike. Dana êvarê Pixço û xalê xwe vedigerin diçin mala xwe. Pixço ji dayika xwe re bi heyecan dibêje:

-Dayê, îro marekî reş ketibû binê ferşa ku xalê min li ser nimêj dikir. Xalê min ew mar da ber satoran û kuşt.



Dayika wî, gava wan gotinan dibihîze, pir xem dike. Lê li xwe danayne. Di dilê xwe de dibêje:

-Welle ez vê ji xalê te re nahêlim, ez ê ji xalê te bikujim, çawan ku wî mirazê min hîşt di nav çavên min de. Ez ê ji nehêlim ew bi mirazê xwe şa bibe.

Dotira rojê Cemîl diçe nêçîrê. Dayika Pixço heya êvarê digrî û dilorîne. Danê êvarê ji bo şivê savar dipêje, sê tefsî amade dike. Jehrê dixê di nav tefsîyekê de û dimîne li benda Cemîl. Pixço dibîne ku dayika wî jehrê dixê di tefsîyê de, xwe bêdeng datîne. Danê êvarê Cemîl tê mal dest û rûyê xwe dişo û li ser sifrê rûdine. Xwişka wî, wê tefsîya bijehr datîne li ber wî. Pixço bi dengê bitirs dibêje:

-Dayê, ha dêwek li ber pencereyê ye!

Dayika wî, li pencerê dinêre. Di wê navberê de Pixço tefsîya li ber xalê xwe, datîne li ber dayika xwe û ya li ber dayika xwe, datîne li ber xalê xwe. Xalê wî, dibîne ku Pixço tefsîyan diguherîne, lê nizane ji bo çi, wî ew wisan kiriye. Dest bi xwarina xwe dikin piştê du sê kevçîyan dayika wî, dikeve erdê û dimire. Cemîl şaş dimîne dibêje:

-Kuro Pixço, te xwişka min kuşt..!

Destê xwe radike ku lê bixe, Pixço destê xwe dide ber xwe û dibêje:

-Xalo, ez nebûma, vê gavê tu di şûna dayika min de mirî bûyî. Va ye ev çend car in, ku ez te ji mirinê xelas dikim.

Ji serî heya dawî, dayika wî û bavê wî, çawan xwestine, ku wî bikûjin û her caran çawan, wî ew çawan ji mirinê xelas kiriye, yek û yek jê re dibêje. Cemîl ji ber kirina xwişka xwe pir xem dike. Li piştê xanî xwişka xwe çal dike û ji Pixço re dibêje:

-Êdî ez û tu heya mirinê, em ê bi hevdu re bijîn. Piştî van bûyeran, ez naxwazim li vir bijim, were em ji vir herin cihekî din jiyana xwe bidomînin.

Xal û xwarzî tûrikên xwe davêjin li ser milên xwe û bi rê dikevin diçin. Kêm diçin zêde diçin, rastî gundekî tîn. Cemîl diçe mala axayê gund, daxwaza kargerîyê dike. Dibêje:

-Hema çi kar hebe ez dikarim bikim.

Axa dibêje:

-Kar heye lê belê, sê şertên min hene. Ku tu qebûl bikî were dest bi kar bike!

Cemîl dibêje:

-Baş e, min qebûl e, dê bibêje ka şertên te çi ne?

Axa dibêje:

-Ya yekemîn, tu yê bidî dû tajiye min, ew li ku bisekine divê tu li wir cot bikî. Ya duyemîn, divê tu sed gurz darên bêçirt bicivîni û bîni. Ya sêyemîn, divê tu dewaran tev, di kuleka tewlê re derbas bikî, bibî ser avê, avê bidiyê û dîsa di kulekê re derbas bikî, bibî tewlê. Ger ku te ev şert pêk anîn, tu yê bibî xweyiyê karekî, lê ku te nekarî û tu poşman bibî, ez ê çermê li ser piştê te bigurînim bînim xwarê.

Cemîl gellek ji xwe bawer, şertên wî qebûl dike. Axa dibêje:

-Baş e, sibê were dest pê bike.

Cemîl sibê zû radibe diçe mala axê, axa tajiya xwe berdide, Cemîl dide dû taji. Taji dibeze diçe, diçe li ser tehtekî asê rûdine. Cemîl, bi zor û bela diçe jor wî digire diîne, hêj nagihije jêr. Taji dîsa dibeze diçe li ser tehtê rûdine, Rewşa wan bi vî awayî heya êvarê didome. Danê êvarê bê hal dimîne. Piştê stûyê xwe dixurîne û berê xwe dide mala axê. Ji axê re dibêje:

-Axa, welle min nekarî şertê te, bînim cih. Ez poşman im. Tu çi dikî bike.

Axa, digire satoreke tûj û dikeve li ser çermê piştê wî, jê dike û dilopikîne(dişiqitîne) heya xwarê diîne. Cemîl di nav xwînê de wer dibe. Hêdî hêdî dimeşe diçe cihê Pixço lê ye. Pixço gava xalê xwe di vê rewşê de dibîne pir diqehire. Dibêje:

-Xalo, kê ev xerabî li te kir? Zû bêje!

Xalo jê re dibêje, ku axa û tajiye xwe çi anîne serê wî. Pixço hema dide xwe radibe û dibêje:

-Xalo tu qet xem neke, ez ê herim heyfa te hildim. Ez vê nahêlim li bal axê.

Û radibe diçe li bal axê ji axê re dibêje:

-Ez wî karî te dabû xalê min dixwazim û ez ê bikarim şertên te binim cih.

Axa pê dikene û dibêje:

-Hey mala minê, xalê te yê qerese nekarî, şertekî min pêk bîne, tu yê bi vê bejnê ve çawan bikarî pêk bîni?

Pixço dibêje:

-Axayê min, tu şertên xwe ji min re bêje. Ger ku min nekarî tu ya xwe bike.

Axa bi awayekî tinazî jê re şertên xwe dibêje. Pixço ji axê re dibêje:

-Axayê min ez ê şertên te tev bînim cih, lê belê şertekî min jî heye!

Axa dibêje:

-Bêje ka şertê te çi ye?

Pixço dibêje:

-Şertê min ew eku tu poşman nebî, ger ku tu poşman bibî, ez ê jî çermê pişta te bigurînim.

Axa bi awayekî ji xwe bawer dibêje:

-Baş e, min qebûl e.

Pixço, sibê zû diçe mala axê, axa tajî berdide, tajî banz dide diçe, Pixço dide dû. Tajî diçe, diçe li ser tehtekî bilind û asê disekine. Pixço bang dikê, lê nayê. Diçe wî digire tîne xwarê, hew dibîne ku dîsa dibeze diçe li ser tehtë rûdine.

Pixço hêrs dibe kevirekî digire destê xwe diavêje, kevîr diçe li nav mejiyê tajî dikeve. Tajî jî jor digindire tê xwarê.

Ew dera tajî dikeve û dimire, Pixço wê derê cot dike heya êvarê. Danê êvarê cotê xwe hildide diçe mala Axê. Axa dibîne ku Pixço hatiye, dibêje:

-Pixço te çi kir?

Pixço dibêje:

-Min, heya êvarê cot kir.

Axa dibêje :

-Pixço ka tajî li ku maye? Ew çima bi te re nehatiye?

Pixço dibêje:

-Axayê min, gava em çûn ew revî çû li ser tehtekî mezin sekinî, min çawan kir ew nehat, min jî kevirekî biçûk avêt ku bitirse bê jêr, kevîr çû li serê wî ket, ew mir gindirî heya jêr hat. Min jî ew der cot kir heya êvarê û ez vege-riyam hatim.

Axa li çokên xwe dixê bi dilekî sotî dibêje:

-Kuro Pixço, te çima kuşt, ew diyariya paşayê Wanê bû.

Pixço hema zû bi zû dibêje:

-Axa, tu poşman bûyî?

Axa bi tirs dibêje:

-Na na, ez ne poşman im.

Axa pir xem dike lê li xwe danane. Beriya ku Pixço biçê razê, axa jê re dibêje:

-Em ê sibê herin li zozanan tu li karê xwe binêre.

Pixço diçe ji xwe re radizê heya sibê. Gava şiyar dibe dibîne ku axa bi malbata xwe ve çûne. Ew jî dasekê digire destê xwe çiqas derî û terxîçekan û sêncên mala axa tev hûr û hûr dike, dide ser hev û sed gurz dar jê çêdike, da-tîne li ber dêrî û dimîne li benda axê.

Danê êvarê axa ji zozanan vedigere tê dibîne ku Pixço sed gurz darê bêçîrt daniye li ser hev û maye hêviya wî. Li çîrtan digere û nagere biçekî çîrt bi daran ve nabîne bi matmayî li Pixço dinêre û dibêje:

-Kuro Pixço, bi rastî jî qet çîrt bi van daran ve tune ye, ka bêje te ev darên han ji ku ku derê peyda kiriye?

Pixço dibêje:

-Welle hema li van daran.

Gava ku axa dikeve hewşa mala xwe çi bibîne! Di mala wî de ne derî mane û ne terxîçek. Bi dengê bilind dibêje:

-Kuro Pixço, ev te çi li mala min kiriye? Te mala min xera kiriye.

Pixço ji xwe pir bawer dibêje:

-Axayê min, wellê min tenê li vir darên bêçîrt dîtin. Ma tu poşman bûyî?

Axa bi dilkulî dibêje:

-Na na, ez ne poşman im. Ez çima poşman bibim?

Wê şevê, dîsa Pixço diçe ji xwe re bi dilekî xweş radizê heya sibê. Sibê zû radibe ku şertê sêyemîn pêk bîne. Satorêke mezin digire destê xwe û diçe tewla dewaran. Serê dewaran yek û yek jê dike û di kuleka tewlê re derbasî derve dike, dibe ser avê, li avê dixê û dîsa wan seriyên di kulekê re derbasî hundirê tewlê dike. Gava ku hemûyan xelas dike, diçe ji axê re dibêje:

-Axa, va ye min, hersê şertên te jî pêk anîn.

Axa diçe tewlê, dibîne ku yek dewarê wî sax nemaye. Li çokên xwe dixê digrî dibêje:

-Kuro Pixço te çi kiriye? Te hemû dewarên min ser jê kirine!

Pixço dibêje:

-Axayê min, min çawan kir ew di kulekê re derbas nebûn, ancax bi vî awayî derbas bûn. Ma tu poşman bûyî?

Axa dibêje:

-Na na, ez ne poşman im.

Axa ji tirsan, giriyana xwe jî dibire û bi xembarî, satorêke mezin digire destê xwe û goştê wan dewarên serjêkirî jê dike, qet û qet dike dixê nav denan. Paşê ranekî dide Pixço û dibêje:

-Pixço, ha ji te re ev ranê han bibe bide keça min a li mêran.

Pixço ranî dibe, goştê li ser ranî tev radike û hestiyê rût

dibe, dide keçikê. Keçik gava hestiyê rût dibîne pir diqehire û dibêje:

-Bavê min, ewqas goştinî kir[ji xwe re goşt da hev], dilneda ji min re, du parî goşt bişîne, ez vî hestiyê rût naxwazim, paş ve bibe, bide bavê min.

Pixço digire hestiyê vedigere tê li bal axê û dibêje:

-Axayê min, keça te got: "Bavê min çiqas tamatî kiriye ev piçika goştê ji min re şandiye, ez naxwazim, paş ve bibe, bide bavê min."

Axa pir hêrs dibe û dibêje.

-Kuro, te deng nekir? Hema te ev ran, li nav mejiyê wê bixista. Ew şerm û heya nake wisan dibêje?

Pixço digire hestiyê û paşve vedigere diçe mala keçikê, çiqas hêza wî heye, hestiyê radike li nav mejiyê keçikê dixê. Keçik dikeve erdê û dimire. Pixço paşve vedigere diçe li bal axê.

Axa dibêje:

-Pixço, tu bi ku de çûbûyî?

Pixço dibêje:

-Axayê min, te ji min re got: "Te çima ranek li serê keça min nexist." Ez jî çûm min ranek li nav mejiyê wê xist û ez hatim.

Axa dike hewar û dibêje:

Kuro Pixço te keça min jî kuşt? Te çi anî serê min!

Pixço dibêje:

-Axa yê min, te ji min re got, min jî gotina te anî cih. Ma tu poşman bûyî?

Axa dibêje:

-Na na, ez ne poşman im.

Bî qasî çend mehan weha bi hev re diborînin. Şevê keça axê ya biçûk dixwaze biçê derve li ser destavê, lê bi tena serê xwe ditirse biçê, dixwaze bavê wê jî pê re here. Lê bavê wê naxweze, rehetiya xera bike ji ber wê yekê ji Pixço re dibêje:

-Pixço ka vê keçê bibe ser destavê.

Pixço digire destê keçikê dibe derve, her çiqas keçik rûdine, Pixço derziyekî dixê rûniştina wê re, keçik dike hewar, gazî bavê xwe dike. Pixço wê aş dike, keçik dîsa rûdine pixço dîsa derziyekî lê dixê, keçik dîsa dike hewar, axa hêrs dibe û dibêje:

-Kuro Pixço, ew keç çima dike hewar?

Pixço dibêje:

-Welle ez jî nizanîm ji bo çi dike hewar.

Axa hêrs dibe û dibêje:

-Kuro keviyekî biavêje li mejiyê wê bixe.

Pixço li derdora xwe digere keviyekî dibîne, digire û diavêje serê keçikê, keçik di cih de dimîne. Pixço her wekî ku tiştek nebûye diçe hundir li bal axê rûdine. Axa dibêje:

-Kuro, ka keça min, ew ma li ku derê?

Pixço dibêje:

-Ez bawer dikim mir. Te ji min regot: "Kevirekî li nav serê wê bixe." min jî gotina te kir.

Axa dîsa dike hewar. Digrî û dinale dibêje:

-Kuro, te ji min re ne mal hişt, ne zarok. Ev tu çi naletok î, tu bûyî belayê serê min.

Pixço dibêje:

-Axa, tu poşman î?

Axa ji tirsê çermê piştê xwe dibêje:

-Na na, ez ne poşman im.

Wê şevê heya sibê axa difikire ka wê çawan xwe ji Pixço xelas bike. Destê sibê biryarekê dide, jina xwe ji xew radike û dibêje:

-Jinik, hîna Pixço çermê piştê min jê nekiriye, were em ji vî gundî derkevin biçin. Tu îro ji me re hinek kade û nanê rûnî bipêje, em şeveqa sibê, hêj ku Pixço ji xew ranebûye biçin.

Pixço di nav nivîna xwe de, gotinên wan tev dibihîze lê qet dengê xwe nake. Jina axê şeveqê radibe, testek hevîr dike, tenûrê vêdixê, yek piştî kade û nanê rûnî dipêje. Wan nan û kadeyan dixê nav tûrekî û datîne li piştê derî, dûre ew û axa diçin radizên.

Pixço dimîne li benda wan heya ku ew dikevin xewê, gava ku bawerî diîne axa û jina xwe di nav xewê de ne. Hêdîka diçe wan nan û kadeyan ji tûrikî derdixê û bi xwe diçe di nav tûrî de rûdine heya sibê.

Şeveqa sibê axa û jina xwe radibin, axa tûrê kadeyan diavêje li ser piştê xwe, bê deng ji mala xwe derdikevin diçin. Diçin digihîjin binê gund, mîza Pixço, tê, ew jî hema bi xwe ve berdide, ava germ di piştê axê de diherike diçe. Axa ji jina xwe re dibêje:

-Keçê, çawan ku aveke germ di piştê min re diherike tê xwarê.

Jinik dibêje:

-Min, pir rûn xistibû nav kadeyan, ew rûnê kadeyan e dihele..

Axa bawer dike û rêya xwe didomînin. Kêm diçin zêde

diçin, nêzîkî gundekî dibin. Seyên wî gundî tev, dora wan digirin û diçin wan. Axa hêdî tûre pišta xwe datîne erdê û bê hemdê xwe dibêje:

-Ax ax! Xwezî niha Pixço li vir bûya. Wê ev sey tev bidana ber keviran û ji me dûr bikira.

Gava ku Pixço gotinên Axê dibihîze, hema bi lez ji tûrî derdikeve û dibêje:

-Axayê min va ye ez li vir im.

Pixço hema bi lez keviran ji erdê digire û diavêje seyan, her keviyekî ku diavêje li mejiyê seyekî dikeve. Se tev ji tîrsa wî direvin diçin û ji wan dûr dikevin.

Pixço, axa û jina axê didin dû hev, diçin. Axa di dilê xwe de dibêje: "Heya ku Pixço çermê li ser pišta min negurîne dev ji min bernade." Hem dimeşe û hem difikire, ka wê çawan bikaribe ji Pixço xelas bibe. Çawan ku rêyek ditibe pê kêfxweş dibe. Û dimîne hêviya şevê, şev di ser wan de tê, çav çawan nabîne hersê jî ji xwe re radizên. Pixço ji derew de xwe bi xew datîne, axa bawerî tîne ku Pixço di xew de ye, hêdîka di guhê jina xwe de dibêje:

-Jinik, gava ku Pixço dikeve di xewa giran de, ez ê lingê te bihejînim; tu rabe, ez ê her du lingên wî bigirim, tu jî her du destên wî bigire û em wî bavêjin nav wî çemî.

Jina wî dibêje:

-Baş e.

Herdu jî dikevin nav nivînên xwe radizên, Pixço gotinên wan bihîstine. Dimîne hêviya, heya jinik bikeve xewê.

Pîştî ku jinik dikeve xewê, ew hêdîka ve diçe jinikê dehf dide, dehf dide dixê nav nivîna xwe û bi xwe jî diçe nav nivîna jinikê radizê û dikeve xewê. Derengê şevê axa tê digire lingê wî dihejîne dibêje:

-De rabe.

Pixço radibe, bi hev re diçin, Pixço çîpên wê digire û axa jî lingên wê digire, dibin diavêjin nav çemî. Dûre vedigerin tîna di nav nivînên xwe de radizên, heya dibe sibe...

Destê sibê axa bi dileki şa bi xwe dihesê û diçe ku şa-bûna xwe bi jina xwe re parve bike. Bang dikê, dibîne ku Pixço bersiva wî dide. Şaş û matmayî lê dinêre. Rûdine li erdê û bi çîgereke şewîtî dibêje:

-Kuro Pixçoo... Te mala min xera kir, dawiya dawî te jina min jî bi min da kuştin? Ez poşman im, ez poşman im! De were, were çermê pišta min jê bike, ku ez û tu ji hev xelas bibin.

Pixço digire satorê dikeve li ser çermê pišta wî tev digurîne heya xwarê tîne, çermê wî dixê nav tûrekî, tûrî dide pišta xwe û diçe. Diçe li bal xalê xwe, çermê axê dide nîşanî wî û dibêje:

-Xalo va ye min heyfa te hilda. Were ji xwe re li ser mal û milkên axa rûne.

Xalê wî li ser milkên axa rûdine û dibe axayê wî gundî. Xal û xwarzî bi hev re jiyaneke xweş diborînin.

Çîroka min çû diyaran, rehet li dê û bavê guhdaran, bi tevî sêwî û bêmalan...

Amadekar: Yasemîn ERBAN

Çavkanî: Evdila ADAR

Herêm: Çorsê / Tetwan / Bilîs

Sal: 1995



ÇI DI HÛR DE, ÇI DI TÛR DE...

Amadekar:
Feratê DENGIZÎ
Herêm:
Dengiz/Stewr/Mêrdîn



Li gund feqîr, xizan pîrr bûn. Dengiza, garana feqîran... Ji ber ku gund bejik bû, zêde kar tune bû, milk jî... Si-neeta gund hostetiya kevîran bû; hosteyên lêkirina xaniyan, hosteyên çalan... Illim jî hostetiya çalan. Yanî nanê xwe ji kevîr derdixistin, ji tehtan nan derdixistin... Şewk û horsê wan, hacetên wan ê hunerê bû jî...

Jixwe navê gund jî ji vir dihat, bi divêtiyeke mezin... Bi dorê: Bêrm; çalên nîwxwezayî, berqefên wan hinekî fireh dikirin. Çal; bi hostetiyeke zaneyî çêdikirin, di tehtan de. Ji jor, kilorek teng û her ku diçû fireh dibû. Di tehtê de zivranokek hunerî. Sê gaz, çar gaz... Sarîc-Sarinc; Bi derî û cercik, di tehtê de mîna malekê dihat çêkirin. Mezina çalan Hezaz bû, mezina Sarîcan jî Dengiz; ava pîrr hiltanî, ya baranê... Di dengizê de deng 'zîz' dibû, deng 'diza', ango cihê ku tê de 'deng dizê', deng dixuliqe. Deng-dizê; dengiz, dengiza... Bêrm, çal, saric, dengiz; tevan bi seleba xwe ava baranê, didan ser hev. Wekî din av tune bû li vî warî. Avên tev kurm û kevz. Bejî, bejayî, bejikî ev bû; lê avên çalên paqij û rind jî ne kêmbûn.

Em serê we neêşînin.

Kolana şikeftan, ji bo niqarê û kevîrbirri jî mîna hostetiya çalan. Kevîr, ji bo lêkirina xaniyan hêmana esasî bû, lê kevîrbirri wek ku karê betalan be, ên ku bê kar bin, ji xwe re kevîr dibirrin û bi hezaran difirotin. Em bibêjin hezarê kevîran bi hezar wereqî; lê buhayê qornîyan (Kevîrê herî xweşikû mezin ê qozîyan) hê bêhtir. Qornî bi heba dihatin firotin. Em bibêjin heba qornîyan bi du wereqan...

Sofî Rizwan jî xizaneke gund. Nav li ser e, Sofî... Zêde girêdayî olê, lê girêdayiyeke bi mirîdî, ji dilê saf. Meselêyan kûr ên dînê, ne îşê wî ne. Xizmeta meleyan, camiyê û Mala Şêx belaş dîke. Pîrr alîkarê Mala Şêx e, lê mixabin ne şêx ne jî mele tu alîkariyê pê re nakin. Ji feqîrî teq-teq ji qirika wî û malbata wî tê. Carinan bi çil rojan wînda dibû, diket xezîmê, xewle dibû. Xwe bê nan û av dihişt û

îbadet dikir, li cihekî veşartî ku kes wî nebîne. Bi çend hê-jîrên hişk îdare dikir ku bibe welî. Rebena hevsera wî, Sedîqe, diket xema wî. Bêçare. Cîranan alîkarî pê re dikir, lê ne welîti jê re bi kar dihat û ne jî halê wan xweş dibû.

Neçar, Sofî Rizwan berê xwe dida şikandina kevîran, dê kevîr bişikandana ji bo firotinê, dê kevîr bibirriyana... Dest bi kevîrbirriyê dikir. Divêt ku zêde kar bikira ku nanê rojên valabihurî jî biderana. Berî kewtê hevalan, ji tarî ve diçû kar û di tariya êvarê de jî vedigeriya malê. Ji hevalên xwe gişkan bêtir kevîr dişikand. Wextê ku diçûn kar, xwarina xwe ya rojê, ya sê danan, Xwedê çi qismet kiribûna; nan û mast an jî nan û dims, carinan jî nanê tisî bi xwe re dibirin. Xwarina xwe dixistin tûrikê xwe, tavêtin ser milê xwe, radihiştin hors û bivîrên xwe û bi rê diketin. Taştêya xwe bi hev re dixwarin. Ango yên ku eynî kar dikirin, kevîr dişikandin, bi hev re diçûn. Aliyê hev dikirin. Sofî jî tev li wan dibû, lê ne her tim.


Rojekê kevîrbirri gişt, Sofî Rizwan jî tev li wan, diherin guherekê, navê wê Warê Ewland, li wira karê xwe dikin. Wexta ku roj hebikî bilind dibe, dema taştê ye. Bêhna xwe vedidin û nanê xwe derdixin ku taştê bixwin. Gazî Sofî jî dikin, lê karê Sofî zêde û ecele ye. Nikare demê, zêde bide xwarinê. Karker tev îsrar dikin. Neçar ew jî tev li wan dibe. Her kes nanê xwe dike sê beşan û dest bi xwarina beşekê dîke. Herdu beşên dinê ji nivro jî firavîne re û nanê esir re hiltînin. Bala xwe didinê ku Sofî nanê xwe tev daniye ber xwe. Giştikan bi carekê de dixwe. Tûrê xwe vala dîke...

Karkerek nikare xwe, dibêje:

-Apê Sofî. Te nan ji firavîn û esirê re hiltneanî. Ma tu yê birçî nebî?

Sofî qet xwe naêşîne. Devliken dibêje:

-Tiştêk nabe. Çi di tûr de çi di hûr de..! Jixwe ez wî hildigirim...



Arêkerdoxe:
Sedef KANDEMİR
Çîme:
Tehsîn SEWREGIJ
Serrê Aye: 67
Herêm: Sewregi / Riha

HÎRÎ BIRAYÎ Û PADÎŞAH

Jew est o jew çin o. Cayê de jew xoca beno. Jew zî ciniya ci bena. Xoca serra de jew roc şino keye. Serrêk ravêrena jew lacê ci beno. Xoca rê xeber rişenê vanê:

Nameyê ci çi bo?

Xoca vano:

Nameyê ci Mehemed bo.

Banê xocayî cayê de yo la xoca başqe cayê de gureyeno. Serrêk ravêreno jew lacê ci zî beno. Xeber rişenê vanê:

Jew lacê to daha bi. Nameyê ci çi bo?

Xoca vano:

Nameyê ey zî Mehemed bo.

Xoca rocêk şino keye û vînenê kênê no keyeyî de başqa mêrdek est o. Xoca çiyê nêvano û pêyser şino. Serrêk daha ravêrena vanê:

Xoca to rê jew lac daha bi. Nameyê ci çi bo?

Xoca vano:

Nameyê ey zî Mehemed bo.

Nameyê hîrê qeçê ci zî Mehemed beno. Xoca mireno. Vasîyetê de vano; 'mîrasê min di Mehemedî rê est o jewî rê çin o.' Wunî vano û mireno.

Qeçî kewnê pê. Jew vano mîras min rê est o. Jew vano; 'min rê est o.' Vanê; 'ma şirê no gure padîşah ra pers kerê.' Kewnê ray û şinê. Yew Mehemed vano; 'no ray ra jew deve şîyo.' O bîn zî vano; 'deve ser ro kişti ra hingimên kişti ra zî rib est o.' O bîn zî vano; 'jew çimê deveyî kor o.' Nê birarî pêro vano; 'ti kotî ra zanî no deve yo?' O bira vano; 'cayê kê ray ra şîyo lingande ci ra min fem kerd.' Vano; 'ti kotî ra zanî çimênde ci kor o?' O bira vano; 'ray de vaş est bi. Deveyî kişti ra werdo kişti ra zî nê-

werdo, min oca ra fem kerd kê çimên de ci kor o.' O bîn zî vano; 'ti kotî ra zano kiştênde ci rib kiştênde ci hingimên est o?' O zî vano; 'kê kiştê ray de mojleyî kiştê ray de zî hingî estbî, vano min zî oca ra fem kerd.' Nê ray ra şinê jew mêrdek vînenê. Mêrdek vano; 'deveyê min vîndîbî, şima dî? Jew bira vano; 'çimênde deveyî jew kor bi?' Mêrdek vano; 'e.' O bîn vano; 'kiştênde ci rib estbi kiştênde ci zî hingimên estbi?' Mêrdek vano; 'e.' Ê vanê; 'şo ma deveyê to nêdîyo.' Ê birarî vanê; 'ma şinê padîşahî het, vazenî ti zî bê.' Ê şinê padîşahî het. Padîşah xizmetkarê xo rê vano; 'şo jew manga cike û nînan rê şamî bike.' Xizmetkar şino qawirme ano. Padîşah qapî dima nê birarî dîne keno. Jew bira vano; 'kê la min rê kê no Padîşah goştê manga ma rê nêdayo. No goştê kutiko yo.' O bîn zî vano; 'la min rê kê no padîşah pînc o.' Padîşah kewno zere û vano; 'min qiseyê şima dîne kerd. Ti kotî ra çêkerd no goştê kutiko yo? Bira vano; 'şo xizmetkarê xo pers bike.' Padîşah veng dano xizmetkarê xo. Vano; 'raşt vace no goştê çi bî?' Xizmetkar vano; 'manga bol xasek bî min zî kutik cikerd.' Padîşah vano; 'raşto, padîşah vano la ti kotî ra çêkerd kê ez pînc a?' O vano; 'şo marda xo ra pers bike?' Padîşah şino marda xo het. Vano; 'maya min raşt vace ez pînc a?' Maya ci vano; 'oxil wextê to de herb est bi, ez çi zana ti kamî ra bîyî.' Padîşah vano; 'no zî raşt o.' Padîşah şino nê birarî het vano; 'derdê şima çi yo?' Nê birarî vanê; 'pîyê ma merd û mîrasê xo di Mehemedî rê est ê jewî rê çin o. Ma zî nezanê kê kamcîn Mehemedî rê çin o.' Padîşah vano; 'o kê min rê vato pînc o, o zî pînc o ey rê çin o, ê bînê rê est ê.' Padîşah o mêrdekî rê vano; 'derdê to çi yo?' Mêrdek vano; 'deveyê min.' Nê birarî heme çi zanê, vanê; 'ma deveyê to nêdîyê.' Padîşah vano; 'ti şo.' Nînan deveyê to nêdîyo. Nê birarî qandê mîrasê pêrdê xo pêro danê. O bîn zî şino ray de xo.



DERBA GOTINÊ

Celadet Elî Bedirxan di Kovara Ronahîyê de qala dewlemendiya folklorê Kurdî dîke û wiha dibêje, "Me kurdan edebiyateke nivîskî, ji çend klasîkan pê ve, hesêb nîne. Lê me edebiyateke xelkê ê welê heye ko ew li nik kê miletan peyda dibe. Ji vê edebiyatê re folklor dibêjin." Folklor, ruh û hişê gel ê tomarkirî ye ku xwe digihîne tecrûbeya hezar salan. Mîrov di nava okyanûsa wê de avjenîyê neke û xwe negihîne kûrahîyên wê, dê derya û asoyên nû kişf neke. Kurdîya bêfolklor, Kurdîya bêpişt e.

Bahoz BARAN

Car he ye kesek bi saetan diaxive, lê tu tesîrê li ser însanan çênake, lê car he ye tenê gotinek, tesîreke gellek zêde li ser însanan çêdike. Eger mirov bikare xwe bigihîne ruhê gotinan û guh bide kelepura xwe ya dewlemend, helbet dê wê tesîrê zeft bike. Kurdîya çêkirî ya roja me, mixabin ji wê kelepore bêpar e û gellek caran tesîrê li ser mirovan çênake. Celadet Elî Bedirxan di Kovara Ronahîyê de qala dewlemendiya folklorê Kurdî dîke û wiha dibêje, "Me kurdan edebiyateke nivîskî, ji çend klasîkan pê ve, hesêb nîne. Lê me edebiyateke xelkê ê welê heye ko ew li nik kê miletan peyda dibe. Ji vê edebiyatê re folklor dibêjin."^[1] Folklor, ruh û hişê gel ê tomarkirî ye ku xwe digihîne tecrûbeya hezar salan. Mîrov di nava okyanûsa wê de avjenîyê neke û xwe negihîne kûrahîyên wê, dê derya û asoyên nû kişf neke. Kurdîya bêfolklor, Kurdîya bêpişt e.

[1] Ronahî, hejmara 23'an rpl. 450. Nivisa Memê Alan, Weşanên Belkiyê

Eger tûrikê mirov tije be, mirov bizane çî, li kû çawa bi-bêje, mirov li kîjan civatê be, li kû derê biaxive dê xwedî qîmet be. Kurdên berê, tûrikê wan tije bû, di nava meselê de carinan çîrokek dihat gotin, carinan pêkenokê kêfa civatê xweş dikir, carinan duayek dibû çiyê dîlxweşiyê, carinan biwêjekê bêhna mirov derdixist û mesele dida famkirin, carinan gotineke pêşyan rê li ber qeza û belayan digirt. Kesên ku bi folklorê xwe nizanin wek nanê bêxwê ne, wek xwarineke rijî ne û bêtehm in. Werin em bi hev re li çend mînakên binêrin bê derba gotinê tesîreke çawa çêdike.

Mala xaltîkê

Du sal berê li Amedê hevaleyê xwest ji xwe re malekê bikirre. Li taxa Mûsa Anter malek dît û bi xaltîkê re ket bazarîyê. Xaltîkê got, mala min bi sed û pêncî milyarî ye. Ew heval qayîl nebû wî got, pirr buha ye xaltîka min.

Xwedê he ye mala xaltîkê jî baş bû, neyse xaltîkê got, ê de bibêje, bi te mala min bi çiqasî ye. Wî hevalî got, xaltî Welleh mala te ancax bi sed milyarî be, bi vê gotinê re xaltîkê cira xwe nexweş kir û got, kurê min tu hatîyî qîza axan dixwazî û qelenê mirtiban didî min. Piştî vê gotina biderb, wî hevalî deng ji xwe neanî, piştî stûyê xwe xurand û ji malê derket.

Ma te çi kir?

Rojekê derîyê ereba camêrekî xera bû û çû sanayîyê. Camêr got, hoste ev derî xera bûye ka lê binêre. Mêrik du hulmik li derî xistin û got, temam e de bide bîst banknotan. Camêr got, ma te çi kir? Te du hulmik lê xistin û hew. Hoste got, tu mesela şûr dizanî, camêr got, na. Hoste got, ka bisekine ez ji te re bibêjim. Got, rojekê yek serr dike, di ser de şûrê wî xwar dibe. Diçe bal hostekî ku şûrê xwe rast bike. Hoste, şûrê wî datîne ser du keviran, li ser rûdine, bi qûna xwe şûrê wî rast dike û dibêje ka heqê min. Mêrik dibêje, heqê te çi ye? Hoste dibêje, tu yê zêrrekî bidî min. Mêrik dibêje, malneket ma te şûr da ser du keviran û bi qûna xwe rast kir, ma ji vêya re hettir çi ye, min jî dikarî wisa bikira. Hoste dibêje, wê çaxê te bikira. Li hev nakin, hoste radibe şûr dîsa xwar dike û dide mêrik. Mêrik tê malê şûrê xwe dide ser du keviran û li ser rûdine. Şûr dibêje qirç û dişike. Mêrik poşman dibe û xwe bi xwe dibêje, "Wellesh ê hosteyan qûna wan jî hoste ye." Piştî ku wî hosteyî ev çîrok ji camêr re got, camêr jî lê vegerand û got Wellesh heqê te ye, han bîst banknotên te.

Çavên kalo

Eger yek rabe pirsî çavên me bike û bibêje rohnîya çavên te çawa ye? Gellek caran em dibêjin, "Çavên min baş dibînin, rohnîya wan baş e." Rojekê ez li bal kalekî heştê salî bûm min jê pirsî got, kalo çavên te çawa ne? Kalo li min vegeand û got, "Wellesh hewqas baş e ku ez dikarim ta di derzîyê re bikim." Ev gotin nedişibîya gotinên her kesî, huner û şibandineke hêja tê de he bû. Deh sal jî derbas bûn lê ev gotin tu carî ji bîra min derneket.

Tu ji kû yî?

Em gellek caran dema ku mirovekî nas dikin, jê dipirsin dibêjin tu ji kû yî? Lê ev gotina me pirr tê bikaranîn û ji aliyê edebî ve têr û tije nîn e. Rojekê em çûn mêvandarîyê, hevaleyê li bal me bû, dîya min pirsî wê kir û got, "Qîza'm tu pincara kîjan erdî yî?" Qîzika hevala me şaş ma û got, "Pincar?" Paşê dîya min got, "Yanî ez dibêjim tu ji kîjan axê yî, ji kû yî qîza min?" Gotina ku ji huner û afirînerîyê dîr e zêde tesîrê li mirovan çênake. Lê gotinên biderb hem tesîra xwe çêdikin û hem jî zû bi zû nayên jibîrkirin. Ev gotina hanê jî wek morekê li tehta enîya hişê min ket.

Gotina duderb

Hevalek çûbû şînekê, di vegeê de ji min re qala bûyerekê kir. Got çend roj berê, li gund şînek he bû, ez û çend merivên me, me lê xist em çûn şînê. Îcarê li wî gundî merivek he ye, dema ku dikeve ser xwarinê her tiştî ji bîr dike, xwe wisa ji bîr dike ku piştî demekê xwarina li ber hevalê xwe jî dixwe. Yekî wisa bêhawe bûye ev kes. Îcar nivro me nan dixwar, min dît ew camêr hat û li ber xwedîyê şînê rûnişt û dest bi xwarinê kir. Camêr xwarina xwe qedand û dest bi xwarina xwedîyê şînê kir. Mêrikê mazûban, ji vê yekê aciz bû û berê gotinê da wî camêrî û got, "Tu dizanî dema ku ecelê nêrî tê diçe nanê şîvên dixwe." Camêrê me qet isûla xwe xera nekir, çend parî jî xwar û paşê simbelê xwe paqij kir û berê da xwedîyê şînê û got, "Keftar di qulika xwe de eleqa kesî nake." Piştî vê gotinê mêrikê me di cîyê xwe de bû kevir û nema bersivek da vê gotina duderb. Lewra hem bûbû keftar û hem jî mazûbanîya wî hatibû bîrê.


Hêsirên pepûkê lê ketine

Pênc şaş sal berê, ez û kalê xwe, em li bin darekê rûniştibûn. Min li asîmanan nêrî û tişteki bala min kişand. Du şaxên dara tûyê bi hev ve zeliqîbûn. Min ji kalo pirsî û got, "Kalo ev şax çima bi hev ve zeliqîne?" Wî jî serê xwe rakir û li wan nêrî û ji min re got, "Qey hêsirên pepûkê lê ketine?" Min pêşî fam nekir, lê kalo gotina xwe temam kir û got, "Tu mesela pepûkê dizanî, ji ber ku wê xwişkê birayê xwe kuştîye, fer maye û hertim li dû birayê xwe ye, pepûk tim li fera xwe digere, îcar dema ku tê li ser daran vedinişe û digirî, hêsirên wê li çi bîkeve ew tişt dibe cot, xuya ye hêsirên pepûkê li wan şaxan ketîye. Piştî gotina kalo, min careke din li wan şaxan nêrî. Min hêsirên pepûka reben dîtîn.

Bû tarîya pîrêçiz

Tarî he ye, tarîya pîrêçiz he ye. Carinan hinek gotin, bi salan di hebana hişê mirov de li cîyekî asê dimînin. Rojekê mirov hay jê çêdibe, mirov wê gotinê zeft dike û wê zindî dike. Du sal berê şeveke zivistanê bû, em li serê çiyayekî bûn, ewran li asîmanan lotik diavêtin. Şeveke wisa tarî bû ku çavan çav nedidîtin. Şeveke kor bû. Hevalekê got, ev şeva tarî, ne mîna şevên din e, qey navekî vîya tune ye? Hema di carekê de birûskêkê li mejîyê min birq da û gotina dîya min hat bîra min. Min got, berê ji şevên wisa re digotin, şeveke "pîrêçiz" e. Paşê min ji dîya xwe pirsî û got, "Dayê we çima ji wan şevan re gotîye şeva pîrêçiz?" Dîya min got, "Kurê min, ew şev şevên kor bûn, tarîya tarî bû. Çavên pîrên me di wan şevan de qet nedidîtin, ji bo em pîran ji cîyê wan rakin, me "çiz" ⁽²⁾ di wan re dikirin û ew ji cîyên wan radikirin. Loma me digot bû şeva pîrêçiz. Pîrik nikarin di wan şevan de pêşîya xwe bibînin, "bi çizan me ew ji cîyên wan radikirin.

[2] Çizkirin: Zextandin.



ŞÊRÊ CIWAN Û ROVIYÊ PÎR

Hebû tune bû, rojê rojan li daristanekê şêrekî ciwan hebû, şêrê ciwan mezinê hemû ajalên daristanê bû. Rojêkê şêrê tiral agahî ji hemû heywanên (ajal) daristanê re şiyand ku li cihekî daristanê kom bibin. Hemû ajal li hevdu kom bûn û şêr got ku:

-Ya ajalên daristanê! Ajalên ku nehatine mane?

Ajalan meyzand ku roviyê pîr nehatiye heywanan got ku:

-Ya Qralê me heywanan; welêh roviyeke pîr maye.

Şêr got:

-Roviyekî ciwan bila here pey roviyê pîr û wî bîne.

Roviyê ciwan bi rê ket, çû û çû gihîşt li cem roviyê kal.

Roviyê ciwan gotê:

-Roviyê pîr; mezinê me heywanan divê (dibêje) bila were civîn heye.

Roviyê pîr got ku:

-Lawê min ez kal û pîr im şewt û jan ji laşê min diçe, ha îro dimirim ha sibe, here ji şêrê ciwan re bibêje, nexwes e nekarîbû were.

Roviyê ciwan got: "Bila be." Û vejeriya cem şêrê qral, şêrê ciwan got ku:

-Ya heywanên Xwedê! Min biryar stendiye ku di daristana min de ajalekî pîr û kal nemîne.

Ez şêrekî ciwan im, divê ajalên wekî min li wê daristanê ciwan bijîn. Em ê hemû heywanên pîr û kal bikujin bila tenê yê ciwan bimînin.

Şêr di nav wan ket û ajalên pîr û kal tev kuştin. Ji ajalên pîr û kal tik û tenê roviyê pîr filitî. Şêrê ciwan di nav kêf û kêferatê de dijiya, dixwar, vedixwar û radiza. Rojekê şêrê qral zikê xwe dîsa têr û tijî kiribû li binê siya darekê di xew ve çû. Carekê ji xew rabû ku laşê wî giran bûye û tişteki di zikê wî de dilebite. Şêr kire qêrîn û nalîn, ajalên daristanê li ser serê şêr kom bûn gotin:

-Ya mezinê me ajalan çi bûye û çi qewimiye ku tu xwe li hev dizivîrînî.

Şêrê qral got ku:

-Tişteki di zikê min de dilebite.

Ajalên din hemûyan bi hev re gotin ku:

-Welleh! Zihayê mara ye.

Şêrê qral got ku:

-Ez dikim bimirim tişteki bikin û wî marê di zikê min de derxin.

Lê mixabin tu tişteki ji destê ajaleke ciwan nedihat û ne-dizani marê di zikê wî de derxin. Ji ajalan yekî got ku:

-Ya mezinê me heywanan welles em hîn ciwan in! Zanebûn û serboriya[tecrube] me hê di warê jiyane de kême. Ên ku dikare te rehet bike roviyê pîr e. Ew tenê ji destê te filitî bû. Şêr got ku:

-Ka herine pey wî bînin.

Qasid bi rê ket û çû pey roviyê pîr û kal, qasid gihîşt bal û got ku:

-Mezinê me ajalan zehf nexweş e, dibêje bila zû were.

Qasid û roviyê pîr bi rê ketin û hatin. Hatin gihîştin cem şêrê tiral. Roviye pîr got ku:

-Ya mezinê heywanan ji te re çi bûye!

Şêrê qral bû kuftekufta wî û got:

-Ya roviyê pîr ez razabûm tişteki di devê min re kete zikê min û di zikê min de diçe û tê. Roviye pîr ji şêr re got ku:


-Mar e, de ka ji min re tasek şîr bînin.

Tasek şîr jê re anîn û gote şêr ku devê xwe qenc veke û bide li ser tasa şîr. Şêr wilo kir û nişka ve zihayekî maran yê reş wekî werîsekî ji devê şêr vekîşiya û hate şîr, mar derket û mar kuştin. Bêhna şêrê qral derket û av vexwar. Piştê şêr berê xwe da ajalan û got ku:

-Ya heywanên Xwedê! Min bi fermana kuştina ajalên pîr şaşitiyeke pîr mezin kir. Bi kuştina wan re zanyarî û serborî jî me kuşt. Ku ev roviyê pîr tunebûya ez niha nesax bûm.

Şêr lêborîna xwe ji roviyê pîr xwest û got ez zahf poşman im.

Çîroka me li diyaran rehmet û li dê û bavên hazir û guhdaran ji xeynî xayîn û zordanan.



Amadekar: Nasir ASLAN
Çavkanî: Nezîhet ASLAN
Temen: 60
Perwerdehî: Xwende
Herêm: Tilhesen / Kercos / Êlih
Sal: 2004

Pîran de Keyneki Waştîş û Veyve Kerdiş

Mamoste
SILÊMAN ▶

Her ca de cîya-cîya edet ûsilê keyneki waştîş; nîşan, veyvekerdiş û veki berdiş esto. Yew ûsilê eya[e] kerdişê keyneki esto. Verê maya lajekî, şona keyê keyneki, maya keyneki ra vana ke; "Eke Hûmay kerda se, ma wazenê ki şima reydi yew merdimanî bikî." Maya keyneki vana ki; "Homay kerda se, ko bibo. La verê ez ganî keyna xo ra vaja, fikrê ja bigêra, eke qebul biko, dima zî pîyê ja ra, birayanê ja ra, dima zî ko qewmê xo ra vaja. Eke qebul bibo zî, nêbo zî ez ko yew xebere bida şima."

Waştışê Keyneki

Her ca de cîya-cîya edet ûsilê keyneki waştış; nîşan, vey-vekerdiş û veki berdiş esto. Yew ûsilê eya(e) kerdişê keyneki esto. Verê maya lajekî, şona keyê keyneki, maya keyneki ra vana ke; "Eke Hûmay kerda se, ma wazenê ki şima reydi yew merdimanî bikî." Maya keyneki vana ki; "Homay kerda se, ko bibo. La verê ez ganî keyna xo ra vaja, fikrê ja bigêra, eke qeubul biko, dima zî piyê ja ra, birayanê ja ra, dima zî ko qewmê xo ra vaja. Eke qeubul bibo zî, nêbo zî ez ko yew xeberi bida şima." Verê maya keyneki, keyna xo ra vana. Eke keyneki biwazo se, dima maya keyneki piyê keyneki ra û dima zî birayan û wayanê keyneki ra mesela vana. Polê keyneki, xo miyan di muşewre kenê. Ino muşewre ra pey, yew qerar danê û no qerarê xo, eya(e) bo zî, ney zî bibo, poldê lajekî rê yew xeberi erşawenê. Eke xeberi ney bibo se, polê lajekî na mesela yew deme ina ca viyardanê. Demey ra pey, key lajekî, qasido/qasida ki pey terafê keyneki bestêno, rayna raykenê key keyneki. Eke raya diyni zî keyê keyneki cewabê redê bido, hem key keneki, hem zî key lajekî, na mesela bind ra padanê.

Eke terafê keyneki qeubul biko se, polê lajekî, seba xazgînan rojê şeyîş xeberi danê key keyneki. Xeberdayîşê dima, çend camêrd û çend cinîyê ki qala jînî(înan) qeubul bena, şonê keydê keyneki. Polê keyneki, yew bi yew hal-xatirê xazgînan perseno. Dima piyê keyneki, poldê lajekî ra vano ke; "Ey... vajê şima xeyr o, mirazê çima çî yo?" Piyê lajekî, vano ke; "Eke Homay kerda se, nêtê ma esto ke, ma şima reyde yew merdimanî bikî." Piyê keyneki vano ki; "Eke Homayî kerdo se ko bibo." Dima polê keyneki, nîşanê keyna xo cemat rê vano. Ino nîşan zî bazinî, rêzîla gerdenî, yan zî nizdiyê 1,5 metro, yan zî di metro rêzîla zerdî, goşareyê nîşanî, seat, ingîştreyê nîşanî wazênê. Eke îdereyê poldê lajekî weş nêbo cemat dekeno beyntar. Cemat poldê keyneki ra vano ke; "No nîşan tikê giran yeno. Qaydê homay û pêxemberî rê, qaydê nê cematî rê çîy bêrê war." Piyê keyneki, nîşan ra çîy ano war. Cemat nîşanê keyneki ser o qerar dano. Dima kelmelê keyê ser o qalî benê. No kelmel zî dolaba cemedî, qol-tûxî, livîna rakewtişî, xalîy, gezêyê ceyranî, utîy, firni, makinaya cilan, mase û sendalî yî.

Nîşan û kelmelê dima qelendê keyneki ser o qalî beno. Qelendê keyna zafê jey may wazena. Çunku no qelend bedelê şitê maydî hesabêno. Qelend zaf bo, semedo ki qelend kemî bibo, cemat dekûno dewre. Qaydê cemat rê no qelend zî darax di viyardêno. Inê serranê peynîyan di edetê qelendî zî hêdê-hêdî hewanêno.

Qeubulkerdişê nîşanî, kelmelî û qelendî ra pey fatîha wazênê. Wendişê fatîha ra pey, heme cemat wardeno destê

yewnan tewşeno û lew yewnan ra dano. No miyan di, cemat yewnan ra vano; "Xeyrê bo, Homay mûradê înan biqedîno." Tira pey, maya lajekî ingîstre dekeno ingîsta keyneki.

Dima zî şîrne û şerbeto ke polê lajekî ardo keyê keyneki, hetê keyê keyneki ra cemat rê îkram beno. 50-60 serrî ra viyar kesme bastîx, sincûqî û şerbete helawi îkram biynî. La nê serranê peynîyan de paqlawa û kola îkram bena. Werdişê şîrney ra pey, cemat keyê keyneki ra xatir wazeno û şono keydê xo.

Nizdiyê veyvê mareyê yê dînî û ê resmî birîno. Wexto ki mareyo dînî birîno, ya yew hêga, ya rez ya zî zerdê(altinê) ser o birêno. No hêga, rez ya zî zerd dêno veki.

Veyve Kerdiş

Waştışê keyneki ra pey, polê lajekî û polê keyneki, hedreya veyvêyî kenê. Polê lajekî, wexto ke hedreya veyvêyî tamam biko, maya lajekî şona keydê keyneki. Wirdê terafê rojê veyvê bellî kenê.

Rojê veyvê nizdiyî bi se, hem keyê lajekî, hem zî keyê keyneki, verê xeberi danê merdimanê xo, dima xeberi danê nas û dostanê xo. Dawulcî û zûrnacî zî ayar beno. Nê 50-60 serran ra viyar veyvan di lulîy û erbane cenîyaynî û deyrê kirmancî vajîyaynî. Nê serranê peynîyan di, orkestra zî cenêna. Bi muzîkî deyrê Kurdî vajîne. Nê deyrê zafî jînî, têkoşîna azadî û hîsîyatê welatpewerê ser o vajîne. Veyvan di wexto ki bi orkestra nê deyrî vajîne, şarê ma bi çoş kay keno û bi nê muzîkî û bi inê deyran adeta xo ra vêneno.

Veyve zafê jey rojo êne taştarey ra pey dest pêken, rojo kirê(bazar) qedîno. Rojê veyvê, verê dawulcî û zûrnacî yenê, verê berê lajekî di, yan zî nizdiyê keyê lajekî di, yew cayo musaît di, dawulcî û zûrna cenênê. Rojê veyvê keynekî û xortî, cenî û camêrdî, gede-gude hem kes, cilanê xo neweyan û rindan xoradanê û şonê veyve. Cenayîşê dawulcî û zurna ra pey, milete yena cayê veyvê di pêser bena û dest bi govendi kena. Ra-ray zî vengê dawulcî û zurna birêno, sergovend dest bi deyri keno, dima zî govendbazê bîni hem govenda xo gênê, hem zî deyranê xo vanê. Tay-tay cayan di, cenî û camêrdî têdest de govend gênê. Tay-tay cayan di zî cenî yewna ca di, camêrdî yewna ca di govend gênê. Polî lajekî miyanê rojî di, seba şarê veyvê wer hedre kenê. No wer zafê jey, tirşa goştî û birinc, ray-ray zî fesleyê bi goşt û birinc virazênê.


Rojê yê diyêni, werê miyanê rojî dima şonê keyê keyneki, destê veki hene kenê. Veki, ya zerreyê keyê di, ya zî verê berê keyê di, yew kursiyê ser o roşena. Hem polê keyneki hem zî polê lajekî, hem zî xwendiyê veyvê muman veş-

nenê. Der û dorê keyneki geyrenê û deyran vanê. Helî-yayîşê muman dima, yew merdima keyneki, ya zî ê lajekî destê keyneki hene kena. Vêki seba xela henîy, destê xo nêakena. Maya lajekî, ya yew çarek zerd, yan zî yew ingîstere(gîstere) destê veyveke mîyan nana. Vêki destê xo akena û ina cenî destê veyveki hena kena. Dima xwendî, tay zeman dormareyê vêki de, hem deyran vanê, hem zî govendî gênê. Na govendî dima, xwendî şonê caydê veyvê û ay roj hetan şan kay kenê.

Rojo hêrini zî veyve dewam keno. Inê 40-50 serran ra vîyar, rojo peynî de, di camêrdan ra yew cilê camêrdan xoradaynê û yew zî ê cenîyan xoradaynî. Jîni ra yew camêrdê, semedoke nêro sereşnayîs, yew kind de herinda çiman akerdnî û no kind daynî xo ser ro. Inê mêrdiman ra ayê ki cilê camêrdan xoradaynî bîynî kose û ya çîwa, ya zî şewta dergi girewtnî xo dest û ayê ki cilê cenîyan xoradaynî bîynî vêki, dekewtnê govendî û kay kerdnê. Wexto ki kose û vêki kay kerdnî, yew mêrdimî destê ina vêki girewtnî û remnaynî. Kose hewnîyaynî ki vêka jey, yew mêrdim ha remneno, fek govend ra verradaynî, bi vazdi reydi şîynî, no mêrdim şewtan vîyarnaynî û vêka xo nê camêrd ra girewtnî û rayna dest bi govenda xo kerdnê. Goreyê yew hîkayeyî, yew wext de, yew mêrdimo extîyar, cenîya xo reydi şono yew veyve. Cenîya nê mêrdimî ciwan bîya. Wexto ki dekonê govendî, yew merdim na cenîy remneno, extîyar şono dano inê mêrdimî ro û cenîya xo tepa gêno. Veyvan di hinê no edet hewaniyawo. Yewna het ra rojo peynî di, teqlîdê deva bîynî. Di mêrdimî, têpeyra vendertnê. Mêrdimê peynîy, peynîya mêrdime verên de, xo tam derenaynî, merdimo verên zî tekê xo derenaynî û wîrdinî yew hîzara rengini reyde xo limitnî. Mêrdimî verênê, destê jey de yew derzini bîynî. Bi ina derzini serebê

mêrdiman sernaynî û derzini jîni ra kerdnî. No edet zî hinê hewaniyawo.


Rojo peynî de, xwendîyan ra vîyar, polê lajekî ra çend cinî, şonê vêki xemilnenê. Rojo peynî, hetan seat des veyve dewam keno. Seat des ra pey hem xwendî, hem zî şarê veyvê şonê keydê vêki. Berdê vêki vîyarde mileta veyvê govendî gêna. Tira pey, di cinî dekonê poldê vêki, anê xwendîyan mîyan. Vêki yew sendalî ser o roşanenê. Verê maya lajekî, nîşanê vêki şarê veyvê mîyan di vêki ra kena. Nîşanê vêki ra pey, maya lajekî, yew bazin destê vêki ra kena. Dima hem polê lajekî, hem zî polê keyneki û mêrdimê jîni xelata xo pakenê. Dima zî xwendîyê veyveyî zî xelata xo vêki ra kenê. Wexto ki xelati pabena, kişta vêki di, poldê lajekî ra yew cinî vejîna sendalî sîyar, xelata ki vêki ra bena verê nameyê wîyarê xelati bi vengê berzî vana û na xelati şarê veyvê nawnena û dima zî na xelati vêki ra kena. Merasimê xelati ra dima, vêki dekenê teksî û benê verê berdê lajekî. (Inê 40-50 serrî ra vîyar, semedo ke teksî çin bîy vêki, qelabalixê reyde û pey istori hewilnaynê. Ay wext şaro ki vêki reyde bîynê, tîfing û debançey teqnaynê.) Vêki semedo ke xelata xo bigêro, ina asaney reyde teksî ra, nîyna war. Maya lajekî, yew zerd vêki ra kena. Dima vêki teksî ra yena war. Polê lajekî ra yew cenî şeker fiynena vêki sîyar. Wexto ke vêki hamêyî berdê lajekî vîyar, vêki ya yew bardaxi, ya zî yew xili (şarbi) dana erd ro şiknena. No mîyan di, zama sayan vîyar vêki dano. Dima zî vêki hinê şona zerreyê keydê lajekî. Tay veyvan ra pey, keyê lajekî werê mewlidê danê. Tay veyvan ra pey zî keyê lajekî, werê veyvêy dano xwendîyan. Xwendîyê werê xo wenê. Dima keyê lajekî ra xatir wazenê û şonê keydê xo. Û veyve hinê qedîno.



KÊÇO

Berhevkar:
Mahpus BILÎZ

Çavkanî: Meta Şemsê
Temen: 83
Perwerdehî: Nexwende
Herêm: Qerejdax / Amed
Sal: 2015



Paşayek û sê lawên wî hebûne. Mal û milkê paşê wisa pir e nayê aqila. Paşa dimire. Van hersê lawên paşê li ser mal û milkên bavê xwe didin çirtika, bela dikin, xumarê dilîzin û tût û rût dimînin li ortê. Birçî dimînin.

Hersê bira dibên(dibêjin):

-Eman, gidî, em çî bikin, çî xweliyê li serê xwe bikin, em man birçî.

Vir da wê da bi hev şewirin û gotin:

-Wele wext wexta paletiyê ye. Em ê dirgan û tirmix û dasên xwe hildin û herin ji xwe ra karekî bibînin û bişixulin.

Her sê bira rabûn dan ser rê û çûn. Kêm çûn, zêde çûn rastî zewiyê hatin. Bala xwe danê ku di zewiyê da teneyekî(genimekî) wisa li dar e meriv qemiş nake li tene binêre. Ê wexta çînîna tene jî hatiye. Evana hema dane dasê xwe û bê xwediyê zewiyê ketin nava tene û çînîn. Dibên:

-Çawa hebe xwe-

diyê zewiyê hat wê heqê me bide me. Çînîn çînîn, nihêrîn ku way(wa ye) pîrek hat, Pîra Hût. Pîra hût bala xwe didê ku way sê kes ketine zewiyê û teneyê wê diçînin. Pîrê diqîre ji wan ra xebera dibêje, dibê:

-Lo lo qey we wa genima bêxwedî dîtiye hûn diçînin?

Evana dibên:

-Pîrê em ji te ra diçînin.

Got:

-Hûn ji min ra diçînin?

Gotin:

-Erê em ji te ra diçînin.

Got:

-De lawo biçînin Xwedê ji we razî be.

Çînîn bîstik ma ji navrojê ra.

Pîra Hût
got:

Layê(lawê) min niha hûn birçî bûne?

Gotin:

-Erê wele Pîrê em birçî ne.

Pîrê zivirî ser yekî ji yên din pirsî got:

-Navê vî birayê we çî ye?

Herduyê din gotin:

-Navê wî Elî ye.

Pîrê got:

-Wele ez nizamim bêjim Elî, ez ê bêm(bibêjim) Kêço.

Pîrê navê lêwik danî Kêço. Herdu birayan gotin:

-Wele Pîrê tu dizanî, hema tu bi kêfa xwe yî.

Pîrê li kaxizekî mektubek nivîsî da Kêço, got:

-Kêço here mala me way li filan çiyayî ye, mala Pîra Hût e. Here her sê keçikê min li mal in. Tu yê vê mektûbê bidî wan bira nê çêkin bi te din û tu yê hildî û bînî. Kêço rabû ket



rê û çû. Ê Kêço jî xwenede (xwenda) ye, zane ye. Mektûbê jê derxist got:

-Hela bise ez lê binêrim nanê me çl ye, hela Pîra Hût wê çi nanî bide me?

Kêço li mektûbê nêrî, bala xwe dayê ku Pîrê ji qîza mezin ra gotiye:

-Tu yê Kêço şer jêkî(ser jê bikî), li ber bilxurêkî û li satîlekê û bidî qîza bîçûk li hespî kî(bikî) û bişînî. Dibê hey (eger) birayên Kêço ji xwişka biçûk pirsîn gotin: "ka Kêço?" Tu qîzîkê temî bike bira ji wan ra bêje: "Kêço way li mal e, westiyaye, bêna xwe dide, ew ê dûra were."

Kêço radibe wî kaxizî diqelêşe, davê(diavêje) û kaxizekî din ji bêrika xwe derdixe û wiha lê dinivîse, divê(dibêje) Pîrê gotiye:

-Bira(bila) Bizina Mor şer jêkin, li ber bilxurê kin, bira Kêço têr bixwe û yê mayî jî li satilê kin bira Kêço hilde û ji me ra bîne ber zeviyê.

Kêço kaxizê ku nivîsandiye bi wî awayî dibe, dide destê qîzên Pîrê. Her sê keçîk mektûbê dixwinin û radibin hema hahankava bizinê şer jê dikin, goşt çêdikin, Kêço têr dikin û goştê mayî jî dixin barê hespî û Kêço dişînin. Kêço dide rê û diçe ber zeviyê. Kêço nêzîk dibe, Pîrê wiha dinêre yek tê. Dibê:

-Wele eva Kêço ye. Dibê wey Kêço te di diya min niyayo, te li min çi kir?" (Di dilê xwe da dibêje, ji bo ku deng neçe birayên Kêço û ew meselê fem nekin).

Evana xwarina xwe dixwin û cardin radibin tene diçinin heya êvarê, êvarê derin(diçin) malê. Derin malê, lê Pîra Hût Kêço di dilê xwe da dixwe. Dibê:

-Ez gere(gerek) goştê Kêço bi saxî bixwim, wî bi qurbbana Bizina Mor kim.

De ka êşa Bizina Mor daye serê

Pîrê, Pîrê qet zevt dibe. Dibe êvar şiv tê erdê, pale cardin xwarina xwe dixwin. Pîrê ciyê hersê qîzên xwe li wî diwarî datîne, ciyê hersê lawikan jî li wî diwarî datîne. Pîrê jî dere(dihere) li hêla malê radikeve. Ê Kêço kula xwe, ya ku bi roj aniyê serê Pîrê dizane. Kêço ranakeve, tebatî nakeve Kêço. Kêço carî carî ji birayên xwe ra dibê:

-Law rabin lawo rabin em herin, eva Pîrehût e bi Xwedê evaya wê me şer jê bike û bixwe.

Birayên wî dibê:

-Tu bi qurbana Pîrê bî. Pîrê navroja me goşt daye me, êvarê cardin goşt daye me tu jî radibî dibêjî wê Pîrê me şer jêke û bixwe. Dibên de ji xwe ra rakeve dev ji vê tîrsa xwe ya beredayî berde.

Kêço cardin dibê:

-Law rabin em herin.

Dike û nake evana ranabin. Evana radikevin Kêço radibe hêdfika ciyê birê xwe yê mezin dibe dewsa ciyê qîza Pîrê, a mezin, ciyê wê jî tîne dewsa ciyê birayê xwe. Ciyê keçika ortê tîne dewsa ciyê birayê xwe yê ortê, ê xwe jî dibe dewsa ciyê keçika biçûk. Kêço qêmîşê birayên xwe nake, di nav ciyê xwe da xwe kerr dibe û disekine, xew nakeve çavên wî. Kêço bistekî disekine, dinêre way Pîrê kêreka mezzin di desta da ye hat. Pîrê bi hêrseka mezin dikeve ser qîza xwe ya mezin şer jê dike, dikeve ser ya ortê wê jî şer jê dike. Nizane ku Kêço ji êvar da çi kiriye, dewsa qîzên wê û birayên xwe guhertiye. Dibê:

-Ez Kêço şer jê nakim, gere ez serê sibê li ber çavên Kêço goştê birayên wî bibrêjim û bixwim û piştra jî ez ê Kêço şer jêkim û bixwim. Dibê ez ê Kêço bi qurbana Bizina Mor kim.

Qederek şev derbas dibe, Kêço gazî

birayên xwe dike dibê:

-Law rabin lawo rabin em herin.

Birayê mezin dibê:

-Tu bi qurbana Pîrê bûyo, Pîrê awqas goşt da me, em ê ku da herin?

Kêço dibê:

-Lawo hela li ciyê xwe mêze kin, ma ciyê we li vira bû? Min ciyê we bir dewsa ciyê keçikan yê keçikan bir dewsa ciyê we. Pîrê hat ku we şer jêke ji ber ku min ciyê we guherandibû Pîrê qîzên xwe di dila we da bi tevî orxanê şer jê kir way di qêpî(derî) ra derket û çû.

Hersê radibin derin. Pir derin hindik derin. Dibên:

-Wele li filan derê paşakî mezin heye, em ê herin gundê wî ji xwe ra bişixulin, niha li wir kar heye û dibên ku em li cem wî paşayî bişixulin Pîrehût nikane(nikare) tişkî jî bi me bike.

Evana derin mala paşê. Paşa dibê:

-Layê min hûn kî ne, ji ku da tîne, ku da derin?

Evana dibên:

-Wele paşa em ji xwe ra li karkî digerin.

Paşa ji yê mezin dipirse, dibê:

-Tu yê herî ber dewaran(garanê)?

Dibê:

-Erê, ez ê herim.

Ji yê ortê dipirse, dibê:

-Tu yê herî ber golikan.

Ew jî dibê:

-Erê, ez ê herim.

Ji Kêço dipirse, dibê:

-Kêço tu yê çi karî bikî?

Kêço dibê:

-Wele ez nikarim karkî bikim. Ez ê ji mêvanan ra çay bînim odê, nan bînim û bibim, ez ê cî û nivînên mê-

vanan daynim. Yanî dibê ez ê xizmeta oda te bikim.

Paşa dibê:

-Hah! Karê te tew baş e.

Evana êdî dest bi karê xwe dikin. Dibe êvar gavan ji ber dewêr têt, herdu birê Kêço têt li jêra odê rûdinin. Herdu bira bala xwe didinê ku Kêço li ber destê paşê diçe û têt, paşa jê hez dike. Evana ji Kêço xûy dikin(dexesiyan dikin.) De ka Kêço birayê herî biçûk e û li oda paşê mêze dike, ew jî gavanî û golikvaniyê dikin, zora wan dere. Dibên:

-Lazim e em tişkî bînin serê Kêço ku wî ji ortê rakin.

Êvarekî dîsa bira têt malê. Ê mezin dibê:

-Paşa!

Paşa dibê:

-Ha!

Dibê:

-Mihîneka(mehîn) Pîra Hût heye, yeka biqasî vî dîwarî ye. Dibê eger ew mihîn ji te ra bihata rola te, wê hîn zêdetir ba.

Paşa dibê:

-Lawo ar di mala we keve. Pîrehût li ku, ez herim hespa wê bînim li ku? Dibê:

-Mala wê di vî çiyayî da ye. Ez şevkî lê bûme mêvan, îmkana ku meriv bikanibe(bikaribe) hespa Pîrehûtê bîne tune ye.

Paşa dibê:

-Ka wê kî bikanibe here bîne?

Birayê mezin dibê:

-Kêço'yê me dikane here. Kêço tu aniha bişînî wê here mihînê bîne.

Kêço dike qîreqîr, digirî. Dibê:

-Lawo eman, hewar ez ji ku dikanim herim mihîna Pîrehûtê bînim?

Bira dibên:

-Wele tu dikanî.

Paşa jî bi ber bayê birayên Kêço dikeve. Dibê:

-Kêço wele tu derî here tu narî ez te dikujim.

Kêço mejbûr dimîne radibe dere. Dere ji xwe ra çar-pênc mêtro cawê reş dikire û dere xaniyê Pîrê ji para ve qul dike, qêpiyekî (deriyekî) vedike û destê xwe diavêje dizgîna mihînê. Mihîn dihişe, dibê:

-Pîrê Kêço hat!

Pîrê hema ji cî radibe direve têt. Bala xwe didê ku way qêpî kilît e û tiştê jî tune ye.

Kêço ew cawê ku stendiye bi xwe ra biriye dide ber wî cihê ku qul kiriye û têt ra ketiye hundir. Di ber wir da darda dike ji bo ku îşiq(şewq) têt ra nexwiyê. Pîrê li vî alî dinêre, li wî alî dinêre tiştê tune ye, cardin diçe dikeve nav ciyê xwe. Pîrê cardin xewra dere, Kêço cardin dest diavêje rişma mihînê. Mihîn cardin dihişe, dibê:

-Pîrê Kêço hat!

Pîrê cardin têt, digere tiştê tune ye. Pîrê cardin diçe dikeve nav ciyê xwe ku rakeve, mihîn cardin dihişe, Dibê:

-Pîrê Kêço hat!

Bi vî gotina cara sisêyan ra, şonik(darê ku pê cil û herî têt kutan) li wir e, Pîrê hema şonikê bilind dike davêje li iniyalenî mihînê dixê, dibê:

-Min serê Kêço di te kirê, tu jî bi Kêço min ditirsînî!

Mihîn dibê:

-Bira tu wer bikî. Dibê wele êdî Kêço min bibe jî ez deng nakim.

Pîrê dihere radikeve, Kêço jî di wî deriyê ku bi xwe vekiriye û caw di ber da darda kiriye ra mihînê dikişîne û dibe. Kêço dere. Pîra hût serê sibê radibe bala xwe didê ku mihîna Qer tune ye. Pîrê citî û pêtiya ji xwe dike dibê:

-Kero Kêço qey tu yê wisa ji destê millet têt li mihînê dinêrin hahoooo! Tew hespa wiha li derkî tune ye. Paşa li ser vî meselê hinkî din ji Kêço hez dike. Dibe êvar birayên Kêço têt. Ji paşê ra dibên:

-Kêço hesp ji te ra anî?

-Kêço hesp ji te ra anî?

Paşa dibê:

-Erê wele anî.

Bira hinkî ecêb dimînin. Dibên:

-Heyran Kêçoyê me pir xurt e, dikane her tiştî bike.

Bira li hember vî jêhatibûna Kêço li dek û dolabên din digerin. Dibên:

-Em çi bikin ku em Kêço ji ber çavên paşê da bixin?

Îcar ji paşê ra dibên:

-Me wê rojê li mala Pîrehûtê xwarin xwar; dibê kevçiyê Pîrehûtê ku danî ser sifrê zêr bûn, siniya ku ji me ra danî zêr bû, lengerî zêr bû. Dibê paşa ji xêra Xwedê ra ew çikana(kevçî û kod) jî bi destê te bi ketana. Dibên tam layiqên te ne.

Xaya(armanc) wan ew e ku Kêço here û Pîrehût wî bikuje.

Paşa dibê:

-Lawo kî dikane wana ji mala Pîrehûtê bîne?

Birayê mezin dibê:

-Kêçoyê me.

Paşa dibê:

-Lawo derxistina wan kevçî û kodan pir zehmet e, Kêço nikane bîne.

Bira, dibê:

-Wele tu Kêço aniha bişînî ew ê here û bîne.

Paşa dibê:

-Wekî wisan e ez ê Kêço bişînim bira here bîne.

Kêço hey digirî, dibê:

-Lawo ez ê çer(çawa) herim? Ma vava hesp bû, Xwedê li hev anî, min çû anî, ez ji ku ra dikanim herim kevçî û kodên Pîrê bînim?

Paşa dibê:

-Wele Kêço tu yê herî wan kevçî û kodan ji min ra bînî. Eger tu nerî(neçî) ez ê bi serê te dim (serê te lêxim-jêkim).

Kêço neçar ma, da rê û çû. Kêço di rê da bixwe bixwe dibê:

-Ez ê çi bikim, çawa bikim? Dibê wele ez ê hema rasterast herim mala Pîrê.

Û diçe mala Pîrê. Diçe dibê:

-Pîrê!

Pîrê dibê:

-Ha!

Dibê:

-Ez hatim, Kêço.

Pîrê dibê:

-Wey Kêçokê min, tu hatî çi, tu çer hatî, te li min xelat e yan celat e?

Dibê:

-Wele Pîrê min zanî ku min tu pir qehirandî. Dibê min mihîna te biriye, min gotiye ez herim bira Pîrê min bixwe.

De ka Kêço ye helbet hin tişt daye ber hev ji xwe ra. Pîrê dibê:

-Ê layê min, tu hatî ser çavan. Wexta ku tu hatî wele ez ê jî te bi kêfa xwe bixwim.

Kêço dibê:

-Pîrê Pîrê! Dibê wê roya(roja) ku em hatibûn mala te; te bilxurek çêkiribû, te xistibû lengeriya zêrîn, kevçiyê zêrîn xistibû nav, dabû ser siniya zêrîn min xwar. Dibê lezeta(tam) wê xwarina te hîn di bin zimanê min da ye. Dibê tu ji min ra wiya çêke ez bixwim ez ê qatek goştê din jî bigirim îcar tu min paşê

bixwe.

Pîrê dibê:

-Wîî, ez ê bi qurbana te bim! Dibê niha tu yê qatek goştê din jî bigirî?

Kêço dibê:

-Erê wele ez ê zêde bigirim.

Pîrê radibe bilxur çêdike û dide ber Kêço, Kêço dixwe. Kêço dibê:

-Pîrê wele ez pir tî me.

Dibê:

-Tu dikanî tasek av bidî min?

Pîrê dibê:

-Wele av di hundir da tune ye û tiştek jî tune ye ku ez pê avê bînim. Dibê ka ez çi bibim pê avê bînim?

Kêço dibê:

-Bêjînga te tune ye?


Pîrehût dibê:

-Heye.

Kêço dibê:

-Hema bêjîngê bibe.

Pîrê bêjîngê dibe di avê da dike û



nake av tijî nabe. Pîrê dibê:

-Kêçokê min av tê da nasekine.

Kêço dibê:

-Pîrê tê da birî û qulikên wê bixeti-mîne.

Pîrê jî tê da dirî. Heya Pîrê qulika dixetimîne Kêço bilxur dirijîne, kevcî û kodan hildide û direve, herre ku tu naçî. Pîrê tê hundir çî Kêço ye, çî bilxur e, çî kevcî û kodin, çî hal e? Kêço çûye. Bala xwe didê Kêço wa ye li ser pirê diçe. Pîrê jî carekê li ser wê pirê ra çûye û di rex wê pirê da ketiye xwarê. Ew roj ev roj e Pîrê sond xwariye êdî di ser wê pirê ra derbas nabe. Kêço çû, xwe xelas kir. Pîrê ax û wax bi xwe dikeve. Çî fayde... Kêço kevcî û kodên zêrîn dibe ji paşê ra. Êvarê sifra paşê tê ser ciyên wî: Sinî zêrîn, lengerî zêrîn, kevcî û kodik giş zêrîn in. Paşa hinkî din jî ji Kêço hez dike. Dibe êvar birayên Kêço tên dibînin erê, way Kêço hatiye û kevcî, kodik û sinî giş aniye. Di dilê xwe da dibên:

-Law me çer kir? Kêço way li cem paşê zêdetir rol girtiye, qedir û qîmeta wî zêdetir bûye.

Evana difikirin dibên:

-Em çî bikin çî nekin?

Diçin cem paşê, dibên:

-Paşa!

Paşa dibê:

-Îcar çî ye?

Dibên:

-Wele wê royê em li mala Pîrehûtê raketin, Pîrê jî me ra nivîn danîn.

Dibên:

-Rûyê wan kes nizane ku çî mal bû.

Dibê:

-Nivîn ji erdê a wiha bilind bûn. Wisa nerm bûn mîmanî hevirmûş(hevrişim) bûn. Dibê wekî ew nivînan jî ji te ra bihatana qîmeta te wê hinkî din

jî zêdebûya û dibên ew nivîn layîqê Pîrê nîn in, hema layîqê te ne.

Paşa dibê:

-Law ma nivînê me hene, em dikarin nivîna çêkin.

Evana dibên:

-Na nivînen wisa qet ne li mala te ne jî dereka din tun in(tune ne). Wele dibên ew nivîn li vî welatî tenê layîqê te ne.

Ê ev gotinên ku, nivînen wiha li mala te tun in, li paşê zor tên.

Paşa dibê:

-Ê de ka kî dikane here nivîna bîne?

Evana dibên:

-Kêçoyê me.

Paşa dişîne Kêço tîne. Paşa dibê:

-Kêço tu ye herî wan nivînan bîn.

Kêço dîsa qar û bar dike. Dibê:

-Heyran ma Xwedê carî ji meriv ra li hev tîne, dudan li hev tîne, lê cara sisêyan bela meriv li ber lingê meriv e.

Paşa dibê:

-Wele ku tu neçî ez ê bi serê te dim(serê te lêxim).

Kêço mejbûr dimîne dere. Dere lê şev e Pîrê û qîza xwe raketine. Kêço dikeve hundir. Ciyê Pîrê û qîza wê li kêleka hev bûne. Kêço xwe hêdîka di nava herduyan ra dike. Carekê qîzikê def dide, dibê qîza min çîçkî (hinekî) xwe wê da bike ez dikevim erdê. Carekê jî Pîrê def dide dibê dayê çîçkî xwe wê da bike ez dikevim erdê. Pîrê li hêlekî ji ser doşekê da dikeve erdê, keçik jî li hêlekî dikeve erdê. Kêço nivînan qat dike, li şîrtê dike û hildide û dere. Pîrê wextekî şevê li xwe dihesê gazî dike dibê:

-Qîza min hinkî wê da here ez li erdê me.

Keçik dibê:

-Dayê, wele ez jî li erdê me!

Pîrê dibê:

-Wee wele Kêço niha diya me, nivînen me jî bir çû.

Kêço nivîn bir ji paşê ra. Paşa li ser nivînan veket(raket), li kêfa xwe mêze kir. Paşê hinekî din jî ji Kêço hez kir, go:

-Wele Kêço tu pir merivekî baqil î.

Bû êvar birayên Kêço hatin malê. Gotin:

-Paşa Kêço ji te ra nivîn aniye?

Paşê got:

-Erê wele aniye û dibê Kêço pir jêhatî ye.

Herdu birayan li ber dewêr ji hev ra gotine:

-Hey Kêço nivîn anî be, em ê rêyeka din bidin ber bira wê bike hela Pîrehût wî nakuje.

Vana ji paşê ra gotin:

-Paşa paşa! Kes nizane, qîzek Pîrê heye çî qîz e çî qîz e. Dibên wer(wisa) rind e meriv nikane ji bedewbûnê lê mêze bike. Dibên wekî ew keçika jî ji te ra bihata li ser te ra paşa li vî welatî tune bûn.

Ku qala keçikê tê kirin paşa kêfa wî xweş dibe, di bin simbêlan ra beşeve dibe(dibeşîş).

Paşa dibê:

-Heyran erê erê lê, kî dikane keçikê bîne?

Evana dibên:

-Kêçoyê me! Dibên tu Kêço bişîne eger Kêço neçû neanî em qet tişkî nizanin li vî dinyayê. Dibên Kêço pir jîr e.

Paşa dibê:

-Ji min ra zû gazî Kêço bikin.

Gazî dikin Kêço tê, lê ditirse dibê:

-Ka hela paşa îcar çî bide pêşiya min.

Paşa dibê:

-Kêço, keçeka Pîrehûtê heye û pir binavûdeng e. Dibê here, tu çi dikî bike lê wê keçikê ji min ra bîne.

Kêço dizane ku bêje na jî fayde nake, hema radibe eşkera dere. Dere mala Pîrê. Dibê:

-Wele Pîrê ez îcar hatim ku tu min bixwî, vê carê niyeta min bi tu dek û dolaban tune ye. Dibê ez dizanim ku ez ji destê te xelas nabim hema tu aniha min bixwe ez jî zû xelas bibim.

Pîrê dibê:

-Wey Kêçokê min tu bi xêr hatî, wey ez bi qurbano! Dibê wele tu îcar hey ji destê min xelas nabî! Pîrê dibê lê meriyên min gîş bi vê heqareta ku te li min kiriye hisiyane. Ji min ra gotine hey tu Kêço digirî tu goştî wî bê me nexwî, gere em gîş goştê wî bixwin ku dilê me rihet be.

Pîrê radibe Kêço di nav kulêv da lûr dike(dinûrîne) û girê dide û di ber mizraxan ra (kêranên arîk ra) dike. Ji qîza xwe ra dibê:

-Rabe êzinga hûr bike arkî(agir) dade, heya ez gazî mervanê xwe dikim û tîm.

Keçik vit vit êzinga hûr dike, lê nikane hûr bike, qewta wê pê da naçe. Kêço bilûra xwe ji ber xwe dikişîne xweş û xweş lê dixwe. Keçik serê xwe bilind dike lê mêze dike, dibê:

-Way tereso tew bilûrwan e jî heyran! Kêço dibê:

-Ez bilûrwan im, lê ez wekî te me. Dibê ez bama(bûma) bi tepkî ra min ê ew êzingana tev hûr bikira.

Keçik dibê:

-Rast tu yê wisa zû hûr kî?

Kêço dibê:

-Erê wele ez ê hema di bistkî da gîşî hûr kim.

Keçik Kêço datine û vedike. Kêço hema tep tep du sê tîpa li êzinga dixwe, hûr dike û datîne wira. Kêço ji

keçikê ra dibê:

-Hela were bikeve nav kulêv ez ê carekî te bilind kim, carekî jî tu min bilind ke, hela tu jî dikanî min bilind bikî yan nikanî?

Keçik dikeve nav kulêv, Kêço hema kulêv li hev lûr dike û keçikê hildide here ku tu naçî. Keçik diqîre:

-Eman, hewar, li min...

Ê çi ji destan tê. Kêço keçikê dibe ji paşê ra, dibê paşa ava min keçik anî ji te ra. Paşa çav bi keçikê dikeve, li bedewbûna keçikê mêze dike, pir kêfxweş dibe. Keçik dike qêrîn û hewar dibê:

-Erd here ezmana û ezman werin erdê ez ji bêyî Kêço kesî mehr nakim. Dibê paşayê çi halê çi, va paşa ji kû ra derket? Dibê law Kêço ma te ez ji xwe ra nerevandim?

Vir da wê da, dikin û nakin keçik paşê qebûl nake. Êvarê birayên Kêço ji ber dewêr tî, dibên:

-Paşa Kêço keçik anî?

Paşa dibê:

-Erê wele anî.

Dibên:

-Te mehr kir?

Dibê:

-Wele keçik min naxwaze. Dibê ez îlle Kêço dixwazim.

Bira çi dane pêşiya Kêço, Kêço bi fenê xwe û bi baqiliya xwe weke vê carê tev hel kiriye. Îcar ji paşê ra dibên:

-Paşa qîza Pîrê ji ber hatiye girtin, Pîrê niha çêtî û pêtiyan ji xwe dike. Dibên paşa ji xêra Xwedê ra Pîrê niha li vira bûya te bidîta ka hela Pîrê çi dikir?

Paşa dibê:

-Ar bi mala we bikeve em ê çer bikin ji Pîrê? Dibê ma kî dikane here Pîra Hût bîne?

Evana dibên:

-Wele Kêçoyê me dikane. Tu aniha bişîni ew ê here bîne.

Kêço digirî:

-Eman, hewar Pîrê li min bi gef e, law wele Pîrê wê min bi saxî bixwe.

Paşa dibê:

-Wele Kêço tu dikanî û tu yê herî.

Ê Kêçoyê reben tiştêk di desta da nema. Kêço dere. Dere mazatê nêriyekî dikire, tîne şer jê dike. Postê nêrî li xwe dike. Dere li ser etara xironeka (zengila) pê ve dike û sandoqeka bi qasi bejna Pîrê jî çêdike û dibe datîne hewşa Pîrê. Bi xwe jî dere diharî xênî(serban). Di roceynê ra(dî kulekê ra) dibê:

-Pîrê! Êhno rebek? (yanî Rebê te kî ye?)

Pîrê dibê:

-Ê ez bi qurbana te me Rebê min tu yî.

Kêço dibê:

-Ez ruhsitîm im, ez qasidê Xwedê me, ez hatime rihê te distînim.

Pîrê dibê:

-Min di gora bavê Kêço da rîto. Dibê nivîn jî tun in ku ez xwe tîkmê(bik-evim navê), Kêçoyê kurê kûçika, nivînê min jî birin.

Kêço dibê:

-Pîrê sandoqek li hewşa te ye, tu bi mirî jî, ez rihê te bistînim jî tu yê di wê sandoqê kevî(bikevî) û herî mierzela.

Pîrê li hewşê dinêre, erê way sandoqek li hewşê ye. Kêço dibê:

-Tu dixwazî ez te tew bi saxî bibim hizûra Xwedê?

Pîrê dibê:

-Wele ez qayil im tu min bi saxî bibî hizûra Xwedê.

Kêço dibê:

-De here bikeve wê sandoqê, derî li xwe bigire, rind qîr û zift ke bira ve-nebe haaa! Dibê ez ê te bi saxî bibim hizûra Xwedê.

Pîrê dere dikeve sandoqê û qêpî li ser xwe rind mezbût(kilît) dike. Kêço tê û bi şîrîtê dikeve ber, sandoqê dide piştta xwe û dere. Postê xwe jî diavêje. Diçe ser pirê. Dibê:

-Pîrê vava kî der e?

Pîrê:

-Ma ez ji ku dizanim kî der e? Ez di sandoqê da me, ez va ye derim hizûra Xwedê.

Kêço dibê:

-Pîrê vira Pira Selatê ye.

Pîrê dibê:

-Ê emrê Xwedê ye. Dibê Xwedê Teala emir kiriye, ruhîstîn min dibe û dibê ez bi saxtî di ser Pira Selatê ra derbas dibim, ez ê êdî ji Xwedê çi bixwazim ji vî xweştir mala Xwedê ye.

Cardin dibê:

-Pîrê!

Pîrê dibê:

-Çi ye?

Dibê:

-Pîrê ma ez Kêço me Kêço.

Pîrê hey diqîre, hey xwe li ba dike, hey xwe çer dike sandoq venabe.

Dibê:

-Kêço min di devê heftê û heft bavê te da riyo, te çer niha diya min û ez

rezîl kirim.

Kêço Pîrê dibe li ber paşê datîne. Dibê:

-Aha ji we ra Pîrê, ez serê we gişta li qûna Pîrê kim, de hela ka hûn ê çî ji Pîrê fem kin.

De îcar Pîra Hût e kî dikane ber bi sandoqê here. Kes newêre bajo ser sandoqê, sandoqê veke. Kêço hema sandoqê li wir dihêle û baltekî jî dide destê xwe û dere dikeve paş heft qêpiya. Paşa dibê:

-Ma lawo ma yek sandoqê veke, ma Pîrê wê gûyê kê bixwe, ma em hezar merî(mirov) li vir in.

Evana sandoqê vedikin û Pîrê dikeve nav vî miletî, lê dixê giştî dikuje, heywên hebe wan jî dikuje û dixwe. Pîrê tevî dikuje tenê pisikeka reş li wir maye û ew jî li vî alî û li wî alî diçe û tê ku xwe ji destê Pîrê xelas bike. Pîrê berê pisikê dide û dibêje:

-Piştê reşê, goştê wê xweşê, piştê reşê, goştê wê xweşê...

Pisîk dibê:

-Pîrê Pîrê tu min nexwe, dibê ez ê ciyê Kêço û qîza te rê(ray) te bidim.

Pîrê dibê:

-Pisîka min were ka li kî derê ne ji min ra bêje bi Xwedê ez ê te nexwim?

Pisîk dibê:

-Pîrê a di paş van heft qêpiya de ne herdu jî.

Pîrê lê dixê qêpiyekî dişkêne, diduyan dişkêne heta tê qêpiyê heftan. Kêço jî baltê wî di dest da ye hazir li paş qêpî sekîni ye. Keçik ji Kêço ra dibê:

-Çaxa te lêxist bi derbkî lêxe û bi kuje, eger tu di derba ewil da nekuji diya min êdî namire!

Pîrê çawa ku derî dişikîne Kêço balte li orta iniya Pîrê dixê. Pîrê dibê:

-Cardin lêxe cardin lêxe.

Kêço dibê:

-Naaa. Edetê me carek e.

Û Pîrê dikeve erdê. Kêço dibê:

-Pîrê ka dermanê vî miletî bêje, te giş kuştiye, hela bêje dermanê ku van rake(saxke) çî ye?

Pîrê dibê:

-Dermanê vî miletî Moriya Şîna histuyê min da ye. Dibê tu vî moriyê di avê da bikî bi kîjanî bireşînî ew ê sax be û tu bi kê nereşînî ew sax nabe.

Pîrehût bi vî gotina xwe ra dimire. Kêço moriyê di avê da dike, dibe bi heywan û wan merivan gişta direşîne, tenî bi herdu birê xwe û bi paşê nareşîne. Herdu bira û paşa dimirin, ê din tev cardin radibin. Kêço jî keçikê li xwe mehr dike û dibe paşa û derbasî dewsa paşê dibe.

Xwelîşoka min li dîwaran, rehmet li dê û bavên guhdaran; ji xeynî şeytanê qula dîwaran.





Shahîne
Bekirê SOREKLÎ

ÇAND

Bêyî guman, li gellek beşên cîhanê
guhertinên mezin yê xwe bi
çandê ve girê didin cih girtine,
lê li hinek welatan dîroka çandî
hatiye parastin û çanda neteweyî
di gellek waran de zindî maye.
Em nikarin bibêjin ku tevahiya
egera neparastina dîroka çandî
li nik Kurdan xwe tenê bi
bindestbûna wan û welatê wan ve
girê dide. Li Asyayê û Afrîkayê
neteweyin hene ku ji mêj ve
xwedan dewlet in, lê li nik wan jî
parastina dîroka çandî hema hema
tune ye. Li milê din, li welatekî
wek Îrlendeyê ku bi sedan
sal tê de Îrlendî bindest bûne û
heta gellekên ji wan nema bi
Îrlendî axaftine, dîroka wan a
çandî ta radeyeke bilind maye



Çanda bi Ç'ya mezin dest pê dîke(culture/kultur) gellek tiştan dixê nav xwe, ji babetên xwarinê bigire ta berhemên wêjeyî. Bi gotineke din, çanda neteweyê wek ya Almanî ji babetên xwarinê yê wek Bratwurst û Sauerkraut bigire ta berhemên muzîkî yê Beethoven, û ji tore-yên civatî bigire ta berhemên Goethe û Şiller dixê nav xwe. Di Almanyaya îroj de mirov dikare xwe bi hêsanî bigihîne agahiyên derbarê hemî beşên çanda neteweyî ya gelê Almanî de. Çanda Almanan di pirtûkxaneyan de, di entîkxaneyan de, di kelayan de, di kilîseyan de û di şûnên bîrhanînê de zindî ye. Li van şûnan mirov xwe bi rêya pirtûkan, belavokan, nivîsaran, şop û nexşe û lidûmayînan dikare ne tenê derbarê çanda dehşal û sedsalekê de lê bikole, lê derbarê ya bi sedan salên di dîroka gel û neteweya Almanan de. Dema mirov xwe di nav leheya (lehî) agahiyên derbarê çanda neteweyê wek a Almanan de dibîne mirov xwe wek Kurdekî biçûk hest dîke û di heman demê de dilşikestî bi ser rewşa çanda gelê xwe de digirî.

Çanda gelê Kurd yeke kûr û berfireh bû û heta ber 50 salan jî milletê Kurd bi gellek awayan ji milletên dirawsê(cînar) cuda bû, lê bi derbasbûna demê re wek berfa li ser çiyayekî bihele, Çanda Kurdan her ku çû ji dewlemendiya xwe wenda kir. Di demên borî de, milletê Kurd bi pirranî bi saya mayîna li herêmên xwe û axaftina zimanê xwe ta radeyê bilind ji asimîlasyonê (helandina di nav komên din de) hatibû parastin. Lê bi mezinbûna bajarên û zêdebûna hejmara xwendekarên di xwendegêhên ku zimanên wan ne Kurdî ye re, asimîlasyon jî berfirehtir bû. Li berevaciya rewşa gelên ku bi kêmasî dêrên wan xwedî li ziman û çanda wan derdiketin, Kurd bi pirranî musilman bûn û ola wan li şûna ku ziman û çanda wan biparêze ew bêhtir ber bi asimîlasyonê ve gêr kirin; çimkî ayet, nimêj, azan û heta bi pirraniya navên kesan be bi Erebî bûn. Îroj ziman û çend taybetmendiyan Kurdan ne tê de, çî nîşanên rêkûpêk ku gelê Kurd rast ji gelên dirawsê cuda raber bikin li holê nîn in. Eger xwe-lyî demê û çerxa felekê zimanê wan jî ji holê rake ji bilî navê "Kurd" tiştek ji wan re namîne. Bi taybetî di nav 50-60 salên derbas bûne de Çanda Kurdan beşeke rengîn mezin ji xwe wenda kir; wenda kir ji ber ku nehat parastin, ne di jiyana rojane de, ne jî bi nivîs. Ji ber ku Kurdan dewlet nebû, ji ber ku stemeke bêhûde li ser wan û çanda wan hebû, û beriya her tiştî ji ber ku gelê Kurd(bi taybetî Kurmanc) bi pirranî nexwende bûn û ne xwediye derfetên qeydkirin û parastinê bûn, Çanda Kurdan di gellek beşên xwe de heliya, ket nav çandên din, ji çandên din xist nav xwe; bû sedem ku beşê wê bi ber reşebayê dem û dewranê bikevin. Di nav sedsalên çûne de bi hezaran mîr û beg û zanyar û navdarên Kurdan mirin û şopa li dû gellekan ji wan mayî wenda bû. Bi saya stra-

nên gelêrî navên çend kesan man, lê rastiya tevahî û agahiyên rêkûpêk derbarê wan û dewrana wan de hatin jibîrkirin. Bi hezaran gund û bajarokên Kurdan hatin û çûn bêyî ku şopeke pêbawer li dû xwe bihêlin. Heta bi şoreşên demên par be, belgehên pêbawer derheqê tevahiya mijarên xwe bi wan ve girê didin de bi şeweyê rêkûpêk nehatin nivîsandin; û va yeka bû egera xwarkirina agahiyên derbarê wan de, hem ji aliyê dewletên serdest û hem ji aliyê Kurdan bixwe ve. Hema jiyana koçerên Kurd, yan ewên ku pez xwedî dikirin bidin ber çavan. Şeweya jiyana wan, peyvên wan bi kar dihanîn, çanda bêrîvaniyê, şîrkilandinê, çortançêkirinê, mûhûnanê, tevnrîstinê, dewarcêrandinê... Bi serî û binê xwe ve bêyî nivîsandin û tomarkirin man. Cil û bergên Kurdî yê deveran, palas û kulav û xaliyên ku Kurdan li deverên cuda çêdikirin, xwedîkirina lawiran, şeweyên nêçirvaniyê û gellek tiştên din ku Kurdan xwe bi hezaran sal bi wan ve mijûl kiribû neketin entîkxaneyan û pirtûkxaneyan. Eger li hinek şûnan ketibin jî, ew di bin navên çandên neteweyên din de ne. Çend berhemên bisînor yê wek Şerefname ne tê de, hinek ji wan ne bi Kurdî, bi saya çend nivîskar û lêkolinerên biyanî bûye ku beşê biçûk ji şopên kevnar yê Kurdan di pirtûkên bi zimanên din de mane, yan ji wan hatine wergerandin. Hema navên mit (şitl) û keskahî û pincara ku di nav 50 salên borî de, bi encama berfirehbûna çandiniyê û sedemên din wenda bûne bide ber çav û babetên hinek lawirên li Kurdistanê nemane. ranana

Bêyî guman, li gellek beşên cihanê guhertinên mezin yê xwe bi çandê ve girê didin cih girtine, lê li hinek welatan dîroka çandî hatiye parastin û çanda neteweyî di gellek waran de zindî maye. Em nikarin bibêjin ku tevahiya egera neparastina dîroka çandî li nik Kurdan xwe tenê bi bindestbûna wan û welatê wan ve girê dide. Li Asyayê û Afrîkayê neteweyin hene ku ji mêj ve xwedan dewlet in, lê li nik wan jî parastina dîroka çandî hema hema tune ye. Li milê din, li welatekî wek Îrlendeyê ku bi sedan sal tê de Îrlendî bindest bûne û heta gellekên ji wan nema bi Îrlendî axaftine, dîroka wan a çandî ta radeyê bilind maye. Bi dîtina min, egerên herî girîng yê wendabûna şopên dîroka çandî li nik Kurdan xwe bi hinek sedeman ve girê didin û du sedemên girîng ji wan ev in:

1. Kurd bixwe bi pirranî nexwende bûne.
2. Dewletên desthilatdariya Kurdistanê kirine bixwe ji şaristaniyê ramyariya bilind û baweriyên adelmendiyeke mirovahî dîr bûne.

Di zimanekî wek zimanê Tirkî de peyva ku ji bo çandê dihat bikarhanîn, "kültür" peyveke biyanî ye. Di zimanê



Erebî de peyvên "theqafe" yan "hedare" ku li şûna çandê dihên bikarhanîn xwebêja durist ya peyva Îngilîzî "Culture" yan ya Almanî "Kultur" nadin... (reh: peyva latîni "cultura" wek "kultûra" dihat xwendin).

Çanda Kurdan yeke devokî bûye û hîn îroj jî ta radeyêke bilind û di gellek waran de, di nav Kurmancan de her weha dimîne. Çanda ku nehê(neyê) nivîsandin û qeydkirin nikare bi sedan salan zindî û resen bimîne. Di nav Kurdan de bi milyonan "têkoşerên siyasî" û şervan hebûne, û hene, lê gelo di nav milyonên ji wan de, ji demên par bigire ta îroj, çend kes hebûne ku xwe bi arşivkirina tiştên derbarê çandê de, qeydkirina têbiniyên derbarê çandê de û nivîsandina li ser çandê mijûl kiribin? Ew berhemên ku çend ciwanmêran li ser çandê nivîsandine jî, gelo çend Kurdan hay ji wan hebin! Ya rast berhemên derbarê Çanda Kurdan de hatine nivîsandin bi pirranî ji aliyê çend biyaniyan ve di sedsalên borîn de hatine nivîsandin. Gelê Kurd û rêxistinên siyasî yên vî gelî bi pirranî derbarê parastina çandê û misogerkirina ku naveroka çanda neteweyî dê bo nîfşên sibe û dusibe, bi kêmasî bi nivîs û belge, di qalibekî resen de bimîne bêyî haydarî, zanistî û tecrûbe ne. Eger îroj biyaniyek ji me bipirse "Çortan li Kurdistanê çawa dihat çêkirin?" Gelo çend pirtûk di dest me de hebin ku em bikaribin tê de bersiva pirsra wî bibînin? Û çêkirina kelpîcan, tepikan, xaliyan, kulavan, babetên xwarin û vexwarinê... li nik Kurdên demên par? Û gelo çend Kurdên bakurî derbarê çanda di nav Kurdên rojhilatî de haydar bin? Û gelo çend Kurdên rojhilatî derbarê jiyana Kurdên binxetê de haydar bin? Em behsa hebûna neteweya Kurd dikin û hemî kêmasiyên xwe dixin stûyê recimên dîktator, ku ne bêyî tawan in, lê gelo çend Kurd bikaribin hema straneke ji beşeke din ji zaroyên xwe re bistrên? Fermo li ser taxeke

şûna tu lê ji çend Kurdan re bibêje: "Ji rindiya xwe ji min re piçekî behsa Çanda Kurdan bike." Hêvîdar im bersivên wan hêviyê di dilê te xwendevanê hêja de vejîne!

Milletekî nexwende kujerê çanda xwe ye, çimkî çand çiqas dewlemend be jî, bêyî xwendin û nivîsandin dê zû dereng ji xwe wenda bike, têkeve bin bandora çandên din; û li milê din, çandên din ê ji naveroka çanda nexwendeyan bibin û bikin a xwe. Lewma gerîna li çareyên parastina çandê bo Kurmancên îroj ji durîşma "Bijî Kurdistan"ê gellekî girîngtir e. Çima? Ji ber ku çanda Kurdan hebe, Kurd nemir in; lê Kurdistanê bêyî Çanda Kurdan bînirx e!

Kurdan pêdivî ne tenê bi fêrbûna xwendin û nivîsandinê heye, lê her weha çandina erf û toreya xwendinê di nav xwe de. Ger Kurd xusetê xwendinê di xwe de bi cih nekin û nebe xwendevanê bi zimanê xwe, nivîskarên berhemçak jî di nav wan de pirr nabin. Ger xwendevan zêde nebin firotina berhemên jî cih nagire, û ta roja ku nivîskar nikaribe xwe bi pereyên firotina berhemên xwe xwedî bike, ew ê nikaribe hejmareke ber bi çav ji berhemên baş jî biafirîne. Û ta hunermend nikaribe jiyaneke xweş bi saya berhemên xwe bijî, ew ê nikaribe gellek berhemên çak ên hunerî jî bo xelkê xwe misoger bike. Di rewşa îroj ya kambax de nivîskarê Kurd ne ku tenê bêpere dinivîsîn, lê bi ser de bizava weşandina berhemekê bo nivîskarê Kurd carine bi îhanetê dagirtî ye. Bi encama vê rewşa li pêş çavan Kurd dibin xwediyên stranbêjine ku heta bi navên CD'yên wan be jî şaş dihên nivîsandin, ku heta stranên wan yê gelêrî jî dihên şaşo maşokirin û zimanê wan yê mayî bi telafuzeke neqenc dihêt birînkirin.

Da ku Kurd bikaribin rê li ber dewamiya wendabûna çanda xwe bibirrin, danîn û bicîkirina bernamêyên rêkûpêk pêwîst in. Mixabin ji bo danîn, birêxistin û bicîkirina bernamêyên rêkûpêk rêxistinên Kurmancan ne amade ne, ne jî xwediyên derfet û kadirên(kadro) pêwîst in. Di rewşa îroj de tenê çirûsêke hêviyê li başûrê Kurdistanê xuya dike. Em hêvî bikin ku berpîrsên li wir ne tenê girîngiyê bidin çandê, lê parastina tevahiya çanda Kurdan bo xwe bikin amanc.

Di nav 20-30 salên par de hinek kesan, koman û çend rêxistinên Kurmancan li gor xwe û derfet û pêkaniyên xwe gavine derbarê parastin û pêşvextina çandê de avêtin, lê ji bo neteweyêke weha mezin ranana (avêtin) wan gavan têrê nekiriye û têrê nake. Di nav Kurdan de cîgirtina şoreşêke hişyarkirina çandî divêt, lê ji ber ku Kurdistanê bi pirranî dewlet nîn e, cîgirtina şoreşêke

weha ne hêsan e. Wek yekemîna gava vê şoreşê berfirehkirina proseya xwendinê di nav Kurdan de divêt. Mebest bi vê yekê ne ew e ku tenê di nav "rewşenbîrên" Kurdan de xwendin û nivîsandina bi zimanê Kurdî zêde bibe lê ew e ku xwendin û nivîsandina bi Kurdî têkeve nav milyonên ji endamên vê neteweyê. Lê gelo cîgirtina proseyeke weha di nav Kurmancên Îroj de ta çi radeyê realîst e? Em êdî hemî dizanin ku zimanê Kurdî yek ji mercên herî girîng yê hebûna neteweya Kurdî ye. Em her weha dizanin ku bi derbasbûna demê re li hinek beşên Kurdistanê, bi taybetî li bakur û rojhilat, Kurd bi hejmarên bilind zimanê xwe ji bîr dikin û dest bi axaftina zimanên din dikin. Her weha aşkere ye ku hejmareke bilind ji Kurdan bi Kurdiyeye şikestî diaxivin. Me hay ji alfabe-yên cuda û zaravayên bi rêzimanên cuda heye. Televizyonên satelîtî yê Kurdî û bernameyên radyo heye ku di van demên dawîn de ta radeyekê roleke erênî derbarê ziman û çandê de di nav xelkê de leyztibin, lê di heman demê de televizyon û radyoyên bi zimanên Tirkî, Erebi û Farsî bandoreke mezin li ser Kurdan heye. Ya rast kêfa gellek Kurdan, hinekên li derve jî di nav de, ji temaşekirina li bernameyên bi zimanê Kurdî bêhtir ji temaşekirina yê bi Tirkî, Erebi û Farsî dihê. Sedema 1'em ew e ku ew ji Kurdî bêhtir bi zimanê din dizanin û sedema 2'yem ew e ku bernameyên televizyon û radyoyên Kurdî yekton û yekşêwe ne, ne rengîn û pîrralî ne.

Rojên îroj malperên Kurdî jî xwediyên leyztina rolên girîng in, sebarek bi ziman û Çanda Kurdan. Hinek karên baş hatine/dihên kirin, lê ew rola mezin ku gellekên ji me ji internetê û malperan hevî dikir, mixabin hîn bi şêweya wekî pêwîst dihat dîtin nehatine leyztin.

Ger di nav Kurdan de daxwaz û derfetên parastina Çanda Kurdan û dewlemendkirina vê çandê hebin, wek li jor diyar bû gava yekem bi berfirehkirina proseya xwendina bi zimanê Kurdî dest pê dike. Ji bo vê yekê beriya her tiştî pirtûk divên, pirtûkên fêrkirina zimanê Kurdî û nivîsandina bi vî zimanî. Bi milyonan pirtûkên bi taybetî ji bo zarokan hatine nivîsandin divên, bi milyonan ji pirtûkên bo ciwanan hatine nivîsandin divên. Xwendin bi zarokan û ciwanan dest pê dike. Di heman demê de amadekirina proseyeke pêdagojî divêt, proseyeke ku li gor wê bi hezaran kes bihên perwerdekirin, da ku têkevin nav tax û seqamên bajaran, biçin gundan û xwe bigihînin dêyan, bavan, xwişkan, birayan û wan fêrî xwendinê û bikarhîna pirtûkên ji bo zarokan hatine nivîsandin bikin. Pirtûk û bernameyên pêdagojî divêt ji siyaseta û propagandaya siyasî vala bin. Ev pirtûk pêwîst e ji aliyê pisporan ve, ji aliyê kesên ku peywendiya wan bi ziman

û şert û mercên pêdagojî re heye, kesên ku derbarê qonaxên fêrbûnê li nik mirovan û mentalîteya nişan de agahdar in, hatibin nivîsandin; bi zimanekî hêsan, bi wêne, bi locîk(vac-mantiq). Li her dera ku fêrkirina zimanê xwendina Kurdî mumkin be, birêxistina kursan divêt. Medyaya Kurdî ya dengî û wêneyî divêt xwe bi salan têkelî vê proseyê bike... Eger dewlet dijwarî û astengan bi rê bixin, amadebûneke rêkûpêk divêt da ku rêxistinên navneteweyî û yê mafên mirovan bihên hawarê... Carreke din dubare bikim ku gellekî girîng e proseya fêrkirina zimanê ji propaganda û hêvotina siyasî vala bimîne.

Ji bo birêxistina proseyeke weha bêhûde derfet û amadekirina bi program û tevdir divên, dezgeh û dayîre divên, û beriya her tiştî pere divê. Amadekirin û birêxistina proseyeke wek ya li jor e bi salan biajo. Gelo Kurdan van derfet û pêkaniyan, kadirên pêwîst û pisporên derbarê amadekirina materyalê pêwîst de hebin? Ger nebin, wê demê li vir û wir gavine dê bihên ranan, li vir û dera han proje dê bihên birêxistin, lê bidestxistina encameke bi hêviyeke mezin dê ne pêkan be. Ji lewre amadekirina kadiran, mamosteyên têgihîşt û pisporan divêt!

Ji bo parastina Çanda Kurdan ji wendabûnê, ji bo lêgerîn û lêkolîna derbarê beşên wenda bûne de, û ji bo zindîhîştin û pêşvexistina çandê bêguman kiryar û ranana gavên din jî pêwîst in. Ji bo wan jî tevdir û plan û dezgeh û kadir divên.

Mebest bi nivîsandina vê gotarê ne raberkirina wêneyeke reş e, lê ew e ku bi kêmasî yê/ya ku vê gotarê dixwîne rewşê bi şêweyeke realîst û rasteqînî bide ber çav û hest bike ku ji bo parastina Çanda Kurdan û pêşvexistina wê xebat û tevdirên bêhûde divên, xebat û tevdirên ku her endamekî/endameke neteweya Kurdî bi xwe ve girê bide.



Amadekar:
Zeyneb YAŞ
Herêm:
Eynberan / Sêrt



"Pirpizê pizê pizê pizê
Yeka min yeka Hemzê
Ya Hemzê kete çalê
Ya min ma dotra salê"



Pirpizê Pizê Pizê...

Hatina biharê, hatina keyf û şahiyê ye ji bona hemû kesî. Ji bo zarokên gundan bihar bendewariya axê, heriyê, mêrg û zevî, dengê çûk û wawîkan e. Di zarokatiya me de gava bihar bihata em dibûn ref û ref. Hinekan pincar diçinî, hinekan ji me kulilkên biharê li serê girikên ku tîrojên rojê pêşî li wan dixistin didan hev; yên rengên wan spî, sor, ximrik(şîrkî) û hinekan jî nêçîrvaniya pirpizêkan dikir. Pirpizêk, karê jîr û zîrekan bû. Bi rengê xwe yê zelal û helemorî yekî zû bi zû ji çolê bida hev, lê nêçîrvanên pirpizêkan ciyê koka wan heta sala bê li hişê xwe dinivîsandin. Nêçîrvanên pirpizêkan rikber bûn, jîr bûn, kê zû bidîta, kê di yek derbê de ferq bikira ew bi ser diket û baqê destê xwe zêde dikir.

Gava nêçîr xilas bibûya keyfa mezin

dest pê dikir. Kê pirpizêk dabûna hev li ser wan dileyîstin, pirpizêk gelek bi qîmet bûn. Pirpizêk sê per e û sê guncî ne, di nav hev de. Mirov kortîkek dikola, dûvika pirpizêkê kurt dikir û di nav du tiliyên xwe de dibir dianî û digot:

"Pirpizê pizê pizê pizê
Yeka min yeka Hemzê
Ya Hemzê kete çalê
Ya min ma dotra salê"

Ku kiras ji nav pirpizêkê biketa, heger kubandî bûya digotin nêr e îsal bê ber e, lê heger vekirî biketa digotin xêr û bera sala bê zehf e. Ango, heger mê bûya xweyê pirpizêkê yeka xwe ji lîstikvana distand, lê nêr bûya dor jî jê diçû û pirpizêka xwe dixwar.

Meselokek

Amadekar:
Zozan BUDAK
Çavkanî:
Gulistan BUDAK
Herêm:
Farqîn / Amed



Dilê kurik ketibû keçikê.
Keçik û kurik xwîniyên hey bûn.
Malbata kurik, ji malbata keçikê heft mêr
kuştibûn. Kurik xwe ranagire,
ji keçikê re nameyekê dinivisîne.
Dibêje:

Keçê roka me avêtiye çikî dûr e.
Şewq û şemalê daye Medîna Minewer e,
Tirba îmamê me yê Resûl e,
Heft heb xweynê mala bavê min
li ser mala bavê te ye,
Ramûsanekî bide min, li min qebûl e.
Qîza xwey neyaran nameyê dixwîne.
Û bersivê didê û dibê,
Kuro tu ne kerkî baş î;
qêmiş nakim te bişînim xana.
Tu ne destekî cilê baş î;
te li xwe kim herim kêf û şahî û dîlana.
Tu ne hespkî baş î; li te siwarbim,
bidim cirîd û meydana.
Tu ne gakî baş î; bi te cotkim,
mehê biharê heta serê nîsan û gulana;
te bişînim berriya Merdînê nav garana.
Here ji xwe re pirs bike; ji heft keşê fila,
dozdeh melê misilmana
Keşî diye ku meriv,
heft xweynê daye bergîdana ramûsanek...
Kurik nameya dilgirtiya xwe dixwîne û dibê;
- Hey gidî neyara qîza neyara!...

250 NIFIRÊN BIDERB



1. Afat bi ser te da birjê
2. Afat bi serê te da were
3. Agir bi derê te keve
4. Agir bikeve mala te
5. Agirê kulê bi mala bavê ketî
6. Aqûtî bi serê te da were
7. Ar bi mala bavê te keve
8. Arî bi konê tekeve
9. Ava reş bi çavê te da were
10. Ava reş binê lingê te ketî
11. Axûzî bi te bê
12. Ba lê ketî
13. Bav û birê te bi te şa nebin
14. Bayê sor li te keve
15. Bê bav bimînî
16. Bê dil û can bimînî
17. Bê kes û bê war bimînî
18. Bê mirad herî
19. Bedena te şîn nebe
20. Bela te dûrî qapiyê me be
21. Bela te ji ber nigê te rabe
22. Bela we ji ber piyê we bê û li kesî negere
23. Bela we ji Xwedê be ji kesî ney
24. Belkî zar pêşa te negrin
25. Belkî zincîra te ji ezmana biqete
26. Ber deriya bimînî
27. Ber miraza rûnenî
28. Ber te da jara maran be
29. Bergê topê li cerge te ketî
30. Bibelqitî
31. Bîbik rijiyayê
32. Bîbikê te birije
33. Birîna reş li canê te keve
34. Birûsk li te keve
35. Birûska salê li te ketiyo
36. Birûska sayî li te keve
37. Brûsk li te xe
38. Canê te zer be
39. Cara têrxwarinî li te tune be
40. Cegera te bişewite
41. Cegera te di devê te ra were
42. Cenazê te rabe
43. Çavê te birjê
44. Çavê te kûr bive
45. Çêtiyê te ber gulla ra her
46. Çêtiyê te ji te da bikeve
47. Çil roj û çil şev bê nan û av herî
48. Çûndin hebe hatin tune be
49. Çûyîn a te be vegeer ne a te be
50. Derdê te hebe, dermanê te tune be
51. Di binê derdan da bimînî
52. Di pêşa te da zarê kurîn mîz neke
53. Li dû heval û hogiran bimînî
54. Emrê te kin û kurt be
55. Ez meytê te hildim
56. Ez te di axa sar kim
57. Hema wisa hêsirê sar bi ser çavê te da were
58. Hestiyê te li hewa be, gostê te li erdê be
59. Hişko biringo bibî
60. Hundirê te xiş xiş be
61. Îlancix di gewriya te da were
62. Jana zirav li te keve
63. Kelem li çavê te keve
64. Kevçiyê te qet şil nebe
65. Kevir û kuçik li te bibarin
66. Kezeba te di devê te ra were
67. Kezebres
68. Keziyên te li qirika te bilefin
69. Koka te biqele
70. Koşka li ber kotî bûn be
71. Kul devê xwe di devê te ke
72. Kula dernexwîn li te xe
73. Kula Helebê li mala te keve
74. Kula kor li mala te ketî
75. Kula Şam û Helebê li can û bedena te kar be
76. Kurm guh û bedena te bi xwe
77. Malmîrat bî
78. Mala te here ber mîratê
79. Mala xwelî be, xwelî jî li ber bayê be
80. Malik ne ava be
81. Marîfeta te li mala bavê bimînî
82. Mejiyê te di çavê te ra were
83. Mêş bi firaqa te nekeve
84. Mirad di çavê te da bimîne
85. Mîrata te ji şîrîkan ra bimîne
86. Mirî tu bimrî
87. Nalet li şîrê te be
88. Nan bibînî, dew nebînî, dew bibînî, nan nebînî
89. Nanê ce û dewê tîrş bi dest nekeve
90. Nanê garis bi destê te nekeve
91. Neynûkên te dirêj nebin

92. Ort ocaxê te biqele
 93. Oxira te ya xêrê nebe
 94. Parî li devê te be, hêsir li çavê te be
 95. Perçê mezin guhê te be
 96. Pergala te belav be
 97. Pizrika pîs di çavê te da were
 98. Pizrika xerab lê derketî
 99. Qansêr li qûna wan keve
 100. Rizqê te li xezalê be
 101. Roj li te neçe ava
 102. Roja te ya xweş çav êş be
 103. Roja xweş nebînî
 104. Serê te bikev erda reş
 105. Sêwiyê serbirişk bî
 106. Stara te tune be
 107. Stûxwar li ber deriyên bimînî
 108. Stûyê te bişkê
 109. Stûyê te di bin te da bimîne
 110. Şape ser te da bê
 111. Şêx Evdilqadrê Gêlanî li te xe
 112. Şûna warê te bibe cihê pepûk û kundan
 113. Tasek av bi destê te nekeve
 114. Taya mirinê te bigre
 115. Te va eydiya dî tu eydiya di nebînî
 116. Tepelika qafê te rabe
 117. Têrbûna te roja eydê be, ew jî bixwî vereşî
 118. Teyrok li serê te bibare
 119. Tiliya te bifire
 120. Tîra Bavê Kal li te rabe
 121. Tîra Xwedê li te keve
 122. Tîra yekcarî li te rabe
 123. Tîrek li te rabe tu ne bidî tu ne bistînî tu beqa nekî
 124. Tiştê ku te xwar li te bibe quzilqurt
 125. Tiştê te bi xelkê bimîne
 126. Tofana ezmana lê ketî
 127. Tofana Nuh li te rabe
 128. Top lê ketî
 129. Topa şeşxane li te bikeve
 130. Topa Xwedê li te bikeve
 131. Toqa nehletê di hustiyê te da be
 132. Tu a xwe ji xwedê bibîne
 133. Tu azana melê sibê nebihîzî
 134. Tu bê av û bê ked bimînî
 135. Tu bê dê bimînî
 136. Tu bê kefen herî
 137. Tu bê mêr bimînî tu bê mirad herî
 138. Tu bê Yasîn herî
 139. Tu ber xwe nebînî
 140. Tu bextreş bî
 141. Tu bi devê gura herî
 142. Tu bi dilê xwe şa nebî
 143. Tu bi goştê canê xwe bikevî
 144. Tu bi gura ra bizûrî
 145. Tu bi kezeba xwe bigrî
 146. Tu bi menencîtê bikevî
 147. Tu bi qermicî
 148. Tu bi şîrê kera bikevî
 149. Tu bî, trê di ser te ra here
 150. Tu bibelqîtî
 151. Tu bibî edû û li vê dinyayê bikevî
 152. Tu bibî kenê xelkê
 153. Tu biçî tu neyê
 154. Tu bigerî lê ji derdê xwe re derman nebînî
 155. Tu bihelisî
 156. Tu bihetikî
 157. Tu bimînî bê îman
 158. Tu bimînî bin erebê da
 159. Tu bimirî
 160. Tu biteqî
 161. Tu bixeniqî
 162. Tu bixwî û nekî derva
 163. Tu car riya te rast neçe
 164. Tu cara ox nebêjî
 165. Tu çêtîçêtî bibî
 166. Tu derbeder bî
 167. Tu di avê da bixeniqî
 168. Tu di binê erdê kevî
 169. Tu di mal da bimînî
 170. Tu di nav alemê da rezil bibî
 171. Tu dîn bibî bi çola bikevî
 172. Tu dîn û eware bibî
 173. Tu ferç bibî
 174. Tu gilê gilêyî bî
 175. Tu heqê xwe bidî derzî û dermana bidî ser xwe
 176. Tu herî, ciyê te Wêl Deresî be
 177. Tu herî eqreb bi te bigre
 178. Tu herî gurê çola te bixwe
 179. Tu herî mal zarûkê xwe nebînî
 180. Tu herî mar bi te bigre
 181. Tu herî qijik û qertel goştê te bixwe
 182. Tu herî xebera te a reş were
 183. Tu hewcê ker û kûçikan bî
 184. Tu hewcê tasek avê bî
 185. Tu îfleh nebî
 186. Tu ji cî ranebî
 187. Tu ji herdu çava bibî
 188. Tu ji heval û hogiran bimînî
 189. Tu ji keda xwe nexwî
 190. Tu jî şewata dilî bibînî
 191. Tu ji virda herê ji wê da neyê




- | | |
|--|---|
| 192. Tu ji wî halê xwe nefilitî | 223. Tu têkevî ber destê min |
| 193. Tu karekî li ber qapiyê xwe nebînî | 224. Tu tucar têr nexwî |
| 194. Tu ker û lal bibî | 225. Tu war wenda bî |
| 195. Tu kor bibî | 226. Tu wariş herî |
| 196. Tu kotî bibî | 227. Tu weremî bibî |
| 197. Tu kurmî bibî maşalê | 228. Tu wesle weste bibî |
| 198. Tu lezetê qet nebînî | 229. Tu xax û tune bî |
| 199. Tu li bexreşiyê bikevî tu li ber avê herî | 230. Tu xêrê ji xwe nebînî |
| 200. Tu li piya nan bixwî | 231. Tu xêrê ji bextê xwe nebînî |
| 201. Tu muhtacê bav û bira bî | 232. Tu xêrê ji canê xwe nekî |
| 202. Tu muhtacê neyara bî | 233. Tu xêrê ji canê xwe nebînî |
| 203. Tu nanê bi rehetî nexwî | 234. Tu xêrê ji emrê xwe nebînî |
| 204. Tu nebî zava | 235. Tu xêrê ji jina xwe nekî |
| 205. Tu perçe perçe bibî | 236. Tu xêrê ji kurê xwe nekî |
| 206. Tu pêxwas û bê war bimînî | 237. Tu xêrê ji mala xwe nebînî |
| 207. Tu piçik û parî bibî | 238. Tu xêrê ji mala xwe nekî |
| 208. Tu qanqiranî bibî | 239. Tu xêrê ji mêrê xwe nekî |
| 209. Tu qe(qet) mezin nebî | 240. Waqîniya zaran li ber guhê te nekeve |
| 210. Tu qe têr nexwî | 241. Warê te qet hêşîn nebe |
| 211. Tu qe mîrada nebînî | 242. Xaniyê bavê te tep be |
| 212. Tu qijik û pepûk bibî | 243. Xêrnedî bî |
| 213. Tu qir bibî | 244. Xêrê ji bedena xwe nebînî |
| 214. Tu quncikê cihenemê da bişewitî | 245. Xêrê ji te nebînim |
| 215. Tu rezîl û riswa bibî | 246. Xwedê ganê te bistîne |
| 216. Tu rûspî nebî | 247. Xwedê tu bendan bi destê te veneke |
| 217. Tu satlî canî bî | 248. Xwelî li serê te be |
| 218. Tu seqet bimînî | 249. Xweş bî, tim li ber destan bî |
| 219. Tu serê xwe daynî ranebî | 250. Zuriyeta te biqele |
| 220. Tu sêwî bimînî | |
| 221. Tu sîbehê nebînî | |
| 222. Tu têkevî ber desta | |

Berhevkar: Hîlmî AKYOL

ÇÎROKÊN NAVLEKAN⁽²⁾

Palaso mirovekî
di halê xwe de bûye.
Hinekî navsere û
bê kar û bar bûye. Bi vî
awayî heta êvarê li ber
dîwaran, li bin siya
daran û di quncik û
axkolkan de xwe diavêt
erdê. Lê taybetiyeke wî
ciwamêrî hebûye,
tu caran bê palas
nedigeriya.
Pistepista kê ji ku
bihata, palasa wî di
bin cengê wî de bû û
ew li wir bû.

....



Mem MUKRÎYANÎ

Palaso (Mêrdîn):

Palaso mirovekî di halê xwe de bûye. Hinekî navsere û bê kar û bar bûye. Bi vî awayî heta êvarê li ber dîwaran, li bin siya daran û di quncik û axkolkên de xwe diavêt erdê. Lê taybetiyeke wî ciwamêrî hebûye, tu caran bê palas nedigeriya. Pistepîsta kê ji ku bihata, palasa wî di bin çengê wî de bû û ew li wir bû. Dema kê jê re bigota: "Kuro ma tu qet nikarî li ser axa sor, gîhê an jî kevirêkî rûnê?" Digot: "Bila pot û pertelên min gemarî nebin." Hingî paqij bû xwe bi çilpizkan dadiweşand. Ji jina xwe jî pir hez dikir. Navê wê Xezalê bû. Carinan jî digot: "Ji bo ku Xezal'a min nebetile ez cilên xwe gemarî nakim."

Îcar rojekê di civata ber dîwaran de yekî bin emrê wî jê re dibêje: "Xalê Palaso wellehîn dê vê palasa bibe kefenê te." Ev gotin li zora wî dihere. Dibêje: "Yê ku ji niha û pê de ji min re bibêje Palaso ez" û xebereke çivir jê re dide û didomîne: "Hûn çima ji min re dibêjin Palaso? Ma hûn eyb û fedî nakin."

Ji ber vê navlêkê rojekê dihere cem melê. Ji melê re dibêje: "Mele wellehîn tahma min di destê gundiyan de nema ye. Divê tu rûyekê bi ber min bixî û çareyekê em ji vî rewşê bibînin. Aqilekî bide min, ez destên te radimûsim. Em dikarin çawa pêşiya vê rewşê bigrin?"

Mele jî dibêje ciwamêr: "Divê tu mewlûdekê bidî û bangî hemû gundiyan bikî." Ew jî dibêje: "Ew ê mewlûdek bibe derman? Ez ê ji vê navlêkê xelas bibim?"

Mela Dibêje: "Erê erê. Dema tu mewlûdekê bidî dê hemû kes pê bihese. Herkes ê ji te bipirse bê te mewlûd li ser çî niyetê daye Xwedê qebûl bike. Tu yê jî bibêjî ji bo ku ji îro û pê de êdî kes ji min re nebêje Palaso min mewlûd daye, va ye ez we hemûyan pê dihesînim."

Li ser vê pêşniyara melê radibe mewlûdekê dide. Hemû nas û dostan vedixwîne mewlûdê. Hemû tîn, xwarîna xwe dixwim, civat digere, henekan dikan. Palaso jî dibêje: "Hey min giş li vir, di mala xwe de asê kirine, ka ez niyetê xwe ji wan re vebêjim heta belav nebûne." Bi dengê melûl û li bergerîna dibêje: "Gelî mêvanên ezîz! Ji mala xwe heta vira we pê li herdu çavên min kiriye. Hûn di ser ser û çavên min re hatine. Niha hûn tev meraq dikan ku min mewlûd li ser çî niyetê daye." Civat dibêje: "Erê welleh te xweş got." Yek dibêje: "Te ji bo çî niyetê daye Xwedê qebûl bike!" Yekî din dibêje: "De hema çî dibe bila be, Xwedê qebûl bike. Duayên wan dirêj dibin." Dor nayê Palaso da ku niyeta xwe ji wan re vebêje. Civat dike ku belav bibe, yekî stû-

dewke(qirikdirê) qirika xwe ji nava civatê dirêj dike û ji bo ku civat pê bikene bi qerfî dibêje: "De hema te li ser çî niyetê dabe Xwedê qebûl bike Palaso." Gava ku dibêje: "Palaso" Weke tu xencerekê li kezeba wî bixî. Xwe bi xwe dibêje: "Min mewlûd jî da min xwe ji van xerabmalan xelas nekir. Ez ji ber gotinên wan bi ku de herim?" Palaso radibe mala xwe dide hev û ji gund bar dike. Ev Navlêka bûye sedema koçkirina Palaso!

Bavê Pîrekan (Mêrdîn):

Bavê Pîrekan kesekî betal, teral, di xwe re nedî û gellekî çav li xwe bû. Îzzeta canê xwe pirr dizanî, av di zikê xwe de nedikeyan. Ne tayê zilaman bû, li civata zilaman rûnedinişt. Were ew ê kufletên wî heta êvarê li nav erd û eyarê xelkê jê re bişuxuliyana ew ê jî heta êvarê li civata pîrekan bûya, galegal û gotin bigeranda û fesadî bikira. Ji ber ku kar û îşkî nedikir serê sibehê çawa rabûna çavê wî li quncik û dikên civat û rûniştinê digeriya. Ku kes tune bûna guhê xwe dida der û dorê bê ka dengê jinan ji ku derê tê. Li benda pistepîstekê bû, ku xwe lê bigre û xwe bera wê hêlê bide. Tim û tim karê wî ev bû. Hingî li civata jinan rûniştibû jinan ew baş nas kiribû, tu kesan xwe jê venedigirt, tiştêkî xwe jê venediştartin. Bi qasî hûn bixwazin ji jinan re sernerm bû, li wan guhdarî dikir û peyvên wan diçûn serê wî, lê li hember pêkirin û gotinên mêran diinîti(aczî dibû) û li wan guhdarî nedikir. Weke jinekê li nava pîrekan cih digirt, civat û henekên xwe dikir û ji halê xwe memnûn bû. Bes ji bilî zayenda wî di navbera wî jinan de tu tişt nemabû. Jin jî elîmîbûnê û li pey diçûn. Dida pêşiya jinan ew mal bi mal digeran din. Mêran jî dizanî ku tu xisar jê nayê dengê xwe pê nedikirin. Gundiyan ew bi halê wî yê heyî, qebûl kiribû.

Dîsa weke her roj xwe digihîne çend pîrekên li ber dîwêr û dibe leqelega wan qal û bahsa însanan dikan. Bavê Pîrekan li civatê sor bûye, ga(geh) xwe bi dek dike, galegalan ji ya kêleka xwe ya rastê dibêje û bi dengê nerm di guhê wê de dike pistepîst, ga niqûçekê li ya rexa xwe ya din dixê û bi awayekî bêhitî xwe çarqat dike û heyirî, tiştinan ji wê vedibêje. Di wê kêliyê de pênc şeş zarokên heft heşt salî jî, ji xwe re li rex wan jinên ku civat gerandine dilîzin. Ji wan zarokan yek jê bala wî li ser civata jinan, rewş û tevgera Bavê Pîrekan bûye. Ev rewşa wî bi wî zarokî pir seyr tê. Zarok gellekî mizûr û bêhawe bûye. Dihere ji dêya xwe re dibêje: "Çima di nava ewqas jinan de mêrek tenê he ye û her roj li cem wan e. Ma viya bavê pîrekan e?" Dêya wî her çiqasî jê re dibêje: "Eyb e, fedî



ye kurê min, tu çawa weha jê re dibêjî? Zilamê mezin e, di şûna bavê te de ye.” Lawik dibêje: “Na, li gorî ku her roj di nava pîrekan de ye û ji wan re diştexile, nexwe ew bavê pîrekan e.”

Piştî ku zarok li ber çavên jinan û li bal Bavê Pîrekan van gotinan dike, hinek pê şer dikin, hinek jî pê dikenin. Di here ji hevalên xwe re jî dibêje ku wiya Bavê Pîrekan e. Ew zarok li der û dorê navlêka wî belav dikin û êdî herkes jê re dibêje Bavê Pîrekan.

Nalo (Mêrdîn):

Weke her roj di wextê nimêjê de radibe nimêja xwe dike, xurîniya xwe dike û dikeve rê diçe xanê. Xana wî ya ker û qantiran hebû. Kesên ku êzing ji bo firotinê dibirin bajêr ji wan re digotin bajarvanî, piştî ku êzingên xwe difirotin ker, hesp an jî qantirên wan ên ku wala dibûn ew dibirin xana Nalo. Xana Nalo li navenda bajêr bû. Ji bo êzingvan an jî bajarvaniyan rawestgeh bû, li wir dicivyan, civat di-

gerandin û di heman demê de ji bo firoşger û simsarên hespan bazareke baş bû. Sinc û exleqê Nalo jî xweş bû, dîlfireh û rûken bû. Jixwe ji ber vî exlaqê wî herkesî xwe lê digirt û diçûn xana wî. Îcar Nalo li xana xwe heywan jî nal dikirin. Him heqê xanê ji wan digirt, him jî yên ku nalê heywanên wan ketibûn ew nal dikirin û heqê nalbendiya xwe jî ji wan digirt. Gellekî bi nav û deng bû. Hema bibêjin ku herkesî pesnê wî dida di warê kar û pêşeyê wî de. Hingî ku heywan nal kiribûn, bi taybet jî heywanên ku wî ew gellek caran nal kiribûn ew baş dinasîn. Hema em dikarin bibêjin ku bi fialên hemû heywanan dizanibû.

Dîsa rojekê êzingvanek dihere bajêr, barê xwe yê êzingan difiroşe, heywanên xwe dide pêşiya xwe û dihere ber xana Nalo dide. Li xanê lê hay dibe ku nalê qantireke wî ketiye. Ji Nalo re dibêje: “Bi qurbana çavan, ez ê herim sûkê, heta ez vedigerim bi xêra dê û bavê xwe hema qantira min nal bike, simên wê bila neêşên.” Ew jî dibêje: “Li ser ronîya min, here oxira te ya xêrê be.”

Xwediyê qantirê dihere sûke, Nalo jî dest bi nalkirina qantirê dike. Kêr, kertîk, çakûç, bizmar û nalê xwe tîne li ber xwe datîne. Hukma xwe lê xweş dike û destê xwe diavêje sima qantirê ji erdê bilind dike. Pêşiyê bi kêrê binê simê qantirê diqusîne û dixeritîne. Tu nabêjî gava ku Nalo kêr avêtîye binê simê qantirê derba wî kûr çûye û canê qantirê êşiyaye. Nalo xwe dirêjî nalê li pişt qantirê dike. Wê gavê jî mêşek keran tê xwe li ser teriya qantirê datîne. Heywan nihnihiyan dike, ji ber diinitîne. Îcar qantir him ji ber pêjna li pişt xwe, him ji ber êşa simê xwe û him jî ji ber mêşa keran a ku rehetiyê nadê, hema lingê xwe yê dawîn ê rastê bilind dike û bi simê xwe ya nalkirî zîtîkê li textika eniya Nalo dixwe. Wê demê Nalo xwe hew dibîne û ji xwe dihere. Tiştêk nayê bîrê. Piştî qederekê yên ku diherin xanê û tên pê dihesin ku wa ye Nalo li erdê ye û xwîn ji eniya wî diherike. Tawilê wî radikin nexweşxaneyê da ku eniya wî derman bikin. Piştî dermankirinê çend hefte di ser re derbas dibin, Nalo dîsa dest bi karê xwe dike. Lê êdî ji ber wê zîtîka qantirê, şopa nalê wê mîna mohrê li ser eniya wî dimîne. Yên derdor û yên ku erca wan lê dibihurî, bi qerfî jê re digotin; "Lo apo! Rehme rast bibêje, te çi kir ji qantirê ku zîtîk li te xist? Ji ber vê bûyera ku bi serê wî de hatiye navlêka wî bûye Nalo.

Hewdiko (Mêrdîn):

Di zarokatiya xwe de wer li çol û çepelan mezin bûye. Heta êvarê di nava pez û dewaran de bû. Ji bilî zarokên

malê yên ku car caran lê vedihewiyan pê ve wî însan nedidîtin. Divê em ji bîr nekin ku hawirdora mirov, teşe dide mirov û ji hawirdora xwe hînî gellek tiştan dibe. Hewdiko jî li pez, çêlek, mirîşk, şamî û mîhan dinihêre ku çawa avê vedixwin. Dema ku bermîla avê li ber wan hebe ji bermîla avê, gava ku bermîl li ber wan tune be wan ji hewdik, goncal û kortalan av vedixwar. Hewdiko herçend ku zarok be jî zîq li heywan û wan tevgerên wan dinihêre, wan yek bi yek dixwe hişê xwe û roj bi roj ew jî weke wan, xwe noqî erdê dike û dirîstî avê dibe. Yên malê; dê, bav, xwişk û birayên wî herçend ku pê dixeyidîn, nedihîştin derkeve derve û li ber bûn jî, mixabin ne pêkan bû ku her deqqe û saetan li ber bin, ji ber kar û emelê xwe. Hewdiko heta şeş saliya xwe wer li çolê, ji mirov û qebebali-xiyê ve dûr û di nava heywanan de mezin bû. Di heft saliya xwe de divê dest bi dibistanê bikira. Dest pê dike. Lê herkes şêwaz, rabûn û rûniştina wî, tevger, bertek û hovanetiya wî dibîne. Ji hemû xwendekarên dibistanê cuda ye. Zarok ji xwe re pê dikenin, henek û qeşmeriyên xwe pê dikin. Lê ne li ser bala Hewdiko ye. Ew jixwe nuh bi însanan hesiyaye û gellekî kêfxweş e. Zarokên dibistanê gava tî dibin diherin kaniyê, devê xwe dixin lûleya kaniyê û avê vedixwin, lê Hewdiko çongên xwe dide erdê û deverû xwe dirîstî avê dike. Zarokên hevalên wî, vê rewşa wî cara ewil dibînin. Bi wan gellekî seyr û sosret tê, lê bêhitî dimînin. Herçiqasî jê re dibêjin ma tu çima ji hewdê avê vedixwî? Were ji lûleya kaniyê avê vexwe jî, Hewdiko li wan guhdarî nake. Li ser kaniyê, li ser zina-



ran, li ber dibistanê, li ser banê xênî, li çolê hema hûn bibêjin li ku, dema ku tî dibe avê li ku derê bibîne xwe noqî hewdikê dike û têtê ava xwe vedixwe. Kes nikare wî qanih bike da ku dev ji vî tîbhê(sinc) xwe berde. Heta têtê pola sisêyan. Di pola sêyem de mamosteyekî wan he ye, car caran li nava gund digere, haya Hewdiko jê tune ye. Mamoste jî diranên wî di qirika wî de bûn, korfesend bû, zarok gellekî jê ditirsiyan. Ciyekî ku pêjna wî lê hebûya zarok revî revî jê direviyan. Îcar di wê bîstika ku mamoste di kuçeyên nava gund re derbas dibe, Hewdiko jî devê xwe dixwe hewda dewaran û avê vedixwe. Mamoste çawa çav lê dikeve dengê xwe nake û ber pê dihere. Mamosteyê bêwîjdan di ser avê de bi kerika guhê wî digre, wî ji ser avê radike û bi şîmaqan li rûyê wî dixwe. Hewdiko gêj dike û wî berdide. Ji wê rojê şûnde êdî Hewdiko ji hewdikan av venexwar. Ji hewdikan av venedixwar lê êdî navlêka wî ji zû de bûbû Hewdiko.

Dêmjiyo(Dêm-jî) (Mêrdîn):

Ev kesê ku navlêka Dêmjiyo lê hatiye kirin, mêrikekî deştî ye. Dostekî wî yê çiyayî he ye. Biraktiya wan ji berê de ye. Birakê wî yê çiyayî hercar jê re dibêje: "Birako ma biraktiya me bi gotinê ye? Ka carekê were welatê me, em jî mazûnaniyê ji te re bikin, te bikin mêvan." Dêmjiyoyê deştî dibêje: "Ser çavên min, ez ê rojekê bi xêr werim."

Roj di ser hevdtina wan re derbas dibin, meh derbas dibin, sal derbas dibin, rojek ji rojên Xwedê Dêmjiyo xwe dide hev ku têkeve rê, here seriyekî bide birakê xwe yê çiyayî. De îcar zemanê berê telefon tune bûn ku gava mirovek an jî malbatek bixwaze here mêvandariyê ku mazûvanê xwe haydar bike. Hema diket rê û diçû, ew û siûda xwe. Dêmjiyo jî dikeve rê û dihere. Ciyê ku divê here ango gundê birakê wî, bi qasî qonaxa du rojan e. Dikeve rê kup û kup û kup... dihere. Lê dibe şev, li gundê pêşiya xwe, xwe li deriyekî diqewimîne. Li wir dibe mêvan. Serê şeveqê radibe û dîsa dikeve rê diherese... her dihere...

Şeva duduyan jî nagihe gundê birakê xwe, li rê rastî konê koçeran têtê. Dibe mêvanê koçerên li zozên yên ku di kon de dimînin. Têvî Dêmjiyo dibin du mêvanên koçeran. Yê din jî etar e(çerçî). Dêmjiyo gellekî birçî bûye. Koçerên mazûvan piştî bi xêrhatinê jê dipirsin: "Ya mêvanê qedirbilind tu ji rê hatiya niha tu birçî bûyî, hema Xwedê çî qismet kir bila kevanî ji te re bîne, pariyeke nê di ber dilê xwe bixe, ka bê heta sibê Xwedê çawa dike." Li ser vê

pêşniyara koçeran Dêmjiyo kêfxweşiya xwe tîne zîmên û bi duayan erê dike ku birçî bûye.

Tu nabêjî panzdeyek berê gur xwe li hevşiyê(hevşo ango stareya pêz) koçeran diqewimîne, ji ber ku xwe nagihîne pez gayê wan birîndar dike û birîna wî gellekî xedar bûye. Li ser vê yekê kêrê diavêjin stûyê wî û serjê dikin, dikin qismetê zarokên xwe. Ji goştê wî gayî şivek mabû, ew jî wê şevê xistibûn beroşê dabûn ser êgir ji bo mêvanê xwe yê etar, lê bi qasî niv sanîk(sênîk) ji ber wan mabû. Ew xwarina ku mabû germ kirin û anîn danîn ber. Dêmjiyo; ji birçîna serî lê werimiye, tu dibêjî qey ji xelê filitiye dadide xwarinê û gepan lê diwerimîne. Çend pariyên goşt yên ku di nava avdonkê de ne dixwe, lê ber dilê wî nagire, nefsa wî kor nabe. Pariyekî din yê goşt him mezin û him jî dirêj di nava avdonkê de mîna masiya şematokî dihere û têtê. Dêmjiyo her ku kevçiyê xwe diavêjê goşt ku derxe bixwe, ji ser kevçiyê wî diherike sanîkê. Piştî çend caran çîz dike. Destê xwe diavêjê. Bi destan jî heta zevt dike kezebresî dibe. Taliyê bi elf û du belayan zevt dike û dibe devê xwe. Perçeyê goştê ku di destê wî de ye tu nabêjî jîya(reh/kejî) stûyê gayî ye. Mîna lastîka çûkan zer, nerm, şematokî ye û nayê jêkirin. Dêmjiyo him ji birçîna, him ji bo îsraf nebe, him jî ji ber lê bûye rik divê wî pariyê jiyê bixwe. Serê pariyê jiyê dixwe nava diranê xwe û dikişîne, ji nişkan ve seriyê din ji destê wî dişemite û mîna lastîkê dibê şerepppp... li dêma(gep) wî ya çepê dikeve. Dîsa dikişîne dîsa dibe şerepppp...Dêmjiyo pirr li ber xwe dikeve, fedî dike. Radibe pariyê jiyê tev dixwe devê xwe û di nava diranên xwe de dike bihêre. Li çî fêde, tu wî jiyê bixî mêngenê jî nayê çerçekirin û hêrandin ji ber ku lastîkî ye. Hîn di devê wî de ye, dibêje: "Ez ê destê xwe bişom." Gava dihere derve ku destê xwe bişo, hema ji devê xwe diavêje derve ber kûçikê, serê xwe jê rehet dike. Li xwe dike sibe û bi berbanga sibehê dikeve rê dihere, berêvarî digihîje mala birakê xwe. Lê li ser dêma wî şûna şebota(şiva ter) jiyê mor bûye.

Etar roja din dikevê rê, gund bi gund digere. Ew ber bi deştê ve dihere, Dêmjiyo jî ber bi çiyê ve dihere. Etar dihere kîjan gundî li wir qala serpêhatiya Dêmjiyo ji gundiyan re dike, ji bo ku li dorê vehewin û ji xwe re pê bikenin.

Heta Dêmjiyo vedigere welêt, nava zarokên xwe, navlêka wî berî wî gihîştîye nava gundê wî û lê belav bûye. Ji ber ku jî li dêma wî ketiye, ji wê rojê û vir de navlêka wî dimîne Dêmjiyo. Li ser zar û zimanan, dikeve nava sih û sê diranan û digere li erd û asîmanan.

BAVO JÎ SÎR KUTA

Hebû tune bû. Keçîkek tiral hebû. Ji xeynî xwarin, vexwarin û raketinê tu kar û barên wê tune bûn. Keçîk êdî berzewac bû. Rojekê xwazgîniyê keçîkê hatin û li ser cila mala bavê keçîkê rûniştin û gotin: "Em keça we dixwazin, hûn dibêjin çi?" Dê û bavê keçîkê lê vegerandin: "Heyran, ji me bigerin û herin mala xwe, keçîka me ji we re nabe, heta nîvro radikeve, ne karekî dîke û ne jî şîvekê dizane. Ew ê çawa ji we re bibe bermalî?" 'Xwazgînê jê negeriyân û gotin: "Bila be, hûn bidin me, bila qet karekî neke. "Dê û bavê keçîkê rabûn keçîk danê. Di navbera sê rojan de daweta wê çêkirin û birin. Keçîk roja yekem ji xew ranebû karekî nekîr, malbatê xwarin nedayê. Roja duyem rabû hinekî derdora xwe da hev, keriyek na danê. Roja sêyem firaq şûştin hinek nan û şîv danê. Roja çarem karê malê gişt kir û qedand, zîkê wê têr kirin. Keçîkê fahm kir

ku di vê malê de kî kar neke şîvê nadinê. Rojekê bavê keçîkê çû mêvandariya wan. Keçîk fikirî û xwe bi xwe got: "Niha bavê min karekî neke, ew ê şîvê nedin bavê min." Hema zûzûka rabû sîr û sîrkut anî û danî ber bavê xwe û jê re got: "Bavo tu jî van sîran bikute." 'Bavê wê lê ecêb ma, lê dîsa jî dengê xwe nekîr û sîrên xwe kutan. Ku wexta şîvê nêzîk bû serê gavê di ber xwesû û xwezûrê xwe re çû û hat got: "Bavo jî sîr kuta!"

Amadekar: Pinar YAMAN

Çavkanî: Nazîfe ÇAKIN

Temen: 51

Perwerdehî: Nexwendê

Herêm: Gundê Giya(Mezra Bervan)/ Erxenî / Amed

Sal: 2015



GONÇE

Waxte domanîna min de ma gonçe kay kerdênê. Kayê gonçe zimistan de serê bon de kay bîyenê. Zimistan de vore zaf varene, her cay de vore bîyene. Vora serê bon camerdon hura eştênê. Serê bon tij ke eştêne ja. Ma domen ge ge serê bonî de şer(temaşê) kerdene bîyo ja, nebîyo. Eke bîyo ja ma domên amenê telewe, kayê gonçe kay kerdene. Gonçe çar, ponc domenon ra kay bîyene.

Gonçe kayê zimistanî yo. Zimistan de her ca vor a. Îra gore cayê kaykerdene çin o. Nara gore nû kay serê bon de kay bîyono.

Kayê gonçe wuşîr-ra kay bîyono. Çar, ponc domonon ra yew domon qala de maneno. Nejdîyê nem metre wuşîr xêz woncenê ser ro nane ro. Qala ra des gam


dûrî domenê bîn vindenê. Wuşîrê ke destê xo ra kunê(nane pa) wuşîra ke qala ra. Wuşîra qala wazene ke xêza qala ra veze. Wayîrê qala hete ra wuşîra qala ano hurînde nano ro, hete ra kî domonê ke wuşîra xo eştêbî qala neverdano bicere. Kamcî domen ke ama wuşîra xo gurete verdano dime. Eke xona(hîna) ca ne-reşt(nêresa), dest na pa nara kî o yeno qala rê beno wayîr.

Nû kay na kay beno.


Arêkerdax: Hatayî DEMÎR

Herêm: Pilemuriye / Dêrsim

Serre: 2015



DUAYÎ Û ZEWTÎ



Arêkerdoxe:
Leyla GULTEKÎN
Ca: KÛ /
Pasor /Amed

Yusuf Alkan

DUAYÎ

- ▶ Homa to razî bo
- ▶ Homa to verdo
- ▶ Homa biyaro vernî to
- ▶ Homa to bixeferno
- ▶ Çira bo vernî to de bo
- ▶ Nan û awe bo bêro vernî to
- ▶ Homa dîn û îman bido
- ▶ Homa derdan nêdo to
- ▶ Homa tûtanê to verdo
- ▶ Homa warê to hêşîn kero
- ▶ Homa fehîm û fereset bido tûtê mi
- ▶ Cefê to beredayî nêşêro
- ▶ Homa cefê ti qûlê xo beredayî nêkero
- ▶ Homa rehîmê xo ro ci kero(Qeybê merdan)
- ▶ Homa cê cê cinnet kero(Qeybê merdan)
- ▶ Homa hetê to bo
- ▶ Oyyyy cê to cinnet bo
- ▶ Destê to ternî bê
- ▶ Dest û lingê to ternî bê
- ▶ Ti dinyad derd nêvînê
- ▶ Homa qismetêko baş bido to
- ▶ Ena dinyad çîqa tiamî estê Homa bido to
- ▶ Anû to rê bivaro fenê varitê nîsanî
- ▶ Homa biranê to verdo
- ▶ Homa bextêko sipê bido to
- ▶ Homa derdan nêmocno to
- ▶ Homa zêdi kero
- ▶ Bi zerriyêka weş bo
- ▶ Homa xeyr bido to
- ▶ Homa xeyr kero
- ▶ Kê to awan bo
- ▶ Dorê to gul û rîhanî bê
- ▶ Ewliyê Homayî cîranê to bê (dinya bine de)
- ▶ Destê xoci xizirî paştê to de bo
- ▶ Dorê to pirê lac û keynan bo (tûtî)
- ▶ Homa to bûka sûre kero
- ▶ Homa to zama kero
- ▶ Ti dinyad ax nêkerê
- ▶ Bi xeyr û silamet şêrê
- ▶ Bi xeyr û silamet bimanê
- ▶ Kê to awan bo pirê bûk û zaman bo

ZEWTÎ

- ▶ Feleqê to siyabo, ko bo helîla bo
- ▶ Ooy bextê to siya bo
- ▶ Ooy dil û gurçikê to birişyê
- ▶ Ooy qansêrê Elê Êmîş to ro gîno
- ▶ Ooy doxizbaşi to ro gîno
- ▶ Dil û gurçikê to bi teqê
- ▶ Kezebê to bêrê teber
- ▶ Ti nê geyrê a
- ▶ Homa to mird kero
- ▶ Homa belê to bido
- ▶ Homa belê to binê lînganê to ra bido
- ▶ Çopilmî to ro gîno
- ▶ Erd to boro
- ▶ Şiyayîşê mergî bo
- ▶ Ti bi çimî nêvînê
- ▶ Birq (birûsk) tor o gîno
- ▶ Mezelê şîq to ro gîno
- ▶ Adir ra kê to ko
- ▶ Ooy ti qe rehetî nêvînê
- ▶ Adir ro to bivaro
- ▶ Tofan to ro do
- ▶ Ti qurbanê hevalanê xo bê
- ▶ Ti qurbanê mi bê
- ▶ Ti qurbanê heran bê
- ▶ Ti qaqa siyad şêrê
- ▶ Oxeyşî to çinêbo
- ▶ Çimê to birişyê
- ▶ Quzulkurt û neflit
- ▶ Ti quzulqurtî bê
- ▶ Ooy ti şêrê binê erdî
- ▶ Ti a dardê bimanê
- ▶ Ti şêrê nihad
- ▶ Çimê to vecyê
- ▶ Jana barî to ro gîno
- ▶ Ti ker û lal bê
- ▶ Bûk nêbiyayî

Arêkerdoxe: Leyla GULTEKÎN

Ca: Kû /Pasor /Amed

EZ ROVÎ ME LI SER CAX Û CÎVATA RÛNIŞTÎ ME

Roviyek pirr birçî dibe. Ji birçîna hal û heş tê namîne, çav lê tarî dibin. Digere ku tiştêkî bibîne û bixwe. Li pêşiya xwe dinêre, wa ye li wî alî birek heye. Diçe li bîrê dinêre, ku ava wê hindik e, lê belê tiştêkî de de spî dike, eynî mîna penîr e. Rovî dibêje, a welle min ji xwe re penîr dît! Rovî qet de yax nake û hema xwe davêje hundirê bîrê. Li wî tiştê ku spî dikir dinêre, hayloo... ne penîr e, kevirekî spî ye. Rovî di hundirê bîrê de diasile, êdî nikare derê. Dinêre ku wa ye gurek li ser bîrê ye. Gur dibêje:

-Roviyê tu çi dikî li wê derê?

Rovî dibêje:

-Tu nizanî, min penîrek di vê bîrê de dîtiye, ez dixwim naxwim naqede!

Gur dibêje:

-Welle ez pirr birçî me, ka cî çê bike ez jî bêm.

Û xwe davêje hundirê bîrê. Dinêre ku ew tiştê sipî dikir, kevîr e. Piştî wî kêroşkek tê. Kêroşkek dibêje:

-Hûn di hundirê bîrê de çi dikin?

Evana dibêjin:

-Me li vê derê penîrek dîtiye, em dixwim naxwim naqede.

Kêroşkek dibêje:

-Ji min re cî çê bikin ez jî tîm.

Û xwe davêje hundirê bîrê. Di pey wê de kerek tê û li bîrê dinêre, ku di hundirê wê de roviyek, gurek û kêroşkek heye, ji wan re dibêje:

-Hûn li wê derê çi dikin?

Evana dibêjin:

-Me li vê derê penîrek dîtiye, em dixwim naxwim naqede.

Ker dibêje:

-Cî çê bikin ez jî tîm.

Û xwe davêje hundirê bîrê. Roj dibihurin, tev birçî dibin.

Rovî dibêje:

-Heyra welle wusa nabe. Yan em ê tev bimirin, yan em ê çarekê ji halê xwe re bibînin.

Gur dibêje:

-Ka em çawa bikin?

Rovî dibêje:

-Heyra em ê leyistikekê bilîzin, em ê navê hevdu ji hev re bibêjin, navê kê ne xweş be em ê wî bixwim.

Evana dibêjin: "Bira be."

Û dest bi leyistikekê dikin. Ewîlî gur dibêje:



Amadekar: Mustafa GAZÎ
Herêm: Silîva / Amed

-Ez gur im, diranberr im.
 Piştî wî rovî dibêje:
 -Ez rovî me, ser cax û civata rûniştî me.
 Piştî rovî kêroşk dibêje:
 -Ez kêroşk im, goveroşk im.
 Îjarê dor tê kerê, ker dibêje:
 -Ez ker im, goçepel im.
 Rovî dibêje:
 -Heyra ker ker e, ma goçepel çi ye? Ê de welle navê te qet ne xweş e!
 Ên din jî dibêjin:
 -Welle, bi rastî jî navê te qet ne xweş e!
 Û li serê kerê kom dibin; kerê dixwin, zikê xwe têr dikin û bi vî awayî heya demekê îdare dikin. Çend roj dibihurin, dîsa birçî dibin. Rovî dibêje:
 -Em ê dîsa navê hevdu ji hev re bibêjin, navê kê ne xweş be em ê wî bixwin.
 Dibêjin: "Bira be." Û ewilî gur dîsa dibêje:
 -Ez gur im, diranberr im.
 Dûre rovî dibêje:
 -Ez rovî me, ser cax û civata rûniştî me.
 Dawiyê jî kêroşk dibêje:
 -Ez kêroşk im, goveroşk im.
 Rovî dibêje:
 -Heyra kêroşk kêroşk e, lê goveroşk çi ye? Welle navê te qet ne xweş e!
 Gur jî dibêje:
 -Erê welle bi rastî jî navê te qet ne xweş e!
 Û ew û rovî difetilin ser kêroşkê û wê dixwin, lê belê rovî bi dizî ji goştê kêroşkê perçeyekî vedişêre. Çend roj dibihurin dîsa birçî dibin. Rovî êdî newêre bibêje em navê hevdu ji hev re bibêjin, çimkî dizane ku wusa bibêje, gur wê wî bixwe. Bi dizî wî goştê ku veşartibû derdixwe davêje devê xwe. Gur dinêre, rovî tiştêk di dêv de ye dixwe, jê dipirse dibêje:
 -Roviyo tu çi dixwî?
 Rovî mexsûs çavekî xwe digre û dibêje:
 -Qet mepirse, welle ez ji birçîna çavê xwe dixwim.
 Gur dibêje:
 -Ka tu were çavekî min derxe, ez jî bixwim.
 Rovî destê xwe davêje çavekî wî derdixwe û bi dizî di bin xwe de vedişêre û di şûna wî de bişkulekê davêje devê gur. Gur bişkulê dixwe, ku piirr hişk e, ji rovî re dibêje:

-Ji birçîna çavê min jî hişk bûye, eynî bûye wekî kevir!
 Rovî dibêje:
 -Erê wele yê min jî eynî wusa bûye!
 Piştî demekê rovî çavê gur ji bin xwe derdixwe û davêje devê xwe. Gur dibêje:
 -Ew çi ye tu dixwî?
 Rovî dibêje:
 -Min çavê xwe yê din jî derxist, ez wî dixwim.
 Gur dibêje:
 -Ê de ka çavê min ê din jî derxe ez jî bixwim."
 Rovî çavê gur derdixwe û davêje devê xwe û di şûna wî de dîsa bişkulekê davêje devê gur. Di pey wî de rovî bi vî awayî mil û piyê gur jî dixwe. Û piştî ku gur dimire, wî bi temamî dixwe. Hinek zeman dibihure rovî di hundirê bîrê de bi serê xwe, birçî û bê çare dimîne. Radibe li ber Xwedê digere, dibêje:
 -Xwedê, ez bi qurbana te bim, tu bikî ku ez ji vê bîrê derê. Welhehî ku ez ji vê bîrê derê, ez ê gundekî tevekê bi tirî têr bikim.
 Piştî wê bi emrê Xwedê bayek radibe û qal û qirşik dikevin hundirê bîrê. Bîr, bi wan qal û qirşikan tijî dibe. Rovî bi xêra wan qal û qirşikan ji hundirê bîrê dertê derve. Rovî li der û dora xwe dinêre, ji palekê de du heb siwar xwanê[xuya] dikin, barê wan heye, barê wan jî tirî ye. Rovî bi dizî diçe li ser riya wan xwe vedixwe erdê û xwe li mirî-tiyê datîne. Herdu siwar nêzî rovî dibin, siwarek dibêje:
 -Welle va ye min roviyek dît, jixwe mirî ye. Bira nivî ji min re be, nivî ji te re be.
 Radike wî datîne ser qoqolîka xwe. Ev herdu siwar li riya xwe dewam dikin. Rovî jî bi dizî pêçîka xwe di piştê wî re dike. Eviya aciz dibe, li hevalê xwe dinêre dibêje:
 -Kuro tu çi dikî, me gotiye rovî nivê min e, nivê te ye, tu çima darikê xwe di piştê min re dikî?
 Hevalê wî dibêje:
 -Heyra welle min tiştêk bi te nekiriye.
 Rovî dîsa pêçîka xwe di piştê wî re dike. Eviya dîsa aciz dibe û ji hevalê xwe re dibêje:
 -Tu çima darikê xwe di piştê min re dikî?
 Hevalê wî dibêje:
 -Kuro welle haya min ji te tune ye.
 Rovî carek din wusa dike, êdî evana bi hev dikevin, tep û rep li hev dixin û hevdu dikujin. Piştî ku evana hevdu dikujin, rovî herdu barê tirî dibe li gundekî belav dike û bi vî awayî jî soza ku dabû Xwedê, tîne cî.

ÇÎROKÊN GELÊRÎ

LÎ SER DOSTAN

Mêrikek û lawekî xwe hebûn. Rojekê mêrik ji lawê xwe re dibêje:

-Di vî zemanî de dost tun in.

Lawê wî jî dibêje:

-Bavo, ma dost çî ne, dost wek xweliyê ne. Dostên min pirr in!

Bavê wî dibêje:

-Welle yên min yek û nîv dostê min hene.

Bavê wî piçekî difikire û piştî wê ji lawê xwe re dibêje:

-Were em hevdu biceribînin, binêrin ka dostên kê hene.

Lawê wî dibêje: "Temam" Û radibin diçin heywanekî dikujin, xwîna wî di cilên xwe digerin û laşê heywanî jî dixin binê axê vedişêrin. Pêşî law diçe ba hevalên xwe û

ji wan re dibêje:

-Min merivek kuştiye, ka hûn hevalên min in, werin alîkariya min bikin, çareyekê ji halê min re bibînin!

Hevalên wî tev xwe didin alî, û dibêjin:

-Eman eman, te mêr kuştiye, neyê bi alî me de!

Law diçe malê û ji bavê xwe re dibêje:

-Bavo welle ez xelet im, dostê min qet tune!

Paşê bavê wî diçe ba hevalên xwe, dibêje hal û mesela min ewha ye, hevalên wî giştik tên alîkariya wî. Piştî vê bûyerê bav ji lawê xwe re dibêje:

-Binêre min ji te re gotibû yên min yek û nîv hene, ew yek û nîv jî hatin alîkariya min, lê belê te got ên min wek xweliyê ne, kesek nehat alîkariya te û bi ser de jî te ji ba xwe bi dûr xistin.

Amadekar:
Mustafa GAZÎ
Herêm: Amed



LUYE Û EWRÎŞ



Arêkerdax:
Zerweş ESNAW
Çime: Şerîfa AKTAY
Serrê aye: 54
Herêm: Basrefa /
Gêl /Amed
Serre: 2013

Cay bi cay çini bi, yew luy bîy yew ewrîş bi, luy ama ewrîş bixapîna. Ewrîş guroto şîya berî milayî ver. Mila citêr bi yew rişta cê(poste) bîy, luy rişka milay werda, ew luy dana piro şona ewrîşî xapînena, vana:

—Here mi emşo hewn diyo, yewî rişta milay werda.

Herî milay zî şîyo berî luyê ewrîşî ver di xo derg kerdo luy şona ewrîşî ra vana:

—Bê yew leşî berdî ma werda ma şîrî biyarî zere borî.

Şoni leşî ver luy ewrîşî xapînena vana:

—Sereyê xo deki pardîmî ver(cila herî), luy vana ez zi goşanê cê tepîşena ma berî zere.

Ew her ay vext hêz dano xo wardeno luy goşani herî veradena her ray keweno şono, ewrîşî zî cildê herî miyan di şono kêye.

Cenîya milay vana:

—Mila herê ma yeno, ew çîy pey ra payo?

Her yeno berî ver, mila û cenîya xo evnîyenê ki yew ewrîş o, ini ewrîşî cildê herî ra vecenî, poste kenî, ew cê veradenî.

Ewrîş şono, luy ewnîyeno ha ewrîş yeno, ew gonî ra lotî-

yayo sur biyo.

Luy vana:

—Kamî to visto enê halî ewrîş?

Vano:

—Hal û mesela enawaya yewî rişka milay werda herê milay zî vano îni werda ti zana kamî rişka milayî werda.

Luy vana:

—Şewa ellay yew a, dîzdî her zaman î ew vana ez çî zana rişka milay kamî berdo, werda, ez giyê xo ridê milay û herî pîya kena. De vana rişka milayî kî werda?

Keyf keyfê luy o, şona yena goştê ewrîşî lêşena, gonîya ewrîşî şona zuwa bena, ewrîş mireno ew goştê ewrîşî wena qedînena giyê xo kateyandê ewrîşî ser ro kena ew ena ray handi ki goşt werdo zera ca xeriqîyaya şona bindê yew simzêri, simzan wena ew ena ray cor di dari ser ra kerra kuwena luîyî gunena.


Luy vana:

—Wîi xo rê yew nêverdeno ma xo rê meytan di xo rê bi-bermî.

Ma ra zur, Ellay ra raşt.

Serhat KILIÇ

**PÊVERVİSTİŞÊ
ESTANIKA
HÎRÊ
BİRAYAN Û
DESTANA
ODESSA**



1. ESTANIKA HÎRI BIRAYO

Ca beno ca çinî beno, hîrê birayî benî. Yew rojê zimistonî beno, yew çokê vovrî erdî de bena. Inê hîrê birayî vonî ma xo rê şîrî seyde. Heme hîrê zî xu têbestenî, fişelixê xo mone ra kenî, xenceronê xo mînda xo şonenî û verê xo danî heta koyanî ro. Hewt royon û hewt koyon vîyarenî, gelekî dûrî şonî, çend hebî seydonê xo kişenî. Şewe pede yena, hinî betelênî, serd kenî. Ewnîyenî ke yew mixara ha yînî(înan) ver de ya. Biraronî ra yew vono; "Bira-yinî ma xu rê şêrî ina mixarayê de tikê biarisî, xu germin bikî, seyde xu bipewci û biwerî." Ayê(ê) bîni zî vonî; "Temom." Şonî mixara, zere ewniyenî ke adir ha wekerde yo, êzimî ha verê adirî de ronaye yî. Yê zî tikêne êzimo erzenî adirî mîyon xu weş germin kenî. Seydonê xu adirî de powcenî, wenî, xo mird kenî. Seydî ke mendî, ewra de leqan de leqnenî.

Tarî beno, ewnenî yew pes ome. Pes yeno, ewnenî ha yew dêw, pesî dima, tek çimê yê(ey) ha çare de yê re. Yeno vono; "Boya mehmedîyo yena, ho hoo! Birayo pîl şomîyê mi, birayo ortî şewînê mi, birayo wurdêk(qic) zî areyîyê mi. "Berê xu padeno gêno yew kerraya(kemer) xişn pey berî de roneno hinî çew nêşêno a kerra heweno yê ra teber. Birayo pîl keno şomîya xu, birayo ortî keno şewînê yo, weno qedêno, kateyonê(astanê) ey koceno. Şîşa xo gêno adirî ser roneno vono; "Birayo wurdêkî ez nimacî der pê ina şîş bipewco." Şîşa xo dekeno adirî mîyon û rakewno. Yo rakewno, birayo wurdêk vono; "Ez ina şîş bigêro." Şîş gêno çimê dêwî ro şonenno. Şoneno şonenno şîş epeyî çimê yê ro şona war. Vono; "Wa dêw erey bianco ke ez kelo kolî poste biko, xu deko(dekera) mîyan." Şono kelo kolî poste keno, xu dekeno postedê yê mîyon û şono xu erzeno mêşînanan mîyan. Hinî dêw a şîşe çimdê xu ra kaş keno û wardeno nimac(şewdir) beno, kerra pey berî ra heweneno, tek tek meşînayo vere dono. Dêw vono; "Çimê mi kor o la gunî ez hewne(rayne) zî to biwero." Ewnêno kelo kol nêaseno. Yo vono; "Kelo kol qey ti mi rê xayîn vecîyayî." Birayo wurdêk bêntar meşînon şono. Dêw destonê xu paneno la vono qey kelo kol o. Birayo wurdêk xu weleseno, pesî gêno şono dewa xu.

Mi hinî ewra de ca verda ez şîya

Ez şîyo suke. Mi ward nonê buk

Ez şîyo heso. Bî teq teqa qeseyo

Ez şîyo kurik. Mi ward nonê korêk

Ez şîyo welo. Bî çik çika melo

Min testê hesîrî viraşt. In vera raşt

Dokinarê dewe de. Xece gîşt, Eyson lîşt û pîşt

2. DESTANA ODESSA

Odysseeus û embazê ey şewêka tarî de resenê cayêko koyin. Odysseeus pê des hebî destirmananê xo vejîyenê keşf. Raşt a mixarayêke yenê, şinê zere ke şewe ewta de bivîyarnê. Ê dima ewniyenê ke pesêki ame. Nê pesî dêwêko yewçimin Kiklop Polyphemos qeyta keno. Polyphemos yew kemero girdî reyde berê mixareye gêno û dest bi ditişê pesî keno. Hi ewniyeno ke nê xerîban vînenno. Odysseeus dêwî ra mêmanperweryî wazeno labelê Kiklop bêrehm û bêbext o; gala di hebînan keno, înan sê kirtêyê kutikî verdê erdî dano. Mezgê nê feqîran erdî ro vila beno. Înan xo rê keno şamî û rakeweno.

Şewdire der dina hebî mêrdiman zî weno. O berê mixarayê rayne gêno û terşî(pes) xo ver şaneno û şino durî. Odysseeus gopala dêwî(sê estuna banî) gêno sereyê ey tuj keno, pê adirî weş qarstî keno. Şewe der şerab dano dêwî rê. Dêw nameyê ey perseno, o zî vano namayê min çewêk (kesêk nê) o. A hinge de Odysseeus bi destirmananê ey gopalî sûr kenê û dekuwenê mîyanê çimê dêwî. Dêw deji ver ra barenno û dêwî ke cîranê polyphemosî înan rê pêser benê. Polyphemos vano: o ke ez kor kerda çewêk o. Cîranî pêro vila bene şinê.

Dêw kemerî fek berî ra hewelnenno; keno ke ê ke bivejîyê teber bitepişo labelê ê pêro xo binê beranan de aleqnenê, bin pirtê beranan de xo nimnenê. Dêw înan nêvînenno û ê zî dêwî ra xelisîyenê...

3. PÊVERVISTÎŞ

Gedeyeyîya min de rocêki keye de ceyran şî û maya min zî, ez xo ver de roşênaya û na "Estanika Hîrê Birayan" min rê vat. Şew qedîyaye, roc bi, ez şîya wendegeh(wendegeho mîyanîn, pola 6 "in). Waneyê ma tirkî bi. Wane de, ma pirtûkî ra yew nuşte wendinî, nameyê nuşteyî "Destana Odessa" bi. Ma ke wend, ez pê aqilîyaya ke estanika maya min û Destana Odessa sê pê yê. Min destê xo hewena. Min mamosteyî ra va "Mamoste, Destana Odessayî abîşew maya min min rê va, na Destana Odessa nê estanika maya min a. O zî min rê huwîya, vat ke "Maya ton ê nuşteyî îllehem wendo coka zana." Min zî va nê, wendeyê maya min çîn o û çiray nêşîya dibistane. O zî rayne min rê huwîya û waneyê xo donma. Na estanike maya min maya xo ra, a zî îllehem nê maya xo ra nê zî dewijanê xo ra musaya. Na estanike pê vatişî beno ke hezar serran ra heya nika wina ameya.

Ez wazena ke têkiliya Estanika Hîrê Birayan û Destana Odessa ser ro vîndera. Odessa seke yeno zanayîş, îsayî ra ver V.Z mabenê serranê 800 û 600 "î de ameyo nuştîş.

Çande bêsinor o. Pê heme şaran ameyo meydan, heme netewî hîssedarê nê çande yê. Persgira na ya ke; Kurdî sê şaranê bînan nêşkenayê nameyê xo zî dekerê na ortaxeyîye mîyan. Nê semedî ra Odysseia hindayî namedar a, erjîyaye ya labelê estanika maya min Estanika Hîrê Birayan zî nêameya zanayîş û bêerj menda.

Noştoxê Odessayî Homeros o. Odysseus bi xo Yunan o, vîndkerdişê Turuvayî ra dima agêreno welatê xo [Ithakka]. No raywanîye de çiyî ke sereyê Odysseusî ra vîyerto nê pirtûkî de ameyo nuştis.

Persa min na ya ke; nika Odysseia heme hetê cîhanî de yena zanayîş her kes Homeros û Odysseyî weş şinaseno. Kifş o ke Odysseia û Estanika Hîrê Birayan varyantê yewbînan ê. Tirî(gelo) çirê kes Estanika Hîrê Birayan nêzano?

Verpersa na perse core de nuşte ya. Homerosî V.Z mabênê serranê 800 û 600 "î de na destane nušta labelê Estanika Hîrê Birayan heya nika tim bi vatişî ameya, çî ray nênusîyaya, edebîyato nuşteki de cayê xo nêgirewta. Beno ke biyero vatiş, Kurdan û Yunanîyan wextî de têkilî ronaya, Kurdan Yunanîyan ra na estanike girewta. Wa bo, ma vajê ke na hewa ya. Netewî xo mîyan de nê tewir yew têkilî ronênê, çande wina vila beno. Tirî çirê nameyê Kurdan nê tewir çiyân de nêvîyareno? Zaf semedê nê halî est ê. Bêdewleteyî, çînbiyayîşê edebîyatê nuştekiyî ûsb. Kê eşkenê semedan bizêdnê.

Sê na estanike kê eşkenê sewbina numunayan zî bidê. Min rocêki destana Rustemê Zalî yew mêrdimo kokimî ra goştarite. Ez ewnîyaya ke Heraklesê Yunanan û Rustemê Zal zî zaf yewbînan manenê. Zaf kesî Heraklesî zanê labelê Rustemê Zal zaf nêyeno şinasnayîş. Seke yeno zanayîş zî bi nameyê farisan yeno şinasnayîş. Kurmancî de yewna estanik est a, Ker Axa. Merdîm ke Ker Axa goştereno Mizikacênê Biremenî yenê kê vîrî.

Çande bêsinor o. Pê heme şaran ameyo meydan, heme netewî hîssedarê nê çande yê. Persgira na ya ke; Kurdî sê şaranê bînan nêşkenayê nameyê xo zî dekerê na ortaxeyîye mîyan. Nê semedî ra Odysseia hindayî namedar a, erjîyaye ya labelê estanika maya min Estanika Hîrê Birayan zî nêameya zanayîş û bêerj menda.

No der heqî de yew qala Malla Ehmedê Xasî est a, merdim tikê pê dejenê labelê raşt a. "Qewmêk eke bêkitab bo, dewarê bêziwanî maneno"

Çimeyî:

1. "Estanika hîri birayo", Hebîbaya Xaçekî, Pîran
2. "Destana Odessa",

<http://tr.wikipedia.org/wiki/Odyssei>



ESTANEKA VEYVI



Arêkerdoxe:
Derman UNGUR
Çime: Hacî UNGUR
Serrê aye: 50
Herê: Hacison /
Pîran / Amed
Serre: 2015

Yew mîrdek beno yew zî cenîk bena. Yew zî lacê yê est o. Wext vîreno cenîk û mîrik extar benî nişini kar mar xo bikî. Lajê yê zî hin beno xort. Cenîk û mîrdek têsere fînenî û vonî; "Ma ên lajê xo bîzewejnî, ma yew veyvi biyerî keyeyî ser, wa ma rê tiki yardimbike, wer bipewîje, yew tasa aw bide ma, ma rê non bîpewîje." Şonî lajê xo re ina mesela akenî lejek zî von; "Beno."

Lajek zewejnenî û veyve xo onî keye. Wext dewe de kar zaf bi ay semed millet rew warîştinî kar marê xo kardinî. Yê zî rew warzenî. Pawenîk wa veyve warde yê rê arayî hadre bike verê ber biruwe. Pawenî pawenî veyve nêwardene.

Cenîk vone; "Mîrdek la ma sek, ma enê ina arde wa ma rê yardim bike û bire çew cile de xo re nêwarden." Mîrdek dûşmişin û von; "Ez şono gezî gîno ti zî bi maşîr bin paca da yay. Ez von ez verê ber riwen ti vaj ez riwen û ma qelebalix bikî wa warze. Qey biewna ma ên semed donê pîr şermayene û yena ma dest ra gezî gîne ya riwena."

Mîrdek û cenîk planê xo kenî û şonî binê paca da veyve.

Ew qest gezî têdeste kaş kenî ya vone; "Ez riwen mîrdek von ez riweno" û qelebalix kenî. Veyve veng yê reyde wardene paca akene û sereyê darg kene u vone:

- Çi ne inkey ên çi qelebalix şîma yewbin re çi wazenî?

Cenîk vone:

- Ez vone ez verê ber riwen xalo von îllehem ez riweno. Ma ên semed

donê pîr.

Veyve vone:


- Çî eceley şîma est o eyro ti biruwe, wa siba zî xalo biruwo. Şîma çirê ên semed donê pîr. Pacaya xo padone û şone zere.

Mîrdek û cenîk ewnîn yewbin ra û vonî:

- Haylo wîllay ma ine ezît bîlleheq ward, ina ma rê kar mar nêkena. Gezî xo cad ronên û şonî xo rê arayî hadre kenî.

MEQES

Amadekar:
Mewlûd HESKÎFÎ
Çavkanî:
Sofî Zîwer
(Kalikê Mewlûd Heskîfî)
Temen: 60
Herêm: Heskîf
Sal: 2010



Dibêjin, mîrekî Keleha Heskîfê hebû. Şefeqê wextê ji xew rabû, destê xwe da ber eniya xwe û li hawîdora xwe me-yizand, dît ku wa ye li Çola Qurê jinikek û mêrikek paleyîyê dikin. Herdu bi hev re didirûn û bi hev re bêhna xwe berdidin. Jin di emrê mêrik de bû, mêrik jî di emrê jînikê de.

Mîr di hundirê xwe de got: "Ez mîr im jî, kufletên min wilo ne di emrê min de ne, ne di kurm û kirasê min de ne. Çima gelo?" Mîr xwest wî mêrikê paleyî dîke, bîne hizûra xwe. Qasidek şand balê û qasidê mîr mêrik anî. Mîr jê pirsî, got:

- Ez ji vê sibehê de li we dimeyînim. Hûn bi hev re paleyîyê dikin. Bi hev re berê xwe dibin serî. Bi hev re bêhna xwe berdidin. Bi hev re...

Piştê Mîr gotiyê:

- Heyra, sê jinên min hene. Yek ji yekê xweşiktir e. Tu nayê ku tu jîna xwe bide min û her sê jinên min ji xwe re bibe?

Zilamê pale ecebmayî ma, şaş bû û di ber xwe de got: "Esseh mîr min diceribîne" û piştê got:

- Na, ezbenî. Çi heddê min û bavê min e, tiştêkî wilo bikim?

Mîr bi heman ciddiyetê, gotina xwe dubare kir û got:

- Nexwe tu jîna xwe, bi her sê jinên min nadî?

Zilamê pale xwe bixwe fikirî û got: "Heke ez bêjim na jî, wê mîr jîna min ji min bistîne." Û got:

- Ez benî hema tu dizanî. Te çawa munasib dît, bila wilo be.

Piştê jîna mêrikê pale giha Mîr û her sê jinên mîr jî gihan zilêm.

Zilamê pale her sê jînik dan pêşiya xwe, ji Kelehê derketin û çûn gihane ber çêm. Piştê gote wan:

- Hermetino, hûn li vir bisekinin. Ez ê yeko yeko we derbasî aliyê din bikim.

Zilamê pale bi destê jînekê girt û ew bir gihand nivê çêm, devera ku şîp bû, ji jînikê pirsî:

- Tu hewqas xweşik û lihevhatî yî, çima mîr tu dayî min gelo?

Jînikê got:

- Mîr digote min: "Tu tiştê ji min didizî, tu dizek î." Lewma ez dame te.

Zilêm got:

- Tişt nabe. Tu mal û milkê min, zêr zegerê min nîn e, ku tu ji min bidizî.

Zilam jînikê derbasî aliyê din ye çêm kir û vegeyriya çû ku jîneke din bîne. Zilam jînika didiwan jî anî giha nivê çêm, li wê devera şîp û jê pirsî: "Tu hewqas şêrîn û xweşik î, çima mîr tu dayî min?"

Jînikê got:

- Mîr digote min: "Tu qûnde yî, tu çavlider î. Tu ye serê min bixî belayê."

Mêrik xwe bixwe got: "Tişt pê nayê, ne mesele ye. Belkî li bal min biedile." Mêrik jînika didiwan jî derbasî aliyê din ye çem kir û vegeyriya çû ku jînika sisêyan bîne. Mêrik jînika sisêyan jî weke herduyên pêşî, bir gihande devera şîp û jê pirsî:

- Çima mîr tu dayî min?

Jînikê got:

- Mîr digote min: "Tebîetê te, exlaqê te nexweş e."

Mêrikê pale tilîka xwe ya şehedê û ya nêvî ji hev vekirin û nîşanî jînikê da û got:

- Ev çi ne?

Jînikê got:

- Meqes e!

Mêrik ew ceriband, destekî wê girt û noqî avê kir û derxist, dîsa her du tilî nîşanî wê dan û eynî pirs jê kir û got:

- Ev çi ne?

Jînikê careke din got:

- Meqes e.

Zilam, jînik berda nava şîpê û jînik binav bû, serav bû, av qurpand; dixeniqî hê jî tilîkên xwe yên ku kiribûn weke meqesê bilind dikirin û dîgo: "Meqes! Meqeeees..."

Mêrikê gewr got:

- Here, tu jîmin re nabe. Û ew bi avê de berda.


...

Vêca, dermanê hemû tiştî heye, her tişt safî dibe. Lê dermanê înadê nîn e û tebîetê nexweş rast nabe.

Çîroka min çû nava dar û deviyar, rehma Xwedê jî li dê û bavên me hemûyan.

DÎ EŞÎRA DUDERAN DE NAVÊN PEZÊ MEŞIN

Komên pêz heya du sedî bi peyva
“colik”, ji du sedî heya çar sedî bi
peyva “birêpez”, ji çar sedî pê de
jî bi peyva “kerî” tê binavkirin.
Pezê ku ji mih û beranan pêk tê
“pezê meşin” e.





Destpêk

Erdnîgariya Kurdistanê bi dest û zozanên xwe her dem bûye welatê gelek jîndaran. Siruşt Kurdistanê ji bo hemû aferîdeyan gelekî gunçaw e. Dest û zozanên Kurdistanê tije giya û nebatên curbecur in. Dema meriv li keleşor û nivîsên beriya mîladê jî dimeyze, dibîne ku heywan pêşî li vê erda pîroz hatine keşîkirin. Li ser kevîr û şikeftên Kurdistanê bi hezaran wêne û xêzikên heywanan yên beriya mîladê hene. Xwedîkirina heywanan, her çiqasî ji ber talankirin û qedexekirine serdestan carinan sist bûbe jî, heya roja me didome; çimkî debara Kurdan bi giştî li ser xwedîkirina heywên û çandiniyê ye.

1. Xwedîkirina Pêz û Eşîra Duderan

Di nav Kurdan bi du şeweyan heywan tene xwedîkirin; koçeratî û dêmanî. Heya salên nodî jî koçeratî di nav Kurdan gelekî pêşketî bû. Lê piştî salên nodî li Kurdistana Bakur çûyîna çiya û zozanên ji hêla dewletê ve hate qedexekirin. Bi vê qedexekirinê re koçeratî kêmbû. Bi kêmbûna koçeratîyê jî çanda koçeratîyê hate ber windabûnê. Lê dîsa bi saya serên hinek eşîran çanda xwedîkirina pêz heya roja me didome. Ji ber ku xwedîkirina pêz a di nav Kurdan ji mêj ve dest pê dike, bi xwe re çandeke dewlemend û taybet ava kiriye. Di nav Kurdan de, bi sedan biwêj, gotinên pêşyan û têgehên di derheqê pêz de hene. Meriv li ser çanda xwedîkirina pêz hûrgilî bibe, divê meriv bi dehan pirtûkan binivîse. Ji ber vê yekê, me sînorê vê nivîsê teng danî; em tenê li ser navên pêzê meşin sekinîn.

Me agahiyên xwe yê vê nivîsê bi giştî ji Ahmet İdem standin. Kekê Ahmet çil û du salî ye, ji binemala Dawidiyan a

Eşîra Duderan e û niha jî li Hezêxê dijî.

Eşîra Duderan eşîreka Herêma Botan a kevnare ye û ji konfederasyona Çoçsor e. Di jêderên wekî "Şerefname" de behsa vê eşîrê tê kirin. Ev eşîr îroj jî bi gelek binemalên xwe li Herêma Botan dimîne. Duderî weke hemû eşîrên koçeran ên Kurdistanê havînan diçine derên hînik û zivistanan tene deştên germ. Zozanên Duderan bi giştî Serhed in; zivistanan jî tene deşt û newalên Herêma Botan. Piştî salên nodî gelek binemalên vê eşîrê dev ji koçerîyê berdan û bûne dêmanî.

Li Kurdistanê pezê meşin yê bidaw tê xwedîkirin. Pezê bidaw, dūvên wan pahn e, bi bez e û mezin e. Li Anatolyayê jî pezê meşin ê dūvrovî tê xwedîkirin. Dūvê vî pezî zirav û biçûk e. Pezê bidaw jî yê dūvrovî qayîmtir e û hirîya wî jî baştir e; lê yê dūvrovî bi şîrtir e.

Di nav Kurdan de ji dewsa peyva "pez", "sewal" jî tê bikaranîn. Lê Eşîra Duderan bêtir peyva pez bi kar tîne. Komên pêz heya du sedî bi peyva "colik", ji du sedî heya çar sedî bi peyva "birêpez"; ji çar sedî pê de jî bi peyva "kerî" tê binavkirin. Pezê ku ji mih û beranan pêk tê "pezê meşin" e.

Me pezê meşin ê bidaw li gorî du sernavan tasnîf kir; li gorî temenên wan navlêkirina pezê meşin û li gorî teşe û rengên serên wan navlêkirina pezê meşin.

2. Li Gorî Temenên Wan Navlêkirina Pezê Meşin

Navlêkirina pêzê meşin, li gorî zayendan wan carnar tê guhartin. Me jî li jêrê li gorî zayenda wan pezê meşin nivîsand.

2.1. Peza Meşin a Mê:

Bex/berx:

Ji zayinê heya yek salî bi vî navî tê binavkirin. (0-1)

Kavirê mê:

Ji yek salî heya du salî bi vî navî tê binavkirin. (1-2)

Berindir:

Ji du salî heya sê salî bi vî navî tê binavkirin. (2-3)

Bizaştî:

Ji sê salî heya çar salî bi vî navî tê binavkirin. (3-4)

Peza sere/mih:

Ji çar salî heya mirinê bi vî navî tê binavkirin. (4- ...)

2.2. Pezê Meşin ê Nêr:

Bex/berx:

Ji zayinê heya yek salî bi vî navî tê binavkirin. (0-1)

Kavirê nêr:

Ji yek salî heya du salî bi vî navî tê binavkirin. (1-2)

Berindir:

Ji du salî heya sê salî bi vî navî tê binavkirin. (2-3)

Hogîç:

Ji sê salî heya çar salî bi vî navî tê binavkirin. (3-4)

Beran/Beranê qerte:

Ji çar salî heya mirinê bi vî navî tê binavkirin. (4- ...)

3. Li Gorî Teşe û Rengên Serî

Navlêkirina Pezê Meşin

Li Herêma Botan cureyên pêzê bi navên hemdanî, dêzerî, hewês, qaraqaş, pezêsor û hêrik têne xwedîkirin. Ev her şeş cure jî pezê bidaw in. Her çiqasî pezê ku niha têne xwedîkirin têkelhev bûbûn jî, di demên berê di her eşîr û herêmekê de cureyek pez dihate xwedîkirin û ev pez bi navê wê eşîrê yan jî bi navê wê herêmê dihate binavkirin. Bo nimûne pezê hêrik Eşîrên Çoqşoran, pezê dêzerî Eşîra Herîkiyan, pezê hemdanî Eşîra Qaşûran, pezê hewês Toriyan, pezê sor û qaraqaş jî li Herêma Serhedê dihate xwedîkirin. Eşîra Duderan di demên berê de pezê hêrik xwedîkirin; lê niha bi giştî pezê hemdanî û dêzeyî xwedî dikin. Îroj pêtir pezê hemdanî û dêzeyî têne hebandin. Ji ber ku ev pez gir e, bigoşt e, xweşfiroş e, guhmezî e, şîrê wan gelek e û dotina wan jî xweş e.

Pezê meşin, li gorî reng, qiloch û mezinbûna guhên wan têne binavkirin. Em ê li vir taybetmendiyên pezê meşin bi wêneyan destnîşan bikin.





Kerbazî



Kerbaziya Kej



Kewîsal



Kewisala Hemdanî



Kura Riser



Kura Serces



Kure Bazî



Kure Tebes



Qemera Guhkevç



Qemera Hemdanî



Qemberbaziya Hemdanî



Reşbetekə Hemdanî



Riser Tebes



Risera Hemdanî



Risera Porik



Riserporika Dəzeyi



Serreşa Hemdanî



Serreşa Tahtle




Tebesə Çavsor



Tehla

KEYNEKA QEDERSÎYA

Arêkerdoxe:
Ferida AKTURAN
Ca: Sêwregi / Riha
Serre: 2015



Yusuf Alkan

Wextan ra wextên de cinî, mêrde û keynekênda cînan est-bîya. Keyneka cînan roj bi roj çend gird bibîyên û hendi zî xasek bibîya. Kes qîymîş nêbiyên ke biewniyayên ci ra. Merdimê ke çimê ci aye ro gunayên, tesil ageyayên xo pey û fina ewinyayên aye ra. Xasekiya aye uca ra kewtbiya ziwanan ser.

Keyneke resaya û wextê aye ê veyvbiyayene amebiyo. Rojên serê şewdirî, malbat piya kêberî ver o ronîste biyê. Mirîçikên amebîya gîla dare ser o anîşena, kena cîke cîke û vana:

- Keyneka qedersîya, keyneka qedersîya.

May û piyê keynekere bol pey kahirênê. Xo bi xo vanê :

- No çiçî yo ame ma sere de? No do se bo, ma do se kerê?

Roja bîn fina a mirîçik yana gilê dare ser anîşena û ê qîsanê xo kena, vana:

- Keyneka qedersîya, keyneka kedersîya.

A roja tepeya her şewdir mirîçike yena, dare sero anîşena û vana:

- Keyneka qedersîya, keyneka qedersîya.

Keyneke zî bol pey qahrêna. Roj bi roj helêna. Mabên ra hefteyên, des rojî ravêreno, nê vanê:

- No wina nêbeno. Ma do witya ra bar kerê şîrê. Ma nêşenê witya de bimanê, her roj na vatene goştarey bikerê. Mayê û darû dinya ju keyna ma ya. Aye rê çî yê bibo, no dinya do ma rê zîndan bo.

Nê werzenê çî yo ke cînan rê biqîmeto gînê û kewnê ray. Bol şînê taysî şînê, winênê biyo şan, ê zî edizyenê vanê:

- Ma xo rê hebê boya xo bigîrê, şewe de zî rakewê, şewra fina ma do ray kewê. O derax de keyneke vana:

- Baba biewnî, uca de keyeyêno aseno, ma şîrê uca, belkî ma emşo bihewênê.

May û piyê ci winênê, raşt a. Uca de keyeyêno aseno. Vera uca kewnê ray şînê. Resenê keyî ver û ewniyenê ne paca, ne zî kêberê nê keyî est o. Nê vanê:

- Şewa tarî ya, belkî zî ma nêdî, hele ma fina çorşmeyê banî ra bigeyrê.

Nê fina doş benê, keyneke înan vernî de ra, genca daha lez ray şîna. Keneke bi heyecana qîrena vana:

- Maya mi piyê mi bêrê. Witya de kêberên do werdêko asi-nên est o.

Keneke nêpawena may û piyê ci bêro kêberî akena û xo erzena zereyê keyî. Keyneke senî kewna zere kêber ci dima raceneyêno. May û piyê keynekerê yenê, se kenê kêber nêabeno. Kêbero asin beno dîwar û qetîna nêabeno. Keyneke zere de may û piyê ci tebera bermenê, kurenê, nêşenê çiyên bikerê. Bi rojana no hal de domneno. Bermenê bermenê benê wişkî. Maya keynekere vana:

- Oxul hele biewnî keyî zere de çî est o, çî çin yo.

Keynek winêna, vana:

- Maya mi welay bê mezelên çiyê çin yo. Zereyê keyî de mezelên est o.

Çend rojî tepeya keyneke, may û piyê xo rê vana:

- Maya mi piyê mi werzê şîrê ageyrê keye. No qederê min o. Mi no rind fam kerd ke kes nêşeno qederdê xo ver bîremo. Elay senî kerdo o do winî bo.

May û piyê keynekere nêwazenê, la winênê ke keyneka cînan a ya rast vana, çî yo ke ê bişê bikerê çin yo. Werzenê û vera keyî kewnê ray. Na keyneke zî werzena xo ser vana hele ez bewniya xo çorşme, çî est o, çî çin yo. Şîna sereyê mezeli ver, ewniyena ke mektûbêna şîya mezeli vero ya. Mektûbere gîna wanena. Mektube de; na mektûbe kê dest kewo, o do çewres şew û roj nê mezeli awdo û koni kero. Keyneke xo bi xo vana; "Qey no qederê min o. Na mektube de se vano ez do winî bikera".

Ewniyena zere de koniyên û îniyên û îni wero zî tasin est a. Şîna tasê awe û koni gîna yena mezeli ser mezeli awe dana û koni kena. Şew û roj tim û tim mezeli awe dana û koni kena.

Demena tepeya rojê ewniyena, xirrr kêber xo bi xo abiya. Na keyneke vana:

- Kêber akerde bo zî, heta çewres roj nêqedyo, ez nêşîna cayên. Ka o do çewres roja tepeya se bo. Roja çewresî keyneke ewniyena cinikêda siyaterê, tertîşîne amê kêberî ver. Kêbero akerde ra sereyê xo hetê zerîya derg kerd û ci ra pers kerd va:

- Waya mi ti kam a, ti ya çîrê nê mezeli koni kena, merde kamê to yo?

Keyneke gureyo ke ameyo ci sere hemî cinêkererê vana. Vana:

- Ma ez se bikera, qey no qederê min o, ez paweya çewres roj temam bo ,o do se bo. Cinêke aye rê vana:

- Way feqîra min a qedersîya, heyfê na xasekeyde to nîyo. Ka bide ez vera to tayn konî bikera ti şorî teber hebê hewa bigî.

Keyneke vicêna teber. Hebê doş bena. Qe zerrîya ci rehet nêkena. Vana:

- Ez şira zere se beno se nêbeno. Çiyê nîro cinêke sere de. Na werzena yena, kêberê akerdî ra çiyê ke vîna û aşnawena ver, mat manena û herûnda xo de cemidêna. Ewniyena mezal abiya tede ra xortên vicyo kes qîmiş nêkeno biwniyoy cira. Xort ewniyeno çorşmedê xo ra. Bê cinikta sîyater kes çin yo. Aye ra pers keno vano:

- Ti kam a?

A zî vana:

- Ez witya ra ravêrdên, mi mezêlê to û ver o zî mektubên dî. Mi mektube wendî û zek mektûbe de va, no çewres rojî yo ke ez a mezêlê to awe dana û konî kena û bi sebra pawena o do se bibo.

Xort vano:

- Êke winyo, ti qederê min a. Ez do bi to ya bizewicya.

Keyneka qedersîya wexto ke nê qisan aşnewena herûnda xo de verê kêberî de gunena erd ro. Xort wera kêberî ewniyeno vano:

- A keyneke kam a?

- Cinêka sîyater vana:

- A keyneke xo rê parse kerdên, gunayê mi ame ci mi wa mi hete bimane. Eke ti zî biwazê, wa feqîreke zî xo rê, kê ma de bimano kar marê ma bikero.

Xort vano:

- Ti senî wazena wa zey to bo.

Ti nêvajê xort zî bol zengîn o. Nê hurdna cinîyan gîno û beno qonaxê xo. Hewt rojî hewt şewî veyve kenê xort û cinêka sîyatera zewicênê. Keyneka qedersîya zî bena xizmikara cînan.

Rojên xort cinîyerda xo rê vano:

- Ez a kena şira sûke, ti çiçi wazena ez to rê biyara.

Cinêke vana:

- Mi rê qandê fistanan çend topê îpeg û çend topî zî kedîfe bîya.

Ew bêterê çi amorena, vana:

- Ney zî bîya, ey zî bîya, amorena û amorena.

Mêrdek ewniyeno keyneka xizmikar xo rê bêveng milê xo çewt kerdo vinderda û wîna înan ra. Xort şino aye hete, aye rê zî vano:

- Qey ti çiyê xo rê nêvazena.

Keyneka qedersîya vana:

- Eke ti do mi ra çiyên pers nêkerê û çiyê ke ez biwaza biyarê ez do zî tayn çi biwaza.

Xort vano:

- Temam, ez to ra çiyên pers nêkena, ti çiçi zî biwazê ez do to rê biyara.

Keyneke vana:

- Mi rê siyên da sebrî, veyvekên û xençerên bîya.

Xort vano:

- Wa bo, çi yo ke to waşt, ez do to rê biyara.

Xort şino karê xo qedînen, çiyê ke cinîyera ci waşt gîno, keno ke ageyro keye, çiyê xizmetçi yeno ci vîrî, ageyreno çiyê ke aye waşt gîno. Mêrdeko ke çi roşeno xortî rê vano:

- No çi kê to ra waşt?

O zî vano:

- Xizmikara ma waşt.

Mêrdek vano:

- Ti çi danê ci tepeya aye bipawe aye de îşkeleyên est o. Kes bîleheq nê çi nêvazeno.

Xort yeno keye. Çiyê cinîyera xo dano ci. Nanê xo weno bado çiyê xizmikarere beno û dano ci û şino, gamekna hêdîke ageyreno, kêberî vero xo nimeno.

Keyneke kewna zereyê odayê xo. Çiyê ke waşt vejena, nana xo vera. Vana:

- Ez do nika estanika heyatê xo şima rê vaja, veyvê ti do mi dînekerê, sîya sebrî ti do zî sebir bikerê.

Keyneke heyati xo hemî, se biyo, se nêbyo, çiçi ameyo ci sere de pêroyine bi veng vato û bermaya. Serê her vatena xo de zî veyveke rê vato, veyvê mi dîneke, sîya sebrî sebir biki. Vatena keyneke qedêna keyneke xençere gîna xo dest ke xo bikîşo, xort reseno ci kardî ci dest ra gîno. Vano:

- Mi vatena to heme aşnawite. To çirê mi rê heta nika nêva

wina biyo.

Xort xo pêşeno ci ro û ci rê vano:

- Ti qedera min a. Ez do a ciniyera zûrkere bikişa û bi to ya bizewicya.

Keyneka qedersîya vana:

- Ti do senî aye bikişê, gunay a, ma ez qe verdana ti aye bikişê. A wazena wa marê xizmikarey bikero, wazena zî wa şiro.

Xort vano:

- Ti senî vana wa zey to bo.

Keyneke vana:

- Eceb maya min û piyê mi se bî, çiçi ame înan sere de.

Xort vano:

- Ti qe merq meke ez do înan bivîna.

Merdimanê xo arêdano, înan rê vano:

- Şima do bost bi bost hema cade bi geyrê may û piyê waştiyerda mi bivînê.

May û piyê keynekere vînenê û anê înan hete. Ê qandê keynerda xo hendek bermayê, hendek e bermayê çimê înan biyê korî. Xort înan beno tixtor, çimanê cînan keno weş. Çewres roj û çewres şewe veyve kenê, niqarey cî-nênê, nanî deyênê û ê zewijyenê. Peynîde keyneke hetanî merg, bi keyfa heyatê xo ramena.



MEŞK Û GÛ^(*)

Amadekar: Weysî ARCAGOK
Çavkani: Yasîn YUCE
Herêm: Farqîn / Amed



[*] Sernava vê çîrokê jî aliye amadekar ve hatiye dayîn.

Karên gundan berê pirr tunebûn. Gundîyan genim diajotin, dûre betal diman. Rojekê gundiyên me weka her rojê di binê siya darê de rûniştibûn. Birrek Dimsoyî tevî qantirên xwe û meşkên xwe yên tijî dims hatin li ber wan sekinîn.

-Roja we bi xêr be.

-Hûn li ser seran li ser çavan hatin.

-Em Dimsoyî ne, dims difiroşin.

-Kîto bi çi ye?

-Bi paxnotkî ye.

-Pirr nin e?

-Na, ne pirr e.

Xalitê Kal, rûsîyê civatê bû. Li civatê nihêrî, bala xwe da ku dilê wan tune ye. Ji Dimsoyîyan re got:

-Em ê bişêwirin, dûre em ê bersivêkê bidin we.

Civat ji Dimsoyîyan bi dûr ket, Xalitê Kal dest bi axaftinê kir:

-Gundîno! Jixwe em hetanî du sê mehan betal in. Werin em vî dimsî ji wan tevî meşkan, tev bi hev re bikirin, ê hinek jî erzana bidin me. Em ê bibin bajêr, ji xwe re bifiroşin, kara xwe bikin û vegehin werin gundê xwe. Hûn çi di-

bêjîn?

Civatê di nava xwe de şêwra xwe kir. Dawiyê biryara xwe da, gotin:

-Dibe Kalo, em ê bikirin.

Gundî tevî Xalitê Kal vegehiyan binê siya darê. Xalitê Kal dest bi axaftinê kir:

-Dimsoyîno! Em ê dimsê we tevî meşkan bikirin. Lê divê hûn hinek erzana bidin me.

-Ma nabe Kalo, me got em nikarin erzana bidin.

-Heyran, hinek erzana bidin, em ê tevan ji we bistînin.

Piştî bazariyê dirêj Xalitê Kal û gundiyên dinê pereyên xwe dan Dimsoyîyan, dimsên xwe girtin. De-ma ku Dimsoyî bi qantirên xwe bi rê ketin, Kalo got:

-Dê bila dereng nebe, rabin em jî bi rê kevin.

Bi lingan bi rê ketin, meşk avêtin ser milên xwe. Gundî hetanî gihastin bajêr, tava bêman tîna xwe mîna tîrên tûj li wan barandin. Gundiyên belqitî li bajêr dimsên xwe firotin, kara xwe jî kirin, meşkên xwe wan di destên wan de berê xwe dan dikaneke. Her yekê wan ji xwe re nan û helaw kirin. Kalo got:

-Em herin ji xwe re li xaneke bimînin, em bîna xwe bidin.



Bi vê westiyabûnê em nikarin îro bi lingan herin gund. Sibehê em ê zû rabin û herin.

Gundiyan me berê xwe dan xanê, xweyiyê xanê wan tevan bi cî kir û bi cerbikan av jî da wan. Dema ku bû êvar, derî li ser wan qîlît kir û lêxist çû mala xwe. Gundiyan me jî nan û helawên xwe xwarin û cerbikên avê jî bi ser xwe de kirin, xwe dirêj kirin û bîna xwe dan. Pirr neçû ji wan yekî got:

-Lawoo! Ez mirim. Nava min diçe. Û baz da ber bi dêrî ve. Derî girtî bû. Kir nekir venebû. Yekî dinê jî rabû got:

-Nava min jî diçe, ev çi ye? Demek şûnde yên mayîn jî kirin qîrînî. Xalitê Kal rabû û got:

-Em ji ber helawê nexweş ketin. Lewma nava me diçe.

Sofî got:

-Ji bo Xwedê ez nikarim hetanî serê sibehê bisekinim, ez ê di vir de birrîm.

Xalitê Kal got:

-Nabe Sofî, em nimêj dikin. Tu li ber serê me birrî hetanî sibehê nabe.

Reşo got:

-Ma em ê çî bikin?

Civat şewirî. Piştî şewrê Xalitê Kal got:

-Dê ku wisa ye, em ê di meşka yekî de birrîn.

-Ê çawa be?

-Lawo ma ê çawa be çi ye? Bila du kes devê meşkê bigire, ê dinê jî tê de birrî, em ê devê meşkê jî girê bidin. Nava kê çû dîsa du kes devê meşkê bigire ê dinê jî tê de birrî. Hetanî sibehê çareyêke dinê tune ye.

Elo got:

-Dê baş e. Em ê di meşka kê de birrîn?

Kesî xwe neda berê. Tev xwe li kerrîtiyê danîn. Dawiyê Miho got:

-Em ê di meşka Kalo de birrîn.

Xalitê Kal bi vê yekê pirr aciz bû:

-Lawo ma ez ji we tevan mezin im. Hûn fedî nakin?

Reşo got:

-Ma te got heyran. Fikr fikra te bû.

Xalitê Kal got:

-Ku wisa be, serê sibehê ez vê meşkê nabim. Divê hûn bibin.

Civatê ev yek pejirand. Hetanî serê sibehê nava kê diçû hat li ser meşkê rûnişt, du kesan jî devê meş-kê girtin, wî jî tê de rît, dûre devê meşkê girtin. Êdî rojê hêdî hêdî xwe

nîşan da, dinya hinek ronî, meşk jî tijî gû bû. Xweyiyê xanê derî li wan vekir. Gundiyan meşkên xwe yên vala girtin, yeko yeko ji odayê bi lez û bez derketin, meşka Xalitê Kal jî li ber dîwêr ma. Kesekî xwe neda berê. Xalitê Kal jî weka ku meşka xwe ji bîr kiribe, derdiket derve ku xweyiyê xanê jê re got:

-Meşka xwe jî bigire. Te ji bîr kir.

Xalitê Kal ji ber neçariyê meşka tijî gû hilda, jî odayê derket. Gundiyan me li benda wî bûn. Kê ew dît pê keniya. Xalitê Kal got:

-Ez qebûl nakim. We ez xapandim. We meşka min tijî gû kir û gûyên we jî ez li xwe bar dikim. Ma Xwedê pê qayîl dibe?

Xalitê Kal kir nekir kesekî meşk jê negirt. Wî jî got ku meşkê bibim biavêjim aliyê Bexçeyên Hewselê, ez jê xelas bibim. Bi aliyê Hewselê ve diçû ku dikandarekî gazî wî kir:

-Ha gundî! Ew çi ye di meşka te de?

-Rûn e.

-Helandî ye?

-Belê, helandî ye.

-Ê gamêşan e?

-Belê, yê gamêşan e.

Gundiyan fahm kir ku dawiya vê bazariyê nebixêr e, jê re gotin:

-Kalo tu çi dikî? Ma qey tu vê meşkê nafiroşî?

Xalitê Kal bi dengekî nizm bi ser de çû:

-De here bênamûs! Ez ê nefiroşim çi bikim, gûyê we hetanî gund bibim? Piştî ku we ev meşk di stûyê min de hist, karê we pê tune ye.

Dikandêr got:

-Tu bi çiqasî didî?

-Tevan bi çil paxnotî didim.

-Meşk jî li ser de ha!

-Na, ez meşka xwe nadim.

Dikandêr got:

-Bide bide, tevî meşkê bide, ez ê bikirim.

Dikandar pereyên Xalitê Kal dan. Kalo pereyên xwe xistin bêrika xwe, meşka xwe danî erdê. Weka ku çiyayekî ji stûyê wî rabe, sivik bû. Wan berê xwe dan gundê xwe.

Dikandêr gazî hemalê xwe kir. Hemal hat, meşk hilda, ket pey dikandêr, çûn mala wî. Hatin ji hewşê ketin hundir, dikandar çû daşirê. Hemal jî berê xwe da kîlerê. Jina di-

kandêr hat û got:

-Paşa, ew çî ye, te anîye?

Dikandêr ji daşirê got:

-Rûn e.

Jîna wî got:

-Em li ku vala bikin? Kûpekî vala heye û kupekî nîvrûn heye.

Dikandêr got:

-Xanim, li ser kûpê nîvrûnê vala bikin.

Dikandêr him gû dikir him jî diaxivî. Hemal devê meşkê vekir, xwe hinek xwar kir, meşk li ser milê wî de gûyên gundiyan li ser kûpa nîvrûn de vala kir. Bîneke gellek tûj ket ser kîlerê. Jinik qîriya:

-Paşa, gû ye gûûû!

Dikandêr bawer nekir. Hema ji daşirê, doxîna şelwarê wî jî di destê wî de bazda hat kîlerê. Hê bîna gûyê wî ji ber pozê wî neçûbû, jî jîna xwe re got:

-Xanim bîn ji qûna min tê.

Xanimê jê re got:

-Ma tu li ku, daşir li ku, qûna te li ku, bîna wê li ku?

Dikandêr serê tiliya xwe ya biçûk xist nava kûpî û xist devê xwe ku tahm bike, fahm kir ku gû ye, dilê wî li nava hev ket û destê xwe bi lez û bez ji devê xwe kişand. Ewqas ku bi lez û bez kişand, destê wî li dîwêr ket, şikiya.

Hemal jî piştî şikandina destê dikandar derket çû sûkê.

Vê rojê bajarî tev pê hesiyabûn ku gundiyeke ew xapandiye. Xapandin jî çî xapandine baboo! Gû firotiye daye wî.

Roja dinê dikandarê reben bi destê xwe yê nixûmandî hat dikana xwe vekir, cîranên wî lê civiyan, henekên xwe pê kirin. Dikandar gellek aciz bû. Got:

-Ez ez im, ez viya ji gundiyeke re nahêlim. Ez ê tola xwe jê hildim.

Du roj şûn de Xalitê Kal û gundiyan dîsa hatin bajêr, ketin nava sûkê, dikandêr ew dît. Ji cîranên xwe re got:

-Gundiye ku gû firot da min ha ew e ha!

-Berê hêrs bû, dawiyê hat bîra wî ku bi hêrsê tol nayê hîlandin. Gazî Xalitê Kal û gundiyan kir, wî ew ezimandin, ji wan re çay xwest. Hevdu pirsîn, dikandêr ji Xalitê Kal pirsî:

-Kurdo, te ez çawa xapandim?

Xalitê Kal got:

-Bi Xwedê ew bi zanebûnê nebû. Çîroka xwe ya meşk û gû, ji serî hetanî binî jê re vegot.

Dikandêr got:

-De baş e. Tişteke çû em nedin dû. Lê ez bî tişteke hesiyame, nizamim rast e yan derew e.

Xalitê Kal got:

-Ka bibêje, em ê binihêrin.

Dikandêr jê re got:

-Em pê hesiyane, gundî bênamûs in.

-Çawa bênamûs in?

-Hûn li gund li pey jinên hev digerin?

-E rast e.

Xalitê Kal têgihîşt ku dikandar li pey çî ye. Dikandêr jî fahm kir ku dema hildana tola wî hatiye, bi kêfxweşî jê pirsî:

-Çawa?


Xalitê Kal li wî û cîranên wî nihêrî û bersiv da:

-Weka ku ez li pey jîna te bigerim û tu jî li pey jîna yekî din.

Gotinên Xalitê Kal dikandar û cîranên wî têk birin. Dikandêr got:

-Lawo dev jê berdin. Em nikarin bi gundiyan re serî derkevin. Gundî afat in.

Xalitê Kal û gundiyan çaya xwe vexwarin. Bi serbilindî dîsa berê xwe dan gund û meşiyar.



Arêkerdax:

Ridvan TAY

Çime: Hezo TAN

Serrê aye: 67

Herê: Gutzanî /

Pîran / Amed

Serre: 2015

Nemrûk

Ca beno ca çine beno. Yew dewi de yew Nemrûk beno. Nemrûk aya dewe di merdimo en tersiker o. Waxtîke rayê ra şonu, seyxa xora terseno. Heme millet tehdâ ey kenê. Keyeyê xo de zî çew ey nêgoştareno.

Yew şewa tarî ya, gişt gîllîra bi kî tera nêsona, varon vareno û serdo... Nemruk teber ra hewnîno, ageyreno cenîya xo ra vono:

- Cenêk ina şew şewa dizdun a, yew di ray vano.

Şonu zifqîra bere, cenîya Nemruke ey gîna nûsk dona û berî padona. Nemruk ageyreno, donu bero vendono:

- Ceynêk ceynêk... ceynêk ber nêakena.

Nemruk dûşmîşêno seko seko dono piro şonu axorî ra yew haq û yew resine gîno. Rayîr ra yew kesa zî gîno û şono .

Şonu şonu yew ko veyneno raştî yew şikefte yeno û qolla şikeft ra dîy yeno. Nemrûk vano kore ki est o sek ina şikefte de însan este. Şono fekî şikeftî, dono ber rê ro .dî kî,ber abi zere ra yew dêw veca. Dêw xişn o, perro sek nêşno bixelesno dêw vera. Nemrûk vono:

- De se bî wa hînî bibo min

Û çayî xo de vindeno. Dêw vano:

-Tu xeyr o, ma însanan hewa ra geyrenê ki ma înan bi-werî, homa tu erdi de da ma. Ti çîyî çû kara yê?

Nemrûk hewnîno çewres heb dêw zerey mixara de yî. Nemrûk dişmîşîno se biko û vano:

- Willay, ez zî embazî şîma ya, şîma ra yew bira ya.

Dêw vano:

- Şirtî ma estê heme kes nîşno biray ma bibo.

Nemrûk vano:

-Beno.

Dêw, Nemrûk gîno zerre û beno pîlî xo het.

Pîlî dêwan vano:

-Ti şîn şirtanî ma berrî ca ma to biray xo kenê. La ti nêşnî se ma to wenê. Şirtî mayo ewil kerra şiknayîşo.

Dêw heme çewres kerra gînê dekenî destanî xo û wîrdi wel kenê. Newba Nemrûk yena , Nemrûk ardi ra kera gîno qestî û toneka xo ra haq veceno. Haq gîno pel xuşneno. Awka sir û sipî veceno. Dêw yewnûna hewnînê vanê no çî bela wo ma dekwetî. Nemrûk şirtî ewil erdi ca. Pîlî dêwan vano:

- Şirtî ma dîyîn, ma mîyî binî çengûlanî xo kaş kenî.

Dêw mîyyanî xo kaşkenî, mîyî inan gele ki xişnê, dora Nemrûk yena, Nemrûk vanda yew dêw dono, binê çengilî xo ra serey resine veceno, dono dêw dest, vono kaş ki, dew kaş keno nê keno resine nêqedîno.

Pîlî dêwan vano:

- Îno şirtî zi to girot, şirtî ma yî binê, ma ijpjonê xo ma nawnenê. Ey kamî ki xişnîbî se, ey qezenç keno.

Destî xo fînenno govdeyî xo ra ijpjia xo kaş keno, sey yew meys a. Dora Nemrûkî yena. Nemrûk desti xo fînenno govdeyî xo, kesa binî çakîtî xo ra veceno. Erd de roneno, kesa rayir kuwena...

Pîlî dêwan vano:

- Birak, tu heme şirtî ma erdê ca, ti zî birayanî ma ra yew birayî. Gelek wext yewbînon miqayit kenê. Pî newbey şonî êynî ra awk onê. Dora awke yena Nemrûkî, kind donî Nemrûk û Nemrûk raykenî eynê ser. Nemrûk kinde ra hewnî no, sey qama ey a. Kind awk deko sek, nêşno erd ra hawanû. Hama yew çilka awke dekeno binî kindî û kind gîno va keno. Şono fekkî qûle, kufeno û vana ez merda, kinde gîno kaşkeno serey xo çilka awka ki tedeya firkeno, kind gîno virvîrreno(çeng keno) raşte. Dêwê Nemrûke ra hewnêni, çimê înan zîq benê. Îno merdim yew kinda awk yew firtî di firkenosek, ino yew çiftî de ma zî weno. Îno çî bela yo ma dekwetî. Nemrûki ra vanê:

- Birak, ti rayna meşo awk, awka ke ti onê tu rê qîm nêkeno. Ma heme teyšûn monenê.

Nemrûk rayna ray nêkenê awk. Dora êzîman yena. Nemrûke ra vanî:

- Birak şo êzîman berre.

Nemrûk vano:

- Ez nêşna şîra yew cema êzîm berra. Şîrê mi rê resinayî hewt dewan berrê. Ez dormareyî ko berra bera û fîna xo şelle berra.

Dêwî hewnîni Nemrûk inan ra zalîme ro, vanê:

- Birak êzîma tu ma rê lazîm nêya. Ti ewta roş. Ma êzîma xo onê. Nemrûk gîni benî kûşeyî en veynîdi roşinenê. Ben-

tarê xo di qalî kenî(tereqnenê), vanî:

- Ma ino merdim ra senî bixelesî, ma çirayî ino seriser nêşnî şîrê.

Dêwana yew vecîno û vano:

- Wextî ke rakewt ma awka kelkewta ma pirokê û ko de bimiro. Vengî dêwan şono Nemrûkî. Şew bena Nemrûk şono ke kûşteko(rakewo). Senî dêwî rakewnê Nemrûk cila xo ra wardeno. Yew bargîr gir dono. Dekeno herinda xo û leheyf piradono. Şono xo yew huqe de nimineno. Nîmey şew beno. Dî hebbî dêw neqla awka kelkewta onî. Cûr de cila Nemrûkî re kenî û vazdenî şonê. Nimaje beno. Yenî Nemrûk ha cila xo de. Pîlî dêwan vano:

-Birak şewa tu senîn bî.

Nemrûk:

- Şew yew wext, sek yew helmû germin ame min.

Dêwî hewnîni çare Nemrûke de nêveynenî. Nêşkenî ki tere pûnk bibî. Nemrûki ra vanî:

- Birak bî ma yew heqibeyî zerdan bidê tu û şo keyeyî xo.

Nemrûk qebl keno la vano:

- Yew şirtî min zî est o. Ez nîşna rayir ra şîra keye. Şima min milî xo serde berrê sek ez şona...Yew dêw ey gîno xo şe le û beno keyeyî ey. Dano berro ceynêka Nemrûkî vana:

-Ay kam o?

Nemrûk vano:

- Ez a ez, ber aki.

Ceynêk ber akena. Dêw û Nemrûk şonê zere. Dêw gelekî ca Nemrûk û zerdî wegrotu û betelewo wextî ke Nemrûkî erde di roneno. Dêw of kaş keno, Nemrûk vayî dêwî ra hawa ra çeng beno. Nemrûk vanda ceynêya xo dano:

- Ceynêk hele ay karmeyî bawkalî min beri. Ez serrey ino dêwî derreka.

Dêw hama xo berra keno û perreno şono. Heyanî qula xo bi ra çîfî zî nêgîno û vazdeno. Wextî ki qûla xo reseno dêwî ra persenî vanî:

- Tu se kerd? Tî senî xelesiyayî ay bela ra? Dêw vano:

-Le le mepersî, çî bela bî. Mayan ne aywa merdimo jîyat ardo ridê erdon nê zî vacî. Mi ey milî xora senî rona. Birra erdî ra nêdisa. Hawa ra geyraynî û vanda ceynêya xo da, va:

- Hele karmeyî bawkalî min berrî. Ez serey ino bida piro.

Hama mi xo ber ake û ez vazdaya. Min xo zor xelesna. Heq esto ke ma yew qirbûn bidê....



Ferhengê Citêran

Arêkerdox: Deniz MAYA
Çime: Mahmud MAYA
Ca: Hêni / Amed
Serre: 2015



Alet: A ke pê cite bena.

Berd: Hîris patîla vaşî

Beyare/Bure: Hêgayo ke ti ra debrê xo hawanenî, cit nêkenî bêcîr veredanî (hêgayo nê ramite)

Çap: Nê m welçek (2 qînat) toxim.

Cit: Erdî ramilîş.

Cîwîn: Cayo ke seba qutîş xe, cew, mercî ûsb., pêser benî.

Cîwîn Qelebnayîş: Cîwînî serebin kerdîş o.

Dormareyê cîwînî kê erzenî orte ke cîwîn pêro bikuwiyo.

Çuwal: Layê pemeyî ra virazîyeno.

Kê xe û cew dekenî bide; zexme yo.

Darey: Çîyo ke pê dare yena birnayîş.

Boça aye asinî a, pê dare taraşe kenî.

Destik: Qirime de cayê tepîştîşî yo.

Dîgoş: Kê pê teli hawanenî ronênî sê çîtal a.

Elb: Sitila darîn.

Filhon: Hêgayo ke cite bîyo labelê toxim nêerzîyayo bide.

Firêze: Xele û cew çînayîşî ra dim herinde ke manena vanî firêze.

Gîzle: Virarik sap yan zî vaş gîrêdaye.

Hamûd: Deben mil bergîr; nîreyê bergîran o.

Hefilkerdîş/Hefilnayîş: Pê qazmeyo şenikî dormareyê lemê bostanî kenayîş ra vanî.

Hîwe: Kê pê herre hawanenî û erzenî û pê xetan akenî.

Hîweyo Darîn: Çîyo ke pê xe yeno vaydayîş.

Hole: Cîwîn ser ra gayan çarnayîş.

Keleme: Nîre milî de eyar keno.

Kerêy seqa: Çîyê asininan kê pê tuj kenî.

Kêş: Kêşê simerî, kêşê vaşî. Vaş û simer yew cayî de pêser beno.

Lebode: Pistê misazî ra vanî lebode, kê pê sîrs ponk kenî.

Lem: Lemê firingî, lemê îsot, lemê xiyar ûsb.

Leyek: Dare ke newe ameya ronayîş.

Lêsim: Parçeyê alet o, sîrs debena bide herr akeno xet virazeno.

Licna: Ca pê xelî kifîş kenî/aw-toxim.

Mer: Çîyo ke pê rez û verê daran yeno kerdîş.

Milêf: Alela dormareyê cîwînî aredayîş û vaydayîşî ya.

Milêfa Asinin: Çîyo ke pê şîmbelî yenî arêdayîş û pê sap erzenî patose.

Milik: Ser kifîte gayan de yo, nîreyî ra beste yo.

Misaz: Çuwaya derg a. Yew sereya pist (lebode) yew sereya zixt a. Kê pey gayan romenî.

Mişare: Benateyê lijnayan o, xelê lijnayan.



Mişone: Aleta ciwîn kutîşî ya. Sereyê aye texteyin a binê aye de kerreyî tujî pira yî.

Nîre: Debeno milê gayan, sirsî ra bestiyêno.

Patîl vaş: Vaş çînenî sê gêsanê porî munenî, nê ra vanî patîla vaşî yan zî vaşo munte.

Pemiste: Toximê pemeyî ke kê erzenî miyanê herr. Dendika miyanê pemeyî.

Pircin: Çîyo ke pê xelet û cew yeno vijnayîş. Qulê aye werte yî.

Pûz: Peme ramitîşî de awa verînî ra vanî pûz. Semedo ke toxim miyan de vind nêbo û semedo ke peme yew bêro.

Qazme: Çîyo ke pê erd yeno aşonayîş. Kê pê hêgayî kenênî.

Qedîfe: Daro ke pê layê qenab besten semedo ke nîre milê gayî ra nêfeletîyo.

Qedum: Aleta ke teşne dana daran, dare birmena û pê eşêfî zî bena.

Qeşawî: Pê gayo û beygîro kê tîmar kenî.

Qevd: Kê pê yew destê xo tepîşenî.(qevda vaşî)

Qelem: Gilê dahlew seba ramitîş.

Qiliç: Kê dest xo nanî ser sirsê şîna warey.

Qirim: Aleta çînayîşî ya, kê payî ra çînenî. Boça aye derg a. Kelendir.

Qînat: Çar ra yew welçeka toximî, çaryek.

Qîyale: Mabenê ser sibaya taştare de boya xo gîrewtîş. (paydos kenî şînî qîyale)

Qur: A ke sirsê qurînî ra şîna, ga pê dejiyeno.

Req: A ke sirsê qurînî (xorîn) ra nêşîna, ga pê nêdejiyeno.

Rewa: Herr awe ra mird biyayîş(payîzî de beno) rewa şiyîş/rewa nêşiyîş.

Ristîm: Kok, reye.

Rişt: Nîre û sermûsle pê ra besten.

Sap: Puşe; beşnê xelet, cew, mercî, niha ûsb..

Sede: Goreyê qewetê heywon xo rê ca kifî kenî. Heywon eşken cî bikero

Simer: Puşê xeleyî yan zî cewî yo. Hebê ey abiryayo.

Serad: Pê xububatan serednenî. Qulê aye xişnî.

Seraw: Zexel bêro seraw kenî.

Sermûsle: Alet derg keno, benateyê ga û alet de yo.

Sirs: Sereyê aye asinin û tujî a, erdî xet kena.

Şalag: Baro ke kê yew rayî de wegênî.

Şeft: Xete ke xelet ameyo vaydayîş.



Şiq: Hêgayo şenik ra vanî şiq.e

Şimbêl: Quçik(verar) xele, cew û mercî ûsb...

Tar: Pê vaştîrî xele û cew çîhayîşî de debeno destê çepî, xeleyo ke çînyêno pê tepîşiyêno

Tarom: Cîwîno ke kute yo labelê hema xele û simer yewbînanî ra nê abirîyayî (taromê cîwîn)

Telbî: Cayo ramite, cîtkerde (telbî gilgilî)

Telis: Sê xirarî ya, peme debeno bide.

Terke: Hêgayo ramite ra vanî terke

Tewre: Çuwalî ra şenik o û tenik o; zexm nêyo.

Tirmix: Çîyo ke pê xele û puşe yeno arêdayîş.

Torzî: Çîyo ke pê dare yena birmayîş û şikîtiş. (Êzim şikîtiş)

Towk: Bazin, aet û sermûsle pê ra bestenî.

Toxim: Hebê xeleyan, nihayan.

Mercîyan ûsb ke ramîyêno (Yeno ramitiş)

Vaştîrî: Aleta çîhayîşî ya, kê ronîşkî ra çînenî.

Boça aye kilm a.

Vay: Rayîrê awe ra vanî vay. Awe piro şîna hêgayan.

Vaydayîş: Taromê cîwîn pê hêzê vayî xele û simer pê ra abirmayîş.

Velg: Darê azgil û darê baluye ra gilan şeniko birnenî girêdanî wuşk kenî zimistanan de danî terş û dawarî rê.

Vervay simer: Cîwîn vaydayîşî de simero wurdîyêk binêk cîwînî ra dîr şîno. (Simero ke zaf wurdî yo.)

Welçek: Erdî de cayê çar qînat toximî.

Xardos: Kê pê aletan tuj kenî.

Xendek: Vaya hem verîn a hem zî qurîn a.

Xet: Şîlîlê bostanî kê tede ramenî.

Xirar: Muye ra virazîyeno, hinda dî çuwalanê simerî debeno bide.

Xubar: Bê zir ramitiş o. (Paweyê Homayî veredanî)

Zibil/Zibila: Gîyê dewaran wuşk kenî, dekenî bostanan û daran ver.

Zimbêl: Qirşî ke sereyê cew û xele de yî.

Zir: Wedêy toxim ramitiş.

(Kê eşkenî toximî bierzî hêgayî)


Seba toxim eştişî rê zir beno.

Zixt: Sereyê aye de mêx pirodaye ya. Çuwaya derge ya.

Zildayîş: Toxim zergunêno. Zergun biyîş.

XAÇEPIRSA MAMIKÊN AJALAN

Ronya Bewran



Ji Çepê Ber Bi Rastê


2. Dest û pê çermanî
xwe hiltanî çaçanî
Ev çi ye?
5. Mamikê mino gewr e gewerol e dike hêkên
girover e dixuşîne ne mar e; Ev çi ye?
7. Reş e, reş e wek qîr, spî ye wek şîr, çê dike kût-
likê jina mîr; Ev çi ye?
8. Şîva terr e, li guher e; Ev çi ye?
10. Hemhemo, belbelo, simbêlbelo, simîsimî,
dîwar simî; Ev çi ye?
12. Tim dibêje bûk, lê ne zava ye; Ev çi ye?
13. Mamikê mino, dixwe û narîte; Ev çi ye?
15. Eba berleko, li nava beyaran; Ev çi ye?
16. Spî ye ne keş e, guhbel e, ne mişk e, biharan
terr e, payîzan hişk e; Ev çi ye?
19. Ji dûr min dît kevirek, çûm nêzik min dît çar
ling û seriyek; Ev çi ye?
20. Ez çûme ser milekê, min berê xwe da
helanekê, hemî bûkên salekê; Ev çi ye?

Ji Jor Ber Bi Jêr

1. Mamikê mino, ji berfê spîtir e, ji xwînê sortir e, ji
qîrê reştir e; Ev çi ye?
3. Karika kejik, li ser hejik; Ev çi ye?
4. Mamikê mino ser mişar e pê xepar e; Ev çi ye?
5. Mamikê mino di qulekê de keriyekî pez e; Ev çi ye?
6. Hilû ye, bê mû ye, mamikê mino; Ev çi ye?
7. Sergilgil e, bingilgil e,
çavzîq û simbêlbel e; Ev çi ye?
8. Xatûna çilkezî, li pişt malê dibezî; Ev çi ye?
9. Çeqmeq e,
laq û peq e,
her kî dest bidiyê ehmeq e; Ev çi ye?
11. Guhbelo bi rê ket, girovero bi ser ket,
xeftanzero bipey ket; Ev çi ye?
14. Ne aşiq e ne gewende ye,
dijiminê qewmê xwe ye; Ev çi ye?
17. Tiştêkî min heye, tim di nava avê de ye, lê qet şil
nabe; Ev çi ye?
18. Kalokî tê ji deştê, barê striyan li piştê; Ev çi ye?

BERSIVDANK

Ronya Bewran



folklor
kurdan

